*Tûnis, Misir, Lîbya... Li ser erdheja welatên ereb analîz û gotarên balkêş; rûpel ji 14 heta 20ê*

LE MONDE diplomatique kurdî

Adar 2011 - Hejmar 16 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Jean-François Boyer**
Meksîka çima li alîyekî doza serxwebûnê dike û li aliyê din serê xwe li hember Amerîkayê ditewîne? Meyla bêalîtîyê ya Meksîkayê çawa ber bi hevkarîyeke stratejîk ya bi Amerîkayê ve diçe?
▶ R. 5

**François Danglin**
Hindistan, Brezîlya û Afrîkaya Başûr çima forûma IBSAyê ava kirin? IBSA, ji Neteweyên Yekgirtî, Fona Darayî ya Navneteweyî û bi taybetî jî ji Rêxistina Cîhanî ya Ticaretê çi dixwaze?
▶ R. 6

**William Pfaff**
Gelo ji bo Dewletên Yekgirtî xetayeke kambax bû ku wê ji zêdeyî bi hezaran baregeh û binkeyên leşkerî û qereqolan, pergaleke cîhanî ava kir ku seranser e û jê veger tuneye?
▶ R. 8

**Jean-Arnault Dérens**
Dwanzdeh sal piştî şer, lêkolîn û şahidîyên nû pêkutîyên ku endamên UCKyê li dar xistine derdixînin meydanê. Hem sirbên sivîl hem jî reqîbên siyasî yên UCKê qurbanên van pêkutîyan e…
▶ R. 10

**Howard S. Becker**
Civaknas Pinar Selek, cirma xebatên xwe yên rexneyî yên li ser xizmeta leşkerî û pirsgirêka kurd wê pir biha bidaya… Li Tirkiyeyê, ji bo lêkolîna zanyarîyên civakî çiqas azadî heye gelo?
▶ R. 22

# Sibê jî dora Îranê ye?

SERGE HALIMI

Guleyên kujer, dibe yên şiîyan bin, dibe yên sunîyan; dibe yên nêrînnerman bin, dibe yên nêrînhişkan, dibe yên hevalbendên rojava bin, dibe yên "dij-emperyalîstan". Kesên dimirin jî her wisa. Lê belê rejîmên ku guleyan direşînin hemû dişibin hev. Rejîma Trablûsê karî utopyaya xwe ya ji bo şoreşa cîhanê, bi kontrola sînorên Yekîtîya Ewropayê biguherîne (1).

Herwiha hikûmetên ku bi hin taybetmendîyên xwe cuda xuya bikin jî, xwedî heman fenûfûtan in. Tehranê jî bi vî awayî îdîa kir ku ew di serhildana demokratîk a ereban de îşaretên "hişyarbûneke îslamî" ya ku jêdera havêna wê şoreşa îranî ya 1979ê ye, dibîne. Îsraîlê jî bal kişand ser heman fantazmê, da ku vê rewşê bike sedema lêxistina zengila alarmekê. Li gel vê yekê jî, gava dijberên îranî xwestin xwepêşandanên li Qahîreyê silav bikin, teokrasîya desthilatdar a Tehranê gule li wan dan reşandin. Her çi artêşa Îsraîlê ye, ew girseyên sîvîl ên destvala qir nake –ji bilî dema ku girseyên sîvîl filistînî bin. Lê belê Benjamin Nétanyahou daxwaza azadîyê ya ciwanên ereb, ji Tehranê bêhtir naecibîne. Lewre ev serhildan dikare welatê wî ji hevalbendên muhteşem, otokratîk, lê amerîkîxwaz bêpar bihêle. Wekî din, tiştekî wisa dikare li pêşîya Îsraîlê bibe asteng ku xwe wekî "yekane demokrasîya herêmê" îlan bike, da ku çêtir li defa hawarê bixe.. Bi tenê Îran li ber destê wê dimîne ji bo ku karibe wê bike bahaneya tehdîdê û weke batirsokeke şer nîşan bide.

Lê belê tengezarîyên bi Îsraîlê re û ambargoyên navneteweyî dikin ku rejîma Tehranê, ya ku ciwanên îranî bi daxwazên demokratîk û civakî wê dihejînin, bi zimanekî tûj ê neteweperest reaksîyonê nîşan bide. Ev yek wê jê re ji tevgera kesk a 2009ê ya ku bi zextan pêşî lê nehat girtin, bifeydetir be. Rêberê asta herî bilind Alî Xamaney hêvî dikir ku "vaksîn" a dardekirinan û êşkenceyan û "tovên" nerazîbûnan hilweşîne. Hêvîya wî neçû serî; serhildanên ereban û kontrasta rûmetşikên a navbera civakeke perwerdekirî û pergaleke siyasî ya arkaîk, binê rewatîya rejîmeke ku ji xwe têra xwe derb lê ketine, zêdetir diqewêre. Hingê jî, li şûna ku bi "awayê lîbyayî", bi balafiran bombeyan li ser girseyên çalakger ên dijberî rejîmê bibarîne, ev eşîra olî ya li ser desthilatdarîyê xezeba kujer a seyîdên derdora xwe bi ser dijberên rejîmê de dibarîne.. Rojekê piştî liv û tevgera xurt a dijberîyê, ji 290 parlementeran 222yan xwest li hember du rêveberên muteber ên berê yên rejîmê Mehdî Karroubî û Mîr Mussein Moussavî doz were vekirin, yên ji dema ku li dijî rêberê herî bilind rabûn û vir ve di hepsa malê de tên ragirtin. Û 18ê sibatê, Tehran bû qada xwepêşandaneke şanoyî ya ku têde "li dijî sûcên hovane û dilxelîner yên şefên serhildêran û hevalbendên wan ên durû û monarşîst (2), xwepêşandêran kîn, hêrs û daxwaza xwe ya vereşînê anîn ziman". "Sîxurên sîyonîst", "berdevk û serkêşên serhildanê", hemû bi kuştinê tên tehdît kirin.

Herçende bi gotin nebêje jî, rejîma teokratîk ji destekê ne bêpar e: Qet paxavê bi hişyarîyên rojavahîyan nake û ne xema wê ye. Li gel vê yekê jî hebûna wê pir qels bûye, lewre weke ku serokkomarê tirk Abdullah Gul jî 14ê sibatê di dema gera xwe ya Tehranê de dest nîşan kir: "Gava serokên dewletê guh nedin daxwazên neteweya xwe, hingê gel bixwe bi wê peywirê radibe".

1 Bixwînin: Alain Morice û Claire Rodier, "Yekîtîya Ewrûpayê çawa dorê li cîranên xwe digire", Le Monde diplomatique, hezîran 2010

2 Banga li Tehranê ya Konseya ji bo Koordînasyona Propagandaya Îslamî. (Ji ber AFPyê hat girtin) 16 sibat 2011

Wergera ji fransî: Baran Nebar

**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
**Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

# Wikileaks, DYA û Kurd

PROF. DR. FERHAD ÎBRAHÎM *



GÖKHAN ASLAN: **Lêlata şeklî**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

Eger em çavekî li dokumentên **Wikileaks**ê, yên der barê siyaseta Amerîkayê ya hemdemî, ya sebaret kurdan, bigerînin, em dê bibînin ku pirsa kurd di siyaseta amerîkî ya Rojhilata Navîn de cihekî mezin nagire. Lê hin işaretên der barê helwestên partî û hêzên kurd li Iraq, Tirkiye û Îranê wê sûdwer bin ku mirov siyaseta amerîkî ya îro û di pêşeroja nêzîk de ya li herêmê jî şirove bike.

Di gel wan raporên hindik ên diplomatên amerîkî ku di **Wikileaks**ê de hatibûn weşandin, divê mirov hinek detayên helwesta Amerîkayê jî dest nîşan bike: Ew detayên ku di serdema Enfalan, krîza Kuweytê û şerê rizgarkirina Kuweytê yê destpêka sala 1991ê de aşkere bûbûn.

"Têkiliyên" kurd-amerîkî, yan jî bi gotineke rasttir siyaseta amerîkî ya der barê tevgera netewî ya kurdî, piştî şerê cîhanê yê duyem di qonaxên cur be cur re derbas bû. Qonaxa salên 1990ê berovajî qonaxên din, heta radeyekê pozitîv bû.

Ew bixwe, biryara Encumena Ewlekarîya Navnetewî 688/1991 wê derneketibaya û pêk jî nehatibaya eger ne helwesta erênî ya rêveberîya serokê Amerîkayê **Bush** bûya. Wezîrê Karên Derve yê wê demê **James Baker** di bîranînên xwe de diyar dike ku, hikûmeta DYAyê nikarîbû li hember wê karesata mezin a ku bi milyonan kurdên Iraqê koçber bûn helwêsteke din hebûya. Ji bilî derketina biryareke weha tu imkanên din û tu senaryoyeke din li pêşîya DYAyê nebû, ne xasma ku televîzyonan ew dîmenên diltezîn ên wê karesata ku amerîkîyan bixwe beşdarî kiribû û bûbûn sebebê wê, yan jî piştî ku ji îraqîyan xwest li hember dikatatorîya **Sedam Huseyn** rabin, rê dan ku ew biqewime û paşê jî dest ji ber wan kişand û serleşkerê amerîkî Norman Schwartzkopf jî di şerê rizgarkirina Kuweytê de destûr dabû hêzên Iraqê yên esmanî ku di temirandina agirê serhildana Kurdistanê û ya şîîyên li başûr helikopteran de bi kar bîne.

Ev helwesta amerîkî ji bo kurdên Iraqê bû berdewamîya siyaseta amerîkî ya der barê kurdan. Serokên kurdan di wê navberê de bikaranîna xwe û tevgera kurd yan jî em bibêjin alîkarîya veşartî ji hêla DYAyê ve di navbera salên 1972ê û 1974ê de anîne bîra xwe. Wan wê gavê anî bîra xwe bê çawa **Henry Kissinger** piştî peymana **Sedam Huseyn** û şahê Îranê (Peymana Cezayirê 1975) ku li ser hesabê kurdan û hêvîyên kurdan bû, alîkarî û hevkarî ji ser kurdan qut kir. Bêguman serokên kurdan tûşî *"political trauma"* (travmayeke siyasî) bûbûn û pê hesiyabûn ku ew ji hêla rêveberîya amerîkî ve hatine xapandin. Heta demeke dirêj serokên kurdên Iraqê xwe li himber siyaseta amerîkî ya li Rojhilata Navîn vedigirtin û jê bi hesab bûn. DYAyê di salên 1970 û 1980yê de alîkarîya hikûmet û rejîmên Tirkiye û Iraqê dikir, yên ku zordarî li kurdan dikirin. Ewê piştgirîya siyasî û leşkerî a her du dewletên navbihurî dikir. Sala 1980 DYAyê destek da derbeya leşkerî a li Tirkiyê û çi li hundir û çi li derveyî sînorên Tirkiyeyê, bû alîkara hemleyên li dijî kurdan. Û her wekî dokumentên **Wikileaks**ê diyar dikin, hikûmeta amerîkî alîkarîya serpoşkirina Enfalan kir û nehişt ku bi firehî were zanîn û herweha ew kiryarên ku armanca wan qirkirina gelê başûrê Kurdistanê bû, rewa dîtin.

Berê jî hin detayên derdora vê helwesta amerîkî hatibûn weşandin, lê ev dokumentên nû hin agahîyên nû tînin ber çavên mirovî. Yek ji wan jî ew e ku di zirweya Enfalan de **April Glaspie** balyoza amerîkî ya li Iraqê serdana Kurdistanê kiribû û hewl dabû

▶ R. 3

www.arsivakurd.org

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## Erdoğan, Almanya û Entegrasyon

Serokwezîrê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdoğan roja 28ê sibatê çû bajarê Düsseldorfê ya Almanyayê û ji bo tirkên ku li vî welatî ne, axaftinek kir. Erdoğan di axaftina xwe de got ku divê tirk pêşî hînî tirkî paşê hînî almanî bibin û heger ji tirkan bê xwestin ku ew dev ji çanda xwe berdin, ev yek dê bibe binpêkirina hiqûqa navneteweyî.

Axaftinên serokwezîrê tirk di çapemenîya Almanyayê de bi berfirehî cih girt. Di 2ê adarê de rojnameya *Franfukfurter Rundschau* sebaret bi axaftina Erdoğan gotarek weşand. Nivîskarê gotarê Gerd Höhler axaftina Erdoğan, ku sê sal berê li bajarê Kolnê kiribû û tê de gotibû ku asîmîlasyon sûcekî li dij mirovahîyê ye, bi bîr dixe û rewşa kurdên Tirkiyeyê dipirse. Höhler weha berdewam dike: *"Erdoğan dijberîya xwe ya li dij asîmîlasyonê, ku sê sal berê li Kölnê bi lêv kiribû, vê carê li Düsseldorf û Hannoverê dubare kir. Lê belê vê carê wî şêwaza xwe guherandibû û di şûna asîmîlasyonê de entegrasyon bin xêz kir. Wî weha kir, ji ber ku êdî pê dizane ku kes mafê kurdan jê napirse"*. Nivîskar herweha balê dikişîne ser azadîya olî ya li Tirkiyeyê û dibêje: *"Divê her kes karibe li gor bawerîya xwe bijî lê belê ev yek ji bo mesîhîyên li Tirkiyeyê derbas nabe."*

Her sebaret bi vê mijarê heftenameya Die Zeit gotarek weşand. Nivîskarê gotarê Jörg Lau dibêje axaftinên bi vî rengî yên Erdoğan dibe sedema dijberîyan. Nivîskar, ku axaftina serokwezîrê tirk wekî kampanyaya hilbijartinê bi nav dike, weha berdewam dike: "Qala asîmîlasyonê tê kirin lê belê kes qala kurdan, alewîyan an jî mesîhîyan nake." Gotarnivîs Lau herweha bi gotinên balkêş rexne li dîtinên Erdoğan ên li ser tirkên li Almanyayê û hînbûna zimanê almanî digire û lê zêde dike: "Heger bi qewlê Erdoğanê neteweperest û oldar bibêjim; van kesan rehet berde, ew yên me ne".

Di 28ê sibatê de nûçegihanê Berlînê yê rojnameya îngîlîzi *The Independent*, Tony Paterson şirove kir ku reftara ku koçberên ji Tirkiyeyê rû bi rû dimînin derza navbera Tirkiye û Ewropayê firehtir dike. Rojnameyê herweha gotinên serokwezîrê tirk ên li ser asîmîlasyon û binpêkirina hiqûqa navneteweyî wekî rastgoyîyeke ecêb nirxand û cih da gotinên wezîra entegrasyonê ya Almanyayê Maria Böhmer ku digot bila Erdoğan rexne li entegrasyonê negire lê belê piştgirîya wê bike.

Rojnameyê wekî din gotinên serokkomarê Fransayê Sarkozy, ku di demeke nêzîk de çûbû seredana Enqereyê, bi bîr xist; wî li wir gotibû ku Tirkiye aîdî Ewropayê nîne û divê hevparîyeke din bê fikirîn. Di gotarê de herweha tê gotin ku vê carê jî serokwezîrê alman Angela Merkel jî dê heman helwestê nîşanî Erdoğan bide.

## Azadîya çapemenîyê li Kurdistana Başûr

Roja 28ê sibatê *Rêxistina Rojnamegerên Sînornenas* (RSF) sebaret bi rewşa rojnamegerên li Başûrê Kurdistanê ji serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re nameyek şand. Rêxistinê di nameya xwe de bal kişand ser wê yekê ku ji 17ê sibatê ve, anku ji destpêkirina xwepêşandanên li bajarê Silêmanîyê û vir ve, rojnameger bi gefên kuştinê û êrişên fîzîkî ve rû bi rû dimînin û RSF ji ber vê yekê fikaran dike. Di nameyê de, ku ji alîyê sekterê giştî Jean-François Julliard ve hatibû nivîsandin, weha hat gotin: *"Me di rapora xwe ya 3ê kanûna 2010ê de diyar kiribû ku azadîya çapemenîyê li Herêma Kurdistanê li gor herêmên din zêdetir e û rewş di deh salên dawîyê de bi awayekî berbiçav bi pêş ketiye. Lê belê em niha ji 17ê sibatê û vir ve sebaret bi rewşa rojnamegerên li herêma xweser fikaran dikin."*

Julliard di nameya xwe de herweha diyar kir ku hêzên asayîşê li dij rojnamegeran êrişên fîzîkî pêk anîne û ew bi kuştinê tehdît kirine û ji Serokê Herêmê xwest ku sebaret bi van bûyeran, di serî de sebaret bi agirberdana kanala taybet a NRT, lêpirsînê bide dest pê kirin.

## Agirbesta yekalî ya PKKê

Ajansa Nûçeyan a Firadê di 28ê sibatê de ragihand ku *Koma Civakên Kurdistanê* (KCK) dawî li agirbesta xwe ya yekalî anîye, ku ji 13 tebaxê û vir ve berdewam dikir. Ajansê herweha cih da daxuyanîya Desteya Rêveber a KCKê, ya tê de tê gotin ku ji ber siyasetên îmha û înkarê ya hikûmeta AKPê agirbest êdî bêwate bûye û AKP wekî berpirsiyara dawîlêhatina agirbestê tê ragihandin. Di daxuyanîyê de herweha hat gotin her çend gerîla dê êrişan pêk neyne jî, ew dê bi awayekî çalaktir parastina xwe bikin.

KCKê di daxuyanîya xwe de dibêje hikûmeta AKPê tu gav neavêtine û da ku agirbesteke mayînde pêk bê, divê operasyonên leşkerî bên rawestandin, siyasetmedarên kurd, ku di girtîgehê de ne, bên serbest berdan, komîsyonên ji bo lêkolîna rastîyan bên ava kirin, benda % 10 bê rakirin da ku vîna gelê kurd bikaribe di parlamentoyê de were temsîl kirin û serokê PKKê bikaribe bi awayekî çalak di pêvajoyê de cih bigire.

KCKê her weha diyar kir ku helwesta hikûmeta AKPê li hember pîrozbahîyên 8ê adarê ya roja jinan û 21ê adarê roja Newrozê dê ji bo wan nîşaneyek be ka wê helwesta hikûmetê ji bo rojên pêş çawa bibe.

Sebaret bi vê mijarê rojnameya *Radîkalê* di 2ê adarê de gotara Cengîz Çandar weşand. Çandar di nivîsa xwe ya bi serenavê *'PKK û Dewlet: Gelo ber bi xwekujîya komî ve?'* de dibêje PKK li ser kaxiz çi sedem nîşan dide bila bide, di demeke weha de, ku li Rojhilata Navîn xelk bêyî ku serî li şîdetê bidin, xwepêşandanan li dar dixin, dawîlêanîna agirbestê bi vê demê re bi hev nake. Çandar herweha bi bîr tîne ku serokê PKKê Abdullah Öcalan gotibû ku ew di meha adarê sebaret bi vê agirbestê, ku qirar bû heta hilbijartinên serê havînê dom bikiraya, nirxandinek bikiraya û dipirse gelo du roj berîya adarê wateya dawîlêanîna agirbestê çi ye?


Çandar di nivîsê de cih daye gotinên berdevkê hikûmetê Cemîl Çîçek ku digot *"...Dewletê heta niha çi kiribe ji niha û pê ve jî ew ê bike. Em nikarin bi tu kesî re bazarê bikin. Ev yek aşkere ye. Heta niha me derfetên dewletê bi kar anîn û em gihîştin roja îro. Em dê bi heman biryardarîyê berdewam bikin."*

Gotarnivîs herweha lê zêde dike ku PKK serhildana çekdar a kurdan bi rê ve dibe û bikaranîna şidetê di xwezaya vê serhildanê de heye, lê belê çend meh berî hilbijartinên 2011ê bikaranîna şidetê, ne dewletê, ne jî PKKê bi ser dixe. Berevajîya vê yekê wê her du jî di encamê de wenda bikin û di dîrokê de her du jî bi başî nayên bi bîr anîn.

Çandar di encamê de dibêje nabe ku rewşenbîrên tirk piştgirîyê bidin şiddetê û bang li her du alîyan dike ku berî bibe dereng dev ji şiddetê bê berdan.

Her sebaret bi vê mijarê di 1ê adarê de *BBC-Tirkî*yê hevpeyvînek digel Aysel Tuğlukê weşand. Tuğluk di hevpeyvînê de dibêje agirbesta yekalî ya PKKê firsendeke gelek girîng bû ji ber ku him faktorên navxweyî him jî yên derveyî, çareserîyeke siyasî dispêrin, lê belê ne AKP, ne jî partîyên din ên muxalefetê karîn vê firsendê bi kar bînin. Wê herweha got heger çek îro werin bêdeng kirin jî ev yek nayê wê wateyê ku pirsgirêka kurd hatiye çareser kirin.

BBC bi bîr dixe ku PKKê bêyî ku ji Öcalan daxwazek were, bi tena serê xwe agirbest bi dawî anî û dipirse gelo ev yek nayê wê wateyê ku li ser îradeya Öcalan îpotek hatiye danîn. Tuğluk jî dibêje Öcalan bixwe gotibû ku siyaseta AKPê siyaseta çareserîyê nîne û divê êdî PKK bixwe biryaran bistîne. Lewma ev yek ne li dijî îradeya Öcalan e, lê belê piştî nirxandinekê Öcalan dikare pêşnîyareke din bike. Tuğluk weha berdewam dike: *"Lê belê heger di vê navberê de hin pêşveçûnên berbiçav pêk werin û hevdîtinên digel Öcalan bigihîjin zemîneke diyar, ez bawer dikim Öcalan dê mudaxaleyî pêvajoyê bike. Qet nebe ew dê heta meha hezîranê wext bide hikûmetê. Lê belê divê pêşveçûn bi lez werin ku hêjayî bawerkirinê bin."*



Gökhan Aslan: **Dema Neyekpar**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm


**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Simko Destan
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France


www.avestakurdi.org

# Wikileaks, DYA û Kurd (Dewama rûpela 1.)

ku kiryarên artêşa Iraqê û partîya Baas serpoş bike (1).

Ji hêla xwe de kovara *Der Spiegel*, ku ji dokumentên ***Wikileaks***ê agahdar bû dinivîsîne: *"Serdana yekem a **Glaspie** bo herêmên xiristîyanan bû, wê rewş weha da nasîn: Halê wan baş e, koçberkirina ku berî çend hefteyan dest pê kiribû êdî rawestiyaye, parêzerê ku **Sedam** ew bi cih kiriye jî kesekî cirxweş e û berpirsê ewlekarîyê jî mirovekî alîkar e"(2).*

Balyoza amerîkî guh neda dîtinên **Ebdirehman Qasimlo** yên der barê bûyerên ku li Kurdistanê rû didin û berpirsîyarîya Sedamî ya wan bûyeran.(3)

Dîtinên der barê **Glaspie** çi dibin bila bibin, lê siyaseta amerîkî sebaret kurdan di navbera salên 1988-1990ê teqez dike ku DYA heta piştî bombakirina kîmyayî li Helebçeyê jî bi rik bû danûstandineke gelek asayî û normal bi rejîma Sedam re bike.

Wa diyar e, her wekî **Peter Galbraith** di pirtûka xwe ***The End Of Iraq*** de dinivîsîne, rêveberîya **Reagen** û ya **Bush** ê bav biryar dabû ku opozîsyona iraqî û belkî jî bi taybetî ya kurd ku hîmek ji hîmên opozîsyona iraqî bû, boykot bikin. **Galbraith** dinivîsîne ku **Celal Talabanî** serokê YNK nikarîbû hevdîtinê bi tu kesayetîyekî payebilind re di rêveberîya **Reagen** de bike. Û wezîrê karên derve **George Schultz** hêrs bûbû û lome li **Larry Bob** kiribûn ji ber ku wî **Mam Celal** li derveyî avahîya Kongressê dîtibû(4). Di wê navê de **Nizar Hemdûn** balyozê Sedamî yê li Washingtonê, kesayetîyekî rêzdar û bi qedir bû û pir nêzîkî rêveberîya amerîkî bû.

Wekî ku em dizanin, rewş di salên 1990ê de hate guhertin. Nexasim piştî ku Herêma Parastî (ji kurdên Iraqê re-Jan Dost) bi biryara Encumena Ewlekarîya Navnetewî 688/1991 hate bi cih kirin, êdî DYAyê nema dikarîbû partîyên kurd ên Iraqê paşguh bike. Hêzên kurd bi xwe wê demê bi zanebûn tev negerîyan û rê li ber destêwerdana dewletên cîran vekirin û fersend dane wan. Di wê hingamê de DYA bi israr bû ku ji ber berjewendîyên stratejîk yên amerîkî yên li Iraqê û li Rojhilata Navîn, artêşa Sedamî dûrî herêma Kurdistanê biçe. Herweha piştî destpêka şerê "Azadkirina Iraqê" sala 2003ê hevkariyeke bi giranîya hêzên kurd ji DYAyê re nebû. Lê di gel vê yekê jî siyaseta amerîkî di qonaxa hukumdarîya **Paul Bremer** de ne ji bo xêra kurdan bû. Rêveberîya amerîkî û **Bremer** hewl dan ku siyaseteke beladar (bi bela, encamxirab-Jan Dost) li Iraqê ferz bikin. Dema ku DYA mîna dewleteke dagîrker hat îlan kirin, wan der barê li Iraqa "azadbûyî" teslîmkirina desthilatdarîyê ji bo opozîsyonê, guh nedane bîr û boçûnên kurdan û hevpeymanên kurdan û şî`eyan. Herçî girêdayî kurdan e, rêveberîya amerîkî û **Bremer** ji fikrekê dest pê kirin ku digot; *kurd mecbûrî têkilîya bi wan re ne û divê destûra kurdan nebe ku destkeftên maddî û manewî bi dest bixin.* **Peter Galbraith** di pirtûka xwe de bi vî awayî qala siyaseta guhnedan û bidûrxistinê a rêveberîya Bush û nûnerê wê Bremer dest nîşan dike.

Mirov dikare bibêje ku pirsa federalîzmê bi xwe rojekê ji rojan jî ne fikreke amerîkî bû. Ya rast tekoşîna ji bo sîstemeke federal di salên 1990ê de dest pê kir û hêzên opozîsyona iraqî bêgav bûn ku sala 2002yê federalîzmê bipejirînin, çiku ew mercekî stratejîk bû û kurdan bi israr ew mîna bingehê hevkarîyeke xurt danîbûn. Lê helwesta DYAyê, digel ku ew bixwe dewleteke federal e jî, ne helwesteke heta dawîyê alîkar bû. Ji ber ku wê him razîkirina erebên sunî dixwest û him jî hesabê nepejirîna Tirkiyê ya ji çareserkirina pirsa kurd re dikir.

Ev helwêst di serdema birêveberîya **Obama** de jî nehatiye guhertin. Lê rewş li Iraqê guheriye; piştî ku destpêkê beşdarîya di tevgera siyasî de nedipejirandin, lê êdî sunîyên ereb li Iraqa nûjen, bûne hêzeke bingehîn. Şerê navxweyî êdî bi dawî hatiye û diviyabû nêzîkbûneke amerîkîyan ber bi erebên sunî ve -ên ku ji sala 2003yê ala nepejirînê hilda bûn- peyda bibe. Tiştê balkêş ew e ku DYAyê di hingama hilbijartinên 2010ê de ji kurdan dixwest û zor li wan dikir ku li komara iraqî tenê ew dev ji namzedên xwe ên postên bilind, mîna posta serokkomarîyê, berdin.

**Gelo li gor Wikileaksê mijarên ku berpirsîyarên amerîkî der barê kurdan û pirsa kurd de guftûgo kirine, çi ne?**

Dokumentên hindik ên ku pirsa kurd li Îran, Iraq û berî her deverê li Tirkiyê kirine mijara xwe, aşkere dikin ku rêveberîya **Obama** giranîyê nade wan dozên ku di serdema **Bush** ên bav û kur de dozên sereke û navendî bûn. Ya rast Obama, her wekî **Raxide Dirxam** di rojnameya *Al Hayat* de dinivîsîne, hevalbendên DYAyê li Rojhilata Nêzîk û ya Navîn mat û metel dihêle.(5) Di vê navberê de balkêş e ku diplomatên amerîkî behsa mezinbûn û ferehbûna rola hêzên kurd di dewleta Iraqê de dikin mîna ku hêzên din tiştekî cuda ne.(6)

Di halê hazir de Obamayê ku mijûlê vekêşana hêzên xwe ên leşkerî ji Iraqê ye, xema danîna stratejiyeke dûvdirêj yan demnavîn ji bo vê herêmê naxwe. Stratejîya derketinê *"Exit-Strategy"* mîna ku bi rengekî ji rengan beşek be ji stratejiya mana li Iraqê yan jî li tevaya herêmê, nehatiye danîn. Tiştê balkêş ew e; iraqî dibînin ku hêzên wan ên ewlekarîyê heta sala 2020ê jî dê ne amade bin ku bi rola xwe rabibin, lê berovajî vê dîtinê serokayetîya amerîkî dihesibîne ku ew hêz niha amade ne.(7) Diyar e ku Îran dewleteke cîran e û çavên wê li Iraqê ye û hin daxwazên wê ji wir hene û Iraq jî ji hêla xwe ve ne xwedan hêzek e ku bikaribe van daxwazan bêalî bike û rawestîne.

Li gor dokumentên ***wikileaks***ê serokên kurdan ketine bin tesîra Îranê, lê ev yek xwendineke çewt û ne realist e. Ya diyar ew e ku tu berjewendîyên kurdan di dijminatîya Îranê de nîne, digel ku şerekî çekdarî jî di navbera PJAK û dewleta Îranê de heye.

Niha jî li ber çavan e ku amerîkîyên ji berferehbûna rola îranî a li Kurdistana Iraqê ditirsin, xwedan stratejiyeke zelal û ciddî ne ku bi saya wê dê bikaribin Îranê ji sehneya rojeva Iraqê û Rojhilata Navîn dûr bixînin. Ev yek jî bi siyaseta Obama ya dudilî re harmonîyeke hevbeş li dar dixe.

Dîsa li gor dokumentên ***Wikileaks***ê, dewleta tirk ji Washingtonê çavdêrîya wê yekê dike û dipê ku ew hêzên kurd yên iraqî iqna bike daku alîkarîya Tirkiyeyê di şer û tunekirina PKKê de bikin.(8) Eger em serdana Obama ya bo Tirkiyeyê û hevdîtina wî ya bi hin serokên kurdan re li wir bidin aliyekî, em dibînin ku DYAyê tu karekî ciddî ji bo çareserkirina pirsa kurd li Tirkiyeyê nekiriye digel ku mercên alîkar ên çareserîyekê peyda dibin.

Tevî ku hêzên kurd li herêma Rojhilata Navîn zêde dibin û bihêztir dibin jî, lê dokumentên Wikileaksê diyar nakin ku berê DYAyê li danîna bingeha çareserkirina pirsa kurd ye li welatên ku ew di wan de roleke berz î siyasî û leşkerî dilîzin. Ev xal bixwe jî divê bibe cihê lêpirsînê li cem serokên kurdan; gelo DYAyê şêweyê danûstandina xwe bi kurdan re guheriye yan ew ê dîsa bi uslûba xwe ya berê bi kurdan re têkeve têkilîyan û di çaxên herî hesas û nazik de dev ji wan berde? Li alîyekî din em dibînin ku serokên kurdan jî guh li van bûyerên dîrokî ên ku li herêma Rojhilata Navîn diqewimin, nakin. Ev bûyerên ku mijara wan demokratîzekirin û rêlibervekirina guherînê û guhertina wan serokayetiyên nîv ebedî ne, herweha rêlibervekirina ji nifşên ciwan û çalak re ku biwêrin demokrasîyê berferehtir bikin û mekanizmeke şerê li dijî gendeliyê biafirînin. Û berî her tiştî bidawîkirina sîstema ku xwe dispêre petrolê û hatinên petrolê û gurkirina agirê şoreşeke kiştûkalî ji bo xwe bi xwe fînasekirinê.

Ev guherînên pêwist wê bêguman tecrubeya Kurdistana Başûr kûrtir bikin û kurdan bikin lîstikvanekî mezin di qada Iraqê û Rojhilata Navîn de, her weha li himber hêzên derve jî û di nav wan de DYA.

Niha eger em siyaseta DYAyê ya di heft salên borî de bipîvin û bixwînin, em ê bibînin ku lawazîyek di siyaseta wê ya li Kurdistanê heye. Çawa dewletek dagîrkera Iraqê be û bi hezaran bisporên wê li wir hebin û heta niha -wek mînak- agahîyên wê li ser tevgera **Goran**ê kêm bin?! Gelo ev tê wê wateyê ku DYA zêde guh neda tiştên ku di hundirê YNK de diqewimîn? Yan jî gelo mirov dikare bibêje ku DYA ya ku rastî terorê bûbû û opozîsyona sunî li Iraqê ew veciniqandibû, tu giranî neda bûyerên Kurdistanê û qîma xwe tenê bi piştgirîya şeklî ji rewşa herêmê ya siyasî re anî!? Lê pirsiyara herî girîng a ku kesî nekiriye û dokumentan behsa wê nekirî, piştî vekişandina DYAyê rewşa kurdan li Iraqê ye! Gelek mijar hene hîn çareser nebûne û rola DYAyê di çaresernekirina wan de heye; mîna mijara Kerkûkê û madeya 140ê a destûra Iraqê. DYAyê dikaribû, ne tenê zorê li kurdan bike da ku israrê li pêkanîna lezgîn a maddeya 140ê nekin, lê wê herweha dikaribû rola moderator jî bilîze û bihêle ku alîyên nakokîyê çareyekê qebûl bikin. Gelo çima DYAyê ev rol nelîst? Xwendineke aram û kûr a pirtûka **Peter Galbraith** bersiveke piçekî maqûl dide. Erê DYAyê xwestibû ku kurdan ber bi xwe ve bikişîne, lê wê bi vê yekê qaideya ZERO SUM GAME dixwest; anku eger em bidin ber wan fersendên salên 1980yê û wî buhayê giran ê ku kurdan ji bo ferderalizmê danîn, fersendên kurdan ji bo bidestxistina destkeftan pir kêm bûn. Ew ferderalizma ku hevbeşên wan ên ereb li Iraqê itirafê pê nakin.

Ji bo ku Kurdistan nebe "*dewleteke neserkeftî -**failed State***" û ji bo ku bikaribe pêşberîya zor û zehmetîyên piştî vekêşana DYAyê bike, divê dest bi tevgereke ***Rebuilding*** "nûavakirinê" bike û şerê gendelîyê û bêberpirsiyarîyê û sîstema xwe spartina dahatên petrolê bike, divê demokratîzekirineke di her warî de dest pê bike. Ji ber ku ji wî gelî bi hêztir nîne , ewê ku serencam û çarenûsa xwe bi destê xwe dest nîşan dike, berî ku ji yên xeyrî xwe itirafa bi çarenûsê bixwaze.

* Ji Zanîngeha Duhokê

1 Wezîrê Karên Derve yê amerîkî James Baker di serdema G. Bush de û herweha medyaya amerîkî dest nîşan dikin ku saxikîya Glaspie bû sedema bawerîya wê ya bi Sedam Huseyn. Ew bixwe Glaspie ji salên 1950yê û vir de gelek caran serdana Iraqê kiribû û bi erebî baş dizanîbû. Birêz Isam Etiyye, yek ji dijberên Sedam Huseyn ku sala 1990ê li Londonê mir, di hevdîtineke me ya li Londonê, li mala dijberê iraqî Seed Salih Cebir ya sibata 1989ê de ji min re ragihand ku Glaspie û Phebe Marr a ku paşê bû bispora mêjûya Îraqê, demeke dirêj di salên pêncîyê de li Iraqê mabûn û helwêsteke erênî beramber dewletê nîşan dabûn.

2 Der Spiegel 49/2010, p. 121

3 Jêderê berê

4 Peter Galbraith. The End Of Iraq. Eldar El-Erebiyye 2006, p.52-53


5 Raxide Dirxam: Rêvebirîya Obama li ser pişta hevalbendên xwe bûye bar. Alhayat 11.02.2011

6 Binêre: www.rudaw.net/english/kurds/3324 html?print/10.02.2011

7 Vgl. Anthony Skinner, US Withdrawal from Iraq: Leaving it all behin?, in: The Middle East, (2010) 10,S. 11

8 Congressional Reasearch service: The Kurds in Post-Saddam Iraq, by: Kenneth Kaman, January 8, 2009

Wergera ji erebî: Jan Dost



GÖKHAN ASLAN: **Lîrika Bahewa**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ



## Gökhan Aslan

Gökhan Aslan di 1971ê de li Amedê hatiye dinyayê.

Xwendina xwe ya destpêk, navîn û lîseyê li Amedê temam kirîye, piştre ji bo xwendina xwe ya bilind çûye Enqereyê.

Li Enqereyê li Zanîngeha Gazîyê, di Fakulteya Hunerên Ciwan de beşê şêwekarîyê temam kiriye. Piştî xwendina zanîngehê, li Siwêregê wek mamosteyê şêwekarîyê xebitîye.

Aslan ji 2004ê û pê de, li Amedê mamostetîya şêwekarîyê dike û li tenişta mamostetîyê di 2005ê de bi navê **Atolyeya Hunerê-Germ** atolyeya xwe ya hunerî jî vekirîye. Ji alîyekî hunera xwe çêdike, ji alîyê din ve xwendekaran digihîjîne.

Di sazîyên mîna Komeleya Çand û Huner-Çira, Egitim-Senê de dersên şêwekarîyê jî daye.

Hunermend ji sala 2000î bi şûn de dest bi pêşangehan kiriye, li Enqereyê, Stenbolê û bi taybetî jî li Amedê bi kesên din re beşdarî pêşangehên tevlihev bûye û bi tena serê xwe jî amade kiriye.

Di derbareyê hunermend Aslan û hunera wî de agahdarîya zêdetir, hûn dikarin li ser malpera wî bixwînin.

www.gokhanaslan.net

www.arsivakurdi.org

# Li Kurdistanê Setrenca Nabuccoyê

PERWER YAŞ *



*Cavkanî: www.nabucco-pipeline.com*

Di 9ê adara 1849ê de li bajarê Îtalya Mîlanoyê operayeke bestekarê navdar Giuseppe Verdi hat pêşkeş kirin. Navê lîstikê "Nabucco" bû. Verdi di vê lîstikê de ku ji Încil û Tewratê sûd wergirtiye, qala şahê navdar ê babîlî Nebukednezzar dikir. Jixwe navê orjînala berhema Verdi ku bi vê navdar bû, "Nabucodonosor" e. Lehêngê dîrokê, avakarê "baxçeyên mêwê" ku berhema sereke ya mirovahîyê ye, cihûyan ji Babîlê derdixe û wan sirgûn dike. Ne tenê ev, herwiha heya Jerusalem, di lîstikê de wekî Yeruşalîmê tê bi nav kirin, diçe cihûyan dîl digire.

Nebukadnezzarê zalim ku di çavkanîyên ereban de wekî "Bextûnesir" tê zanîn, Jerusalemê dide ber agir, kevir li ser kevir nahêle. Pîrozgeha nebî Silêman jî para xwe ji agirê babîlîyan digire û dişewite. Nebukadnezzarê ku berî zayînê 500 salan jiyabû, dema vedigere welatê xwe Babîlistanê malbatên cihû yên dewlemend jî li gel xwe dibe. Li gor Ehdê Qedîm, Xweda bi destê babîlîyan şahê îsraîlîyên ku ji rê derketibûn ceza kiriye û ew avêtine nav agirê Nebukadnezzar. Lê belê ew cihûyên diçin Mezopotamyayê tevlî çanda babîlîyan dibin, aborîyê xurt dikin û ne wekî "dîlên şer" jiyana xwe didomînin. Jixwe Babîlistana wê demê wekî navenda pêşketina mirovahîyê tê nas kirin.

Piştî 153 salan, 10-10-2002, li paytextê Awûsturya Wîyanayê operaya "Nabucco" careke din hate pêşkêş kirin. Jixwe roja 10ê Cotmehê ne tesaduf bû, ji ber ku ev roj rojbûna bestekarê binavûdeng Verdi ye. Di salona operaya dîrokî de rêveberên şirketên BOTAŞ (Tirkiye), Bulgargaz (Bulgaristan), Transgaz (Romanya), MOL (Macaristan) û OMV Erdgas (Avûsturya) hebûn. Dotira rojê patronên şirkêtên gazê yên herî mezin ên ewropî piştî temaşekirina lîstika "Nabucco"yê peymaneke dîrokî ya hevkarîyê îmze kirin û navê wê danîn "Nabucco".

Şirketan di 2004ê de gaveke din avêtin û "Nabucco International Company" ava kirin. Projê heya şeva sersala 2006ê bêdeng kar û barên xwe dimeşandin. Ewropî piştî pîrozbahîyen sersalê yên bi coş, serê sibê dema şiyar bûn rastî surprîzekê hatin; Rûsya vanaya(kanî/lûle) xeta gazê ya ku dihat Ewropayê badabû. Ukranya deynê xwe yê gazê ku nêzî 2,5 milyar dolar bû nedabû û cezayê vê jî welatên ewropî yên çara yekê gazê di ser Ukranyayê re werdigirin, dikişand.

Piştî çend rojan, piştî hevdîtinên lezgîn careke din vanayên gazê vebûn. Ewropa ji vê alozîya ku dikaribû parzemînê hemûyê bê enerjî bihêle, filitîbû. Lê belê tirsê dewam dikir. Ewropayê nedixwest ku dest û piyên wê bi welatekî "bêewle" mîna Rûsyayê ve were girêdan û pêdivî bi korîdoreke nû ya enerjîyê hebû. Ji ber vê jî, ewropî careke din dest avêtin Nabuccoyê û lez dan xebatên vê projeya ku dê parzemîna ewropî ji gaza Rusyayê rizgar bikira. (1)

Di sibata 2008ê de şirîkeke şeşemîn a Nabuccoyê çêbû; RWE. Şirketa Alman jî tevlî kompanyayê bû. Êdî qezenca gazê ku dê ji Xezarê û ji Başûrê Kurdistanê bihata, dê li ser şeş şirîkan bihata parve kirin. Piştre kevnewezîrê karûbarên derve yê Almanyayê Joschka Fischer jî bû şêwîrmendê RWEyê. Fischer, Rojhilata Navîn, bi taybetî jî Tirkîye baş nas dikir û dê li ser mijara ewlekarîya Nabuccoyê mijûl bibûya. (2)

Di demekî kin de Fischer dest bi xebatên lobîyê kir û berê xwe da welatên Asyayê. Dema bû yek ji rêveberên Nabuccoyê ji Handelsblattê, ji rojnameya herî navdar a aborîyê re got; "Ez dê azmûnên xwe yên wezîrtîyê ku min salên dûr û dirêj bi dest xistin, niha ji bo koordînekirina Nabuccoyê bi kar bînim."

Piştî demekê rojnameya almanî Handelsblattê da zanîn ku Fischer bi serketî kar û barên xwe dimeşîne û di hevdîtinên bi Herêma Kurdistana Federal û Azarbeycanê re encamên girîng bi dest dixe. Herwiha reqîbê Fischer jî hevkarê wî yê berê Gerhard Schröder e ku di navbera salên1998-2005an de serokwezîr bû. Schröder jî şêwirmendê projeya Herikîna Bakûr (Nord Stream) e ku di navbera Rûsya û Almanyayê de hatibû imza kirin.

Lê belê ihtimaleke mezin heye ku Rûsya dê di demên pêş de vekirî dijberîya Nabuccoyê bike. Ji ber ku ekîba Putin ku desthilatdarîya welat di destê wan de ye, piştî hilweşandina Sovyetê, hêza Rûs anîn ser hev, welatê xwe careke din kirin "hêzekî super" ya navneteweyî. Ew dê gazê jî ji bo xurtkirinê bi kar bînin. Jixwe di vir de jî faktora Ewropayê dikeve dewrê ku her tim li dijî Rûsyayê di nava bê bawerîyeke kûr de ye.

Li gor Fischer ku yek ji bisporên têkilîyên navnetewî ye û rêveberîya Moskovayê ji nêz ve nas dike, bi pêşketina projeya Nabuccoyê ve girêdayî dê Rûsya zextê li welatên Sovyeta kevin, Ukranya, Azerbaycan û Turkmenistanê bike. Fischerê alman ji bo vê, Ewropayê hişyar dike û dibejê "Ji bo ev proje bi ser keve ku ji bo me tê wateyeke mezin, divê Ewropa xwedî helwesteke xurt be û guh nede gefên Kremlînê. Ne tenê Ewropa, Amerîka jî dizane ku Rusyayê di warê enerjîyê de zend û bendên xwe badane. Ji bo ku Rûsya xwe bide ser hev û careke din diranên xwe nîşan bide, Putin baş dizane ku alava herî giring enerjî ye. Ji ber van hemû sedeman divê xeta başûr a gazê têkeve jiyanê." (3)

Ji ber van hemû sedeman ji bo ku proje bi selametî û lezgînî bimeşe, pêwîstîya ewropîyan bi "erêkirina" hikûmetan hebû. Dem: 13ê Tîrmeha 2009ê. Cih: Enqere. Serokkomarê Gurcistanê Mikheil Saakashvili, Serokwezîrê Romanyayê Emil Boc, Serokwezîrê Avûsturyayê Werner Faymann, Serokwezîrê Bulgaristanê Sergei Stanishev, Serokwezîrê Macaristanê Gordon Bajnai, Serokwezîrê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan û serokwezîrê Iraqê Nuri El-Maliki proje mor kirin. Serokê Komîsyona Yekîtîya Ewropayê Jose Manuel Barroso jî peymanê îmze dike, êdî proje bû operasyoneke girîng ya Ewropayê.

Misogerîya hikûmatan pêwîst bû. Jixwe ev gava ku li Enqereyê hatibû avêtin di projeyê de wekî pêngaveke dîrokî tê bi nav kirin. Mazûvanîya Enqereyê jî, ji alîyê ewropîyan ve bi zanebûn hatibû hilbijartin. Tevahîya dirêjîya xeta lûleyan ji 3300 kilometreyan pêk tê û 2 hezarên wan di erdê Tirkiyê re derbas dibe. Barê giran yê Tirkîyeyê ne tenê ev e. Xeta ku berhema wê di salê de 30 mîlyar metrekub gaz e, dê ji du milan ve bê: Kafkasya û Herêma Federal a Kurdistanê. Dê her du lûleyên gazê li xaka Tirkîyeyê bibin yek û di ser Balkanan re berê xwe bidin Ewropayê. Bi awayekî dî, "dilê Nabuccoyê" dê li coxrafyaya kurdnişîn, ango dê li Kurdistanê be. (4)

Yanî Nabuccoya ku dê bi 8 mîlyar dolaran pêk were û di sala 2015ê de temam bibe, ji gelek alîyan ve girîngîya stratejîk a Kurdistanê zedê dike. Him ji Başûrê Kurdistanê û him jî ji Bakûrê Kurdistanê ve. Lê eger aramîya Kurdistanê tunebe, dê miheqeq lûleyên gazê jî ji şer û pevçûnan ziyanê bibînin. Ji ber vê jî, divê berî her tiştî ji bo korîdora enerjîyê ku dê ji "welatê Nebukadnezzar" dest pê bike, Kurdistaneke ewle were saz kirin. Jixwe ewropî bi taybetî jî şêwirmendê projeyê yê alman Fischer û serkêşê Nabucco yê Avûsturyayê vê yekê baş dizanin. Her du welat jî ne xerîbên pirsgirêka kurdan in û gelek caran (carna vekirî) jî bi awayekî dîplomatîk Tirkîyeyê hişyar dikin.

Heta îhtimal heye; Erdoganê ku hêdî hêdî ji Ewropayê bi dûr dikeve Nabuccoyê jî li dijî Ewropayê wekî "çekekî" bi kar bîne. Jixwe serokwezîrê tirk çend caran sînyalên vê yekê dan. Erdogan biheq e ku xwe giran bike. Lewra beşê herî nazik di Tirkîyeyê re derbas dibe. Xeta ji Gurcistanê tê Erdexan û Qersê û ya ji Îraqê jî tê Şirnex û Mêrdînê. Anku dê di destê hikûmeta tirk de du vanayên Nabuccoyê hebin.

Li gor bisporan nêzîkbûna hikûmeta tirk û Herêma Kurdistana Federal rûyekî din yê vê projeyê ye. Heta tê gotin ku her du alî bi daxwaza ewropî û amerîkîyan tên cem hev û sarbûna di navbera xwe de bi mebesta Nabuccoyê germ dikin. Ji alîyekî din ve jî ev proje di navbera hikûmeta merkezî ya Bexdayê û ya Hewlêrê de dibe sedemê guftûgo û gazindan. Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Berhem Salih ragihand ku ewê jî bi rêya Nabucoyê gaza xwe derbasî Ewropayê bikin. Lê belê Wezareta Petrolê ya Iraqê ev yek wekî têvergek li dijî destûra Îraqê bi nav kir. (5)


Di trafîka Bexda-Hewlêr-Enqereyê de divê rola Washingtonê neyê ji bîr kirin. Ji ber ku rêveberîya Washingtonê dikare roleke sereke di nêzikkirina van her sê paytextan de bileyze. Ji bo wê, sefîrê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê Marc Grossman ku salên dûr û direj li Enqereyê bû bang li Washingtonê kir ku ji bo zelalkirina rewşa Naboccoyê zextê li serokwezîrê Iraqê El Malikî bike. Li gorî Grossman, çavkanîyên gazê yên welatê Kafkasyayê têra Naboccoyê nakin û bal kişand ser herêma Federal a Kurdistanê û Îraqê. Grossman ku niha ji bo Cohen Groupê dixebite, ji ber vê jî dest nîşan dike ku divê Washington, girîngîyê bide Naboccoyê. Ew didomîne û wiha dibêje: "Li gorî agahîyên ku rêveberên Naboccoyê didin, mirov dikare rêjeyeke mezin a gazê li herêma kurdan a li bakûrê Îraqê peyda bike. Ev jî dikare bibe bingeha aştîya di navbera tirk û kurdan de." (6) Di vê xalê de divê rewşa çekdarên PKKê jî, ku di herêmê de bi cih bûne, neyê ji bîr kirin. Heya niha rayedarên PKKê bi awayekî fermî di der barê Nabuccoyê de ne bi erênî, ne jî bi neyînî daxuyanîyek nedaye. Lê belê şiroveyên di der barê ewlekarîya Nabuccoyê de tên kirin, balê dikşînin ser PKKê. (7)

Ligel hemû alozî û helwêstên nedîyar, di dawîya sala 2010ê de dest bi bicihkirina lûleyan hat kirin. Di meha cotmehê de xeta 50 kilometreyî ya di navbera sînorê Bulgaristan û Macaristanê temam bû. Lê belê wisa dixuyê dê guzergehên dî, dê ne bi hêsanî temam bibin. Herwiha di hefteya duyemîn a sala nû de Serokê Komîsyona Yekîtîya Ewropayê Jose Manuel Barroso bi serokdewletê Azerbeycanê Aliyev re peymaneke giring a Nabuccoyê mor kir. Bi vê peymanê re piyekî girîng a Nabuccoyê ku wekî "Deryaya Şah-II" tê bi nav kirin, hate diyar kirin. Heyeta YEyê piştî Bakûyê çû Turkmenistanê ku di heman demê de gazê dide Çînê jî. Li gor hin çavkanîyan dîplomatên ewropî ji Turkmenistanê re wiha gotiye: "Em ê ji bo gazê pereyekî baş bidin we." Wisa xuya dibe ku piştî Rûsyayê, dê Çîn jî, ji Nabuccoyê re astengan derxe. (8)

Ji bilî diplomat û siyasetmedaran, endazyarên ewropî jî di bin kar û barekî giran de ne. Endazyarên Nabuccoyê girîngîyê didin van xalan: Ziyanê nedin xwezayê, çiqas ji dest bê bila di çolê re derbas bibe, ji wargehan dûr be û bila bi butçeyeke kêm li ser şirketan bibe mal. Bêguman zor e ku ev hemû pêk werin. Jixwe şefê Nabuccoyê Reinhard Mitschek ku li Wiyanayê rûniştiye, dibêje: "Ji Nabuccoyê re sêhrbazîyeke mezin lazim e." (9)

Aşkere ye ku "cindarîya tund" dê li Kurdistanê were ser dikê. Anku Kurdistan dê bibe qada leyîstina setrenceke mezin. Şer an aştî? Yek ji van dê encama vê leyîstikê diyar bike. Jixwe bihuşta Nebukadnezzar di Qûr´ana pîroz de bi navê "Îrem" derbas dibe û pesnê wê tê kirin. Çavkanîyên îslamî jî dibêjin ku Xweda ev buhişt ji insanan veşartiye. Hegel, feylesofê navdar ê elman, wiha dibêje: "Di dîrokê de her tişt bi kêmanî du caran dubare dibe..."

*Rojnamevan


GÖKHAN ASLAN: **Bajarvaniya Şeftûl**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

1 Weşana Koma Zanîstî ya Meclîsa Federal a Alman, Nr: 22/07, 21.06.2006
2 Rojnameya aborî ya almanî Handelsblatt, 09.09.2010
3 Malpera înternetê ku 150 welatan û 350 rojnameyan digihîne hev ‘Project Syndicate’, 26.07.2010
4 Malpera fermî ya Nabuccoyê, "nabucco-pipeline.com"
5 Aknews, 29.08.2010
6 Analîza Marc Grossman û bisporê enerjîyê yê Enstituya Washingtonê Simon Henderson, The Dallas Morning News, 21.07.2010
7 Emre Uslu, rojnameya Taraf, 18.07.2009
8 Wiener Zeitung, 11.01.2011
9 Rojnameya aborî ya avusturyayî Profil, 06.11.2010

### Ji meyla bêalîtîyê ber bi hevkarîya stratejîk ya digel Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve

# Meksîkayê weha dev ji serxwebûna xwe berda

Jean-François Boyer *

Li dora meseleya Florence Cassezê, welatîya fransî ku edaleta meksîkî ew bi şêst salên girtîgehê mehkûm kir, ji bo hevkarîya revandinê, Parîs li cihê xwe nasekine. Li ser vê meseleyê, Meksîka ji ya xwe danakeve û serxwebûna xwe derdixîne pêş. Lê belê, li hember DYAyê, ew pir nermtir xuya dibe.

Ji sala 2006ê ve ango ji dema ku serokdewlet **Calderón** bû desthilatdar û vir ve, dîplomasîya meksîkî alîyê Waşîngtonê digire. Ev yek bi xurtî berevajîyê serxwebûna ku Brezîlya beramberî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê nîşan dide, ye.

Di kanûna 2009ê de, piştî ji desthilatdarîyê xistina serokdewletê Hondurasê **Manuel Zelayayî**, Meksîkayê jî weke Waşîngtonê rewabûna hilbijartinên **Porfirio Lobo** kir desthilatdar, pejirand. Brezîlya û Yekîtîya Ewropayê ev hilbijartin ne rewa îlan kir.

Gulana 2010ê, sibetira însîyatîva tirk û brezîlî ya ku alternatîvek pêşniyazî gefên Neteweyên Yekbûyî yên li Îranê dikir –li ser peymaneke bihevguherîna sotemenîya nukleer– Meksîkayê dengê xwe ji bo cezayên nû yên li dijî Tehranê bi kar anî, ango li alîyê pênc endamên daîmî yên Konseya Ewlekarîyê ku Waşîngton serkêşîya wan dike. Mehek paşê, di dema nîqaşên li Konseya Ewlekarîyê yên li ser ji alîyê Îsraîlê ve biserdegirtina fîloya insanî ya ber bi Xezzeyê ve, Meksîkayê destek da biryara Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêşniyaz kirî, ya ku ji ber bûyeran "xemgînî" derdibirî, lê êriş şermezar nedikir. Brezîlya banga şermezarkirina aşkere ya operasyona Îsraîlê dike.

Gelo Meksîkayê dev ji azadîya xweîfadekirinê; ya ku ji 1945ê heta 1982ê rengê siyaseta wê ya derve diyar dikir; û ya ku xwe –li gor birêveberan– disparte serbixwebûna neteweyî, desttêwerdana karê hundir ê dewletan û rêzgirtina ji mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya gelan, berda?

### Ka em berê xwe bidinê û bi bîr bînin...

Sala 1954ê, Meksîkaya **Adolfo Ruiz Cortines**, serokdewletê Guatemalayê **Jacobo Arbenz** hewand. **Arbenz** di encama darbeyeke eskerî ya CIAyê organîzekirî de ji desthilatdarîyê hatibû xistin. Warisê Cortines, **Adolfo López Mateos** (1958-1964) xwe nêzî tevgera bêalîyan kir û çû serdana serokkomarê Misirê **Cemal Abdel Nasir** û serokwezîrê Hindistanê **Jawaharlal Nehrû**. Her du jî nûnerên herî darîçav ên tevgera bêalîyan bûn. Sala 1962ê, ji ber ku Waşîngtonê kir ku Kubaya şoreşger li derveyî Rêxistina Dewletên Amerîkî (OAS) bê hiştin, **López Mateos** li ber DYAyê rabû. Paşê, **Luis Echeverria** (1970-1976) wê destek bidaya **Salvador Allende**, derîyê xwe li penaberên ji ber dîktatorîyên eskerî yên Amerîkaya Başûr reviyan, vekira û têkilîyên bi bêalîyan û Kubayê re jî xurt bikirana. **José López Portill** yê piştî wî hatî, destek da şoreşa sandînîst û gulana 1978ê çû Moskovayê, li wir jî bi **Leonîd Brejnev** re rûnişt. **Brejnev** piştî hevdîtinê weha peyivîbû: "*li ser mijarên herî girîng em her du welat jî xwedîyên pozîsyon û fikrên wekehev yan jî dişibin hev in.* (1)"

Lê belê bîra mirovî dikare yekî bixapîne jî: Ji bilî daxuyanîyên cîran û yên wêdetir provoke dikin, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di çarçoveya şerê sar de di mijara herî heyatî ya ewlekarîya împaratorîyê de bi piştgirîya Meksîkayê bawer bû. **López Mateos** ê ku nêzîkbûna ber bi bê alîyan ve da dest pê kirin, di heman demê de bi Waşîngtonê re jî têkilîyeke dostane datanî: Di nav çar salan de ew şeş caran bi hempîşeyên xwe **Dwight D. Eisenhower**, **John F. Kennedy** û **Lyndon B. Johnson** re rûnişt, ev rekorek e. Wekî din, wî hay ji xwe hebû ku xeta sor a cîranê xwe yê hêzdar derbas neke: Meksîkaya ku tu caran nabe endameke tam a tevgera bêalîyan, qîma xwe bi kursîyeke çavdêrîyê tînê. Çirîya pêşî ya 1962ê, di dema krîza fuzeyên sovyetî yên li Kubayê de, Meksîkayê di civîna OASê de li cem Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê cih girt, bicihkirina fuzeyan li ser erdên Kubayê şermezar kir û xwest ev pergal werin ji hev xistin.

Piştî hingê, Meksîkayê wê ambargoya aborî li dijî giravê bi rengekî hişk pêk bianiya û CIA ji trafîka transît ya welatîyên dewletên bakûrê Amerîkayê û şoreşgerên latîno-amerîkî ya di ser balafirgehên meksîkî re diçin Kubayê, bi rêk û pêk agahdar bikiraya. Echeverrîa bixwe jî îstîsna nîne.

Li gor dîroknas **Lorenzo Meyer**, stratejîya Echeverria ya dijberîya ji derve ve xuya ya bi "cîranê li bakûr" re –weke yên berî xwe– ji bo hikûmeteke "*ku nikarîbû pişta xwe bi rewabûna demokrasîyekê rast bike ku di bin desthilatdarîya otorîter a PRIyê de ji heftê salî û vir ve nîne.*" berîya hertiştî "*çavkanîyeke destjêhabe ya rewabûnê*" ye (2) Ya rastî, peywendîya **Echeverria** bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re bi tevahî bi rengekî din bû. Em ê paşê fêr bibûna ku CIAyê serokdewlet, di dema desthilatdarîya şeş salan a serokdewletê berî wî **Dîaz Ordaz** de, kiriye endamê xwe. Di çarçoveya bernameyeke bi navê *Litempo* de ya ji bo aşkere kirina çalakîyên çepê şoreşger ya li Amerîkaya Latîn, **Echeverria** ji CIAyê re dixebitî. (3) Di dema şeş salên desthilatdarîya xwe de jî, ew ê biketa "şerê qirêj", ango tepisandineke hovane ya li dijî tevgerên gerîla yên herêmî.

Dîsa jî navbera Meksîka û Waşîngtonê wê di derbareyê mijara Amerîkaya Navîn de nexweş bibûya. Serokdewletê Meksîkayê **López Portillo** (1976-1982) ji bo pîrozkirina serkeftina Bereya Sandînîst ya Azadîya Neteweyî, 14ê tîrmeha 1979ê çû Managuayê û alîkarîyeke malî ya mezin da dewleta nû. Wî dê petrola meksîkî bi taybetî bi buhayekî erzan bifirota Nîkaraguaya şoreşger. 28ê tebaxa 1981ê, Meksîka û Fransayê daxuyanîyek mohr kir û pê du bereyên şoreşger ên salvadorî (FMLN û FDR) weke "hêzên nûner" ên welêt qebûl kirin.

Lê belê, gava sala 1981ê **Ronald Reagan** bû serokê DYAyê, Nîkaraguaya sandînîst weha gunehbar dikir: "*hevgireke Yekîtîya Sovyetan a ku bi balafiran du saetan ji sînorên me dûr e (4)*". Waşîngtonê hingê zext li Meksîkayê kir. Wê jî hêdî hêdî bi anîna ser heman maseyê ya Waşîngton û Managuayê, dev ji fikra xwe ya rewakirina şoreşa sandînîst berda. Portillo wê di vê navê de desteka xwe ya ji bo çareserîyeke pirsgirêkan a di encama hevdîtinan de dewam bikira û vê yekê di nav koma Contadora de bandor li Salvador û Guatemalayê jî kir (5).

Ji hev cihê bûn wê tu carî pêk nehata. Tim di bin zexta Waşîngtonê de, **Miguel de La Madrid** (1982-1989) wê destûr bida polêsê xwe yê siyasî ku bêyî balê bikîşîne ser xwe, bi CIAyê re hevkarîyê bike û destûr da kartelên meksîkî ku "kontrayên" nîkaraguayî li ser erdên Meksîkayê perwerde bikin û çalakîyên xwe bi bazirganîya narkotîkê fînanse bikin. (6)

Em neçar in bibêjin ku xweserîya meksîkî nisbî ye: Bi awayekî "serxwebûneke di nav girêdanê de" ye. Li gorî Meyer, ev yek xwe dispêre peymaneke nepenî, nenivîsandî, lê belê ferzker ya ku heta bi dawîya şoreşa meksîkî ya sala 1924ê diçe: Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê destek bidaya hikûmetên meksîkî û dest têwernedana karên hundir, bi şertê ku ev hikûmet aştî û ewlekarîya li ser sînorê hevpar –ê bêhtirî 3000 kîlometreyan– û îstîqrara siyasî ya nav welêt misoger bikin. (7)

Di navbera salên 1960 û 1982ê de, tercîhên aborî yên serokdewletên demê -siyaseta pîşesazîyê, xurtkirina şîrketên neteweyî (nexasim yên bankeyî) û pêşxistina bazara hundir- destûra vê rehetîya manovrayên dîplomatîk dabû. Ev model di serî de bi xêra kara ji petrolê dikarîbû were fînanse kirin: Ji 1963ê heta 1972ê kolana bîrên nû yên petrolê yên beramberî Tampîko û Kampeş ku di deryayê de kirin, Meksîka bibe yek ji dewletên hêza petrolê (8). Wê ji kanîya deyndarîya navneteweyî jî vedixwar.

Sala 1982ê, dema ku krîza deynan da der, her tişt ser û binî hev bû. Welat bi carekê di bin barê angajmanên xwe de tewiya. Alîkarîya malî ya bakûrê Amerîkayê û ji nû ve bazarkirina deynan bi şertê pêkanîna sererastkirineke tevnî hatin girêdan. Vê yekê serokdewletên nû yên nûlîberal yên ji Partîya Şoreşger a Sazûmanî (PRI) hîç aciz nekir: Pêşî **De La Madrid**, paşê **Carlos Salinas De Gortari**. Kêmkirina lihevderneketina bacê, serbestkirina buhayan, taybetkirineke bi lez a şîrketên dewletê û bankeyan... Hewldanên meksîkî bi ketina welêt a nav Peymana Giştî ya li ser Buha û Bazirganîyê (GATT, 1986) hatin tezmîn kirin. Sala 1993ê, mohrkirina NAFTAyê (Peymana Bihevguherîna Serbest a Bakûrê Amerîkayê) di nav sê welatên bakûrê Amerîkayê de bi awayekî nihayî çarenûsa Meksîkayê bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve girêda. Mezinbûna welêt wê êdî girêdayî mîqdara bihevguherîna bi cîranê li bakûr û sermayedana bakûr-amerîkî yên di beşa pîşesazîyê û taşeronîyê ve be. (*Nivîsa di çarçoveyê de bixwînin*).

Ji mehên pêşî yên şeş salên desthilatdarîya **Ernesto Zedillo** (1994-2000), krîzeke nû ya aborî ev sertewandina Meksîkayê zexmtir kir. Waşîngtonê careke din cîrana xwe ya li başûr bi riya organîzekirina alîkarîyeke lezgîn a mezin ji îflasê xilas kir: Reservên Federal, Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF), Bankeya Peredanên Navneteweyî, Bankeya Dinyayê û Bankeya Navamerîkî ya Jêrxaneyê bêhtirî 40 milyar dolaran dan Meksîkayê.

Analîzvanê aborîyê **Rogelio Ramirez De La O** vê tesbîtê dike, ji hingê ve "*ev girêdana malî ya beşên bakûr-amerîkî yên herî muhafezekar, di mijara siyaseta derve de gem li devê hikûmetê xistin. Ji bo ku komên pîşesazîyê û malî yên ku aborîya meksîkî li ser piyan digrin, nekin dijberê xwe, hikûmet her tiştî dikin*" (9). Kevnewezîrê karê derve yê hikûmeta Vicente Fox, **Jorge Castañeda** di van şertan de weha dinirxîne: "*ne pêwîst e ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê gefan li Meksîkayê bixwe da ku dev ji hin pozîsyonên xwe berde. Lewma ji 1982ê û vir ve, her serê pênc yan jî şeş salan carekê welat dikeve krîzê, tê ber îflasê û para bêhtir jî yên ku me dixin vê rewşê amerîkî ne....*(10)".

Sala 2000ê, şkestina PRIyê û hilbijartina karsazekî xirîstîyan demokrat, kevnemidûrê giştî yê Coca Colayê li Meksîkayê, serokê Partîya Çalakîya Neteweyî **Vicente Fox** wê bi awayekî nihayî dawî li îradeya qels a bêalîbûnê bianiya.

**Fox** têkilîyeke dostane bi **George W. Bush** re danî. Piştî êrişên 11ê Îlona 2001ê, hikûmeta meksîkî hêzên xwe yên ewlekarîyê xistin xizmeta parastina sînorê bi DYAyê re û ew li dij e ku xalên NAFTAyê yên herî zêde zirarê li aborîya Meksîkayê dikin, ji nû ve werin nîqaş kirin –ku çep û neteweperestên PRIyê doza wê dikin. Di nav çend salan de, bankeyên sereke yên taybet ên meksîkî ketin destê biyaniyan: Citygroup, HSBC, Santander û hwd. Di dîroka têkilîyên dualî yên ligel Kubayê de, Meksîkayê yekem car sala 2003ê li Komîsyona Mafê Mirovan a NYyê li dijî Kubayê dengê xwe bi kar anî.

Di berdêla vê de, Meksîka hêvî dike ku di qanûnên DYAyê de reformeke mezin di derbareyê koçberîyê de pêk were ku wê rewşa qaçaxan qanûnî bike û di navbera her du welatan de destûrê bide çûn û hatina serbest a karkerên meksîkî; ev çareserîya pirsgirêka sereke ya aborîya wê ye: Bêkarîya ku girêdayî nebûna siyaseteke neteweyî ya pêşxistina pîşesazîyê ye. Vekişîna ji ber ewlekarîyê ya bi sedema êrişên 11ê îlona 2001ê ev proje bin erd kir.

Mîratgirê vê veguherîna hêdî ya ber bi hevgirtineke tam a bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re Felipe Calderón e.

Wî biryar da ku vê hevgirtinê zexmtir bike. Ji bo ku di şerê wî navê "şerê li dijî bazirganîya narkotîka û sûcdarîya birêxistî" lê kirî –bertîlxurîya li welêt bi cih bûyî û kêmbûna beşên gel herduyan xwedî dikin– de bi ser keve, pêdivîya wî bi piştgirîya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê heye: Îstixbarat, guhdarîya telefonan, şerê li dijî paqijkirina pereyên qaçax û hwd. Berî çend salan ne mumkin bû ku mirov lê bifikire, belê îroj dengê rewşenbîrên mîna **Jorge Castañeda** yan jî **Hector Aguilar Camin** li başûrê Rio Bravoyê bilind dibe da ku doza desttêwerdaneke amerîkî li ser erdên meksîkî bikin ku wê di çarçoveya Planeke Colombia ya dubare (11) de pêk were û berdêla wê ji bo welêt jî wê hinekî din jidestdana serxwebûnê be.

Dîsgotineke navdar dibêje "Meksîkaya reben, çiqasî dûrî Xwedê yî, çiqasî nêzî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê yî..."

* Rojnamevan

1 Ilya Prizel di *Latin America through Soviet eyes [Bi çavên Sovyetan Amerîkaya Latîn]* de ji ber girtiye, Cambridge University press, Cambridge, 1990

2 Hevpeyvîna bi nivîskar re, 17ê hezîrana 2010ê. PRI: Partîya Şoreşger a Sazûmanî, di navbera 1929ê û 2000ê de desthilatdar bû

3 Binihêre li Jefferson Morley: *Litempo: The CIA eyes on Tlatelolco [Litempo: CIAyê Çavên Xwe Berdane Tlatelolco]*, National Security Archive Electronic Briefing Book [Pirtûka Brîfînga Elektronîk a Arşîva Ewlekarîya Neteweyî], hejmar 204, 18ê çirîya pêşî ya 2006ê. Dosyayên CIAyê yên ku hatine aşkere kirin îsbat dikin ku Winston Scottê ji 1956ê heta 1968ê şefê buroya CIAyê ya li Meksîkayê, ev plan çêkiriye

4 Nîqaşa 16ê adara 1986ê

5 Kolombîya, Meksîka, Panama, Venezuela

6 Bixwîne nexasim; Anabel Hernandez, *Los Señores del Narco,* Meksîko, Grijalbo, 2010

7 Binihêre: Lorenzo Meyer *Las raíces históricas del nacionalismo petrolero mexicano*, Océano, Meksîko, 2009

8 Bi her halî, ji bo ku cîrana xwe neqeherîne, Meksîka wê tu carî nebe endama Rêxistina Welatên Petrolfiroş (OPEC)

9 Yek ji şêwirmendên sereke yên meksîkî yên şîrketên bakûr-amerîkî li Meksîkoyê bi cih bûye. Di hilbijartinên serokdewletîyê yên 2006ê de, kevneşêwirmendê namzetê serokdewletîyê yê çepê (zapatîst ne di nav de) Andres Manuel López Obrador bû. Hevpeyvîna bi nivîskar re, tîrmeha 2010ê

10 Hevpeyvîna bi nivîskar re, tîrmeha 2010ê

11 Plana Colombia peymaneke dualî ye ku hikûmeta Kolombîyayê bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re mohr kir. Ew destûrê dide 1000 alîkarên dozgerên eskerî yên ji bakûrê Amerîkayê biçin baregeha herî mezin a welêt. Di pratîkê de, alîkarîya amerîkî di esasê xwe de di şerê li dijî Hêzên Çekdarî yên Şoreşger ên Kolombîyayê (FARC) de bi kêrî xurtkirina artêşa kolombî hat

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Cîranek yan devereke dorlêgirtî?

Dema Meksîka tê gotin, êdî mezinahî nayê bîra mirovan: Li gor kovara hefteyî ya lîberal *The Economist*ê, "*di nişîvîyeke pir bi meyil re berjêr tê xwarê*" (10ê tîrmeha 2010ê), li gor *Financial Times*ê civakeke "*li ber têkçûnê*" ye (30ê hezîrana 2010ê), li gor kovara şîlîyî *America Economía* aborîyeke "*dişemite*" ye ku krîzên dêwa bakûrê Amerîkayê ji hemûyên din bêhtir bandor lê kiriye (tebaxa 2010ê).

Li gor lêkolîner James M. Cyper û Raúl Delgado Wise, vebûna aborî ya Meksîkayê piştî dawîya salên 1980yê, kir ku "*makîneya hilberîner a meksîkî were xira kirin da ku li pêdivîyên aborîya amerîkî were anîn* (1)". Bi pêşketina "maquiladoras [deverên pîşesazîya ji bo îxracatê]" (2) re îxracat ji 52 milyar dolarên sala 1993ê gihîşte 291 milyar dolarên 2008ê. Bi her halî, Cypher û Wise kite bi kite rave dikin, *"pîşesazîya maquilas ne ji bo îxracata malên meksîkî ye, lê belê ji bo karkerên erzan ên ku di nav berhema dawîyê de cihê xwe digire"*.

Di pratîkê de, % 77ê malzemeyên destpêkê ji derve tên kirîn û rêjeya nirxê lêzêdekirî ku ji Meksîkayê re dimîne, di navbera % 18.2yê 1988ê û % 8.2yê sala 2003ê de diçe û tê.

Sektora pîşesazîya neteweyî ku mexdûra destjêberdana siyasetên alîkarî û teşwîqa dewletê ye, dihele. Mûçe geh kêm dibin geh zêde (di navbera salên 1994 û 2007ê de bi nirxê rastîn bêhtirî % 24ê), bêkarî pir zêde bû (di navbera 2000ê û 2009ê de % 130ê zêde bû) û refên "bazirganîya narkotîkê" mezin dibin.

Wekî din, krîza malî ya sala 2008ê hê jî bandorê li aborîya welêt dike. Ji ber kêmbûna kiryarî û mesrefkirina li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, li Amerîka Latînî herî zêde zirar li Meksîkayê bû. Hilberîna Brut a Hundir sala 2009ê % 6.7 kêm bû. Mezinbûna aborîya welêt ji 2000ê ve di derdora rêjeya % 1.9ê de bist bûye, beramberî vê, ev rêje li Brezîlyayê % 3.2 ye. Meksîkaya ku dest û lingên wê bi rêya NAFTAyê bi aborîya amerîkî ve girêdayî ne, bi sebr û semax li bendê ye ku ji nû ve aborîya wê zindî bibe. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, her sal hinekî bêhtir îthalatê ji Çînê dikin, di heman demê de ji ber nebûna sermayeguzarîyê, hilberîna petrola meksîkî kêm dibe.

Hikûmeta meksîkî peymanekê li ser koçberîyê bi Washingtonê re acil û lezgîn dibîne da ku bazara kar bi îstîqrar bike û berê mîqdara pereyên koçber dişînin misoger bike, û paşê vê mîqdarê zêde bike, ji ber ku ev mîqdar rêza sêyemîn a ketina dovîzan a li welêt e. Di derbareyê vê mijarê de hesabê Cypher û Wise kirî weha ye, "*heke asta xwendinê ya koçberên meksîkî ya dema gihîştin Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û mesrefa perwerdekirina wan li pergala perwerdehîya dewleta meksîkî*" û her weha *"mesrefa jiyana wan a li Meksîkayê jî li ber çavan were girtin*", di navbera 1994 û 2008ê de, "*Meksîkayê 340 milyar dolar şandine DYAyê, 1.8 caran li pereyên koçberan şandî Meksîkayê zêdetir e*". Ango; bi riya koçberîyê, civaka meksîkî destekê dide aborîya amerîkî.

J. - F. B.

1 *Mexico's economic dilemma. The Developmental failure of neoliberalism [Dudilîya Aborî ya Meksîkayê: Têkçûna di Warê Siyaseta Pêşveçûnê de ya Neolîberalîzmê]*, Rowman & Littlefield Pulishers Inc., Plymouth, 2010

2 Bixwîne; Anne Vigna, "A Tijuana, la mauvaise fortune des 'maquiladoras'" ["Li Tijuanayê, Bextreşîya 'Maquiladorasan'"], *Le Monde diplomatique*, çirîya paşî ya 2009ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## HINDISTAN, BRAZÎL Û AFRÎKAYA BAŞÛR

# Peymana demokratîk li nav hêzên başûr

FRANÇOIS DANGLIN *

**Li kanûna 2010ê, Afrîkaya Başûr talîyê tevlî welatên koma BRICê bû -Brazîl, Rusya, Hindistan û Çîn. Bê guman, xebatên sazîyeke din, IBSA a ku heft sal berê hatibû ava kirin û jixwe Brazîlya, New Delhî û Pretorya di xwe de vedihewandin, ev berfirehî hêsan kir. Hevkarîya Başûr-Başûr zêde dibe.**

Salên 1990ê, heyama danûstandin û guftûgoyên berfireh li ser meydana bazirganîyê, welatên Başûr behre û şîyana xwe ya rêkeftin û karîgerîyê di têkoşîna li dijî lîberalîzasyona ticareta ziraî de nîşan da. Bi taybetî Arjentîn, Çîn, Hindistan, Brezîlya û Afrîkaya Başûr gelek çalak bûn. Sê welatên dawî, anku Hindistan, Brezîlya û Afrîkaya Başûr bi armanca bihêztirkirina desthilata xwe di derdor û danişînên navneteweyî de, biryar girtin ku G-3yekê bi navê IBSA ava bikin (kurteya ji herfên pêşî ên India, Brazil, South Africa).

Ev rêkeftin cara yekem wek komeke wezîran a taybet di hezîrana 2003ê de li Brasîliayê [paytextê Brezîlyayê] civîya, paşê, çirîya pêşîn a heman salê, li rex 58emîn Meclisa giştî ya Neteweyên Yekgirtî, bi beşdarîya serokdewlet û serokên hikûmetên wê demê (Atal Bihari Vajpayee, Luis Inacio Lula da Silva û Thabo Mbeki) bi awayekî resmî hate ragihandin. Armanca bingehîn ew bû ku li Neteweyên Yekgirtî, li Fona Darayî ya Navneteweyî (FDN-IMF) û bi taybetî li Rêxistina Cîhanî ya Ticaretê (RCT) pozîsyon û helwêstên hevbeş werbigirin.

Forûma navbûrî dixwest bibe tovê serkêş ê komeke welatên di geşepêdanê de, ku wek fikir yekem car wezîrê ticaretê yê Afrîkaya Başûr ê hingê Alec Erwin derbirîbû û cext kiribû ku *"Afrîkaya Başûr li cîhaneke globalbûyî û li cîhaneke ku şikil û rengê xwe ji mesafeya herî firehtir a di navbera welatên pêşketî û yên kêmtir pêşketî de digire, li ber xetera îzolebûnê ye"(1)* Mecbûrîyeteke mezin ji bo Pretoriayê [paytextê kargêrî yê Afrîkaya Başûr], lê di heman demê de Çîn, Brezîlya û Hindistanê jî reformên bingehîn didane ber xwe da ku meydana aborîya xwe ji veberhênanên navneteweyî re vekin.

Ev forûma ku derbirîn û laşdarbûna hûrde-layenî [minilatéralisme] nefermî ye –lewre IBSAyê sekreterîyeke daîmî nîne– axirîn guherînên pêwendîyên navneteweyî dixe ber ronahîyê: sazîyên wêdeyî-parzemînan [transcontinentale], kêmkirina akterên wan bi mebesta teqezkirina karîgerîya dîplomatîk-aborî ("hûrde-layenî" [minilatéralisme]), û herwiha vîn û hewla di navbera dewletan de ji bo kûrkirin û karîgerkirina pêwendîyên dulayenî û bi vî rengî di warê ticaretê de telafîkirina sînortengîya rêkeftin û rêxistinên pirlayenî.

Ev ne cara yekem e ku qadeke wiha îdelojîk, erdî, nasnameyî an jî muxalif tê avakirin. Lê belê du taybetmendî hene ku endamên IBSAyê cuda dikin: karakterê wan ê demokratîk û faktora ku ne welatên rojavayî ne. Ne tenê ev sêtik [sê welat] ne di xizmeta hêzeke serdest de ye ku bixwaze di danişînên navneteweyî de berjewendîyên xwe bide pêş, lê herwiha statuya herêmî ya her yek ji endamên xwe bihêz dike û rê li ber pêvajoyên hevkarîyê vedike. Li ser navê nirxên hevbeş, Arjentîn li kêlekê hate hiştin. Pretoriayê hê jî ji bîr nekiribû ku hikûmeta leşkerî ya Arjentînê (1976-1983) pêwendîyên pir nêzîk digel rejîma apartheid hebûn û ne jî pêwendîyên "rexnenekirî" yên rêveberîya Menem (1989-1999) digel Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê hatibûne ji bîr kirin. Lê belê, tê heye ev nirxandin biguhere, û jixwe hinek êdî behsa binecihkirina IMSACê dikin ku hejmareke dewletên din ên Mercosurê [Civata aborî ya welatên Amerîkaya Başûr] digihîne Brezîlyayê.(2)

### Meyla bidestxistina kursîyekî daîmî li Desteya Ewlekarîyê ya NYê

Heçî Komara Gel a Çînê ye, ew jî ji ber rejîma xwe ya siyasî ya otorîter hate veder kirin, herwiha armancên wê yên nihênî yên sûperhêzîyê cihê gumanlêkirinê ne. Lê belê ev neyartîya kerr nabe berbend ji bo rêkeftinan: axirîn civîna bilind a serokên dewlet û hikûmetên IBSAyê 15ê nîsana 2010ê li Brasîliayê, li kêleka civîna BRICê (Brezîlya, Rûsya, Hindistan, Çîn) bi rê ve çû. Jivaneke tam di wextê xwe de, an jî lêknêzîkbûneke xweragir, ku tê heye kombûn û rêkeftineke nû jê bizê?

Ev hîpotez dibe rastî an nabe, ew meseleyeke din e, lê belê her ji niha ve rêkeftinên hevkarîya çarlayenî li nav bircên navneteweyî reng û rûyê xwe aşkere dikin. Di çarçoveya guftûgoyên "klîma"yê de di dema duyemîn konferansa wezîran de komek bi navê BASIC pêk hat (nîsan 2010), ku bi vê pêşhatê çar dewletan karî piştgirîya xwe bo rêkeftina Copenhagueyê ya li ser guherîna klîmayê derbibirin. Ev helwêst e ya ku berdewamîyê dide vê forûmê û wê wek qedemeyeke bingehîn nîşan dide. Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama her ji civîna bala ya Copenhagueyê bi girîngîya wê hesîya, lewma her hingê kete hewla wê yekê ku xwe bo BASICê bide vexwendin, ji ber serwext bûbû ku tenya şansê girêdana rêkeftineke deqeya-dawî, lihevkirina bi endamên wê re bû. Rast e ku BASICê jixwe berê jî raya xwe bi rêya xebatên bisporan dîyar dikir û raportên lidûvçûnê [follow up] ji bo protokola Kyotoyê ya piştî 2012ê amade dikirin (bo nimûne, ji welatên endûstrîyel dixwaze ku rêjeya belavkirina xaza bi tesîra serayê kêm bikin). Ev hevpeymanî rexmî welatên ewropî bihêztir bû, welatên ewropî ji alîyê welatên di geşedanê de têne rexnekirin ku bûne sebeba serneketina civîna cîhanî ya li ser guherîna klîmayê; lê belê hevpeymanî di heman demê de dikare li dijî DYAyê jî helwêst bigire.

Lihevkirina boçûn û stratejîyan rê û resmên xebatê diafirîne û bi vî rengî giranî û dînamîzma IBSAyê bihêz dike. Bêguman ev ne qedemeyeke wêdeyî-hikûmetî ye ku ji 2003yê ve ye radibe û şikil digire, bêtir, herêmparêzîyeke nû [neo-regionalism] ye ku ji hevkarîyên navbera hikûmetan pêk tê (hevdeh komên xebat û dîyalogê yên nedewletî). Bi vî rengî, xwe ji zerarên rêkeftinên pirlayenî diparêzin ku ji ber zêdeyîya akterên xwe zû bi zû şêt dibin.

Dewletên pêkhêner ên IBSAyê dil dikin bibin endamên daîmî yên Konseya Ewleyîyê ya NYê. New Delhi û Brasilia bêfikar û bi aşkerayî vê yekê piştrast dikin. Heçî Pretoria ye, ji wê re zehmet e li her derê bi aşkerayî vê armancê ragihîne, ji ber ku bi biryareke Yekîtîya Afrîkayê ku sala 1997ê li civîna bilind ya Harareyê hatibû pejirandin pabend e û li gor vê biryarê, dihate pêşnîyaz kirin ku Konseya Ewleyîyê were fireh kirin; pênc welatên Afrîkayê tê de cî bigirin û her yek bo çar salan bi wî erkî rabe û mafê wan ê vetoyê jî nebe. Şert û biryarek ku nahêle Afrîkaya Başûr têkeve nav welatên G-4ê, anku berendamên serekî yên bo erkê endametîya daîmî wek Elmanya, Japonya, Brezîlya, Hindistan.

### Ji bo sazûmanên navnetewî yên rewatir û bêhtir temsîlî endamên xwe dikin

Herçend dewletên endamên IBSAyê ji bo NYyê xwedanên heman nîyetan bin jî, mecbûr in ji her awayî wan nîyetên xwe veşêrin. Lewre xeter heye ku gelek welatên din ên ku xwedanên heman armancê ne, pê nerihet bibin, welatên ji Arjentînê heta Endonezyayê, heta Meksîka, Nîjerya, Cezayîr, Misir û heta Pakistanê –jixwe babeta fikarên Çîna endama daîmî ya Konseya Ewleyîyê beramber endametîya Hindistanê têne zanîn.

Vîna her yek ji wan li ser sehneya cîhanî ji bo temsîl û laşdarkirina parzemînê "xwe", berdevkî, ewqas hêsan nîne. Bê guman, her sê jî di çarçoveya herêmên xwe de dêw û zal in û îtibara ku ji hev re dabîn dikin, bêbingeh nîne. Lê belê, tevî xetera derhatina koalîsyoneke "biçûk"an [anku dewletên biçûktir] li dijî hêzeke hegamonîk heta dereceyekê nefsbiçûkîyê dikin da ku neyartîya dewletên din ên di geşepêdanê de nekêşine ser xwe.

Wekî sala 2008ê di civîna bilind ya New Delhîyê de hate berqerar kirin, her sê avakerên IBSAyê tê dixebitin da ku sazîyên cîhanî *"bêtir demokratîk, bêtir temsîlker û rewa bin, bi rengê ku di qonaxên biryargirtinê de dewletên di rêya geşepêdanê de bêtir xwedangotin bin"*. Bi vê mebestê, bi rengekî nîzamî serokdewlet û serokên hikûmetên xwe han didin. Herwiha civînên ku li kêleka Meclisa Giştî ya Neteweyên Yekgirtî an jî forûmên pirlayenî (wek Konseya Mafên Mirovî, OMC, Rêxistina Cîhanî bo Mafên Telîfê, Peymana Antarctiqueyê, Konferansa Avadankirina Filistînê, hwd.) ji warên wan ên çalakîyê ne.

Ev hemû helkeft û munasebet in ji bo baştir hevnaskirin û têkgihiştinê, lê herwiha ji bo destnîşankirina helwêst û pozîsyonên hevbeş, an jî, bi rêya rêkxistina hevkarîyên li beşên cihê peytkirina hevpeymanîyê. Bêguman nasnameyeke "îbsanî" nîne; lê belê danûstandinên navbera hikûmetan, hetta ewên pir biçûk û nedîyar û di warê erkên taybet ên dewletan bi xwe de jî, gelek karîger û kêrhatî bi encam dibin. Piştî civîna şûbata 2004ê li Pretoriayê, wezîrên parastinê karîn li ser bingeha rêkeftina Brezîlya û Afrîkaya Başûr ya 2005ê, biryara pêşxistina nesleki taze yê mîsîlên hewa-hewa [mîsîl/fûzeyên li hewa bo armancên hewayî] bigirin, di gulana 2008ê de li peravên Afrîkaya Başûr û beşdarî di herekatên deryayî yên hevbeş de bikin.

### Afrîkaya Başûr niha weke pireke di navbera Amerîkaya latînî û binparzemînê hindî de tev digere

Endamên IBSAyê herwiha li ser piranîya pirsên navneteweyî yên mezin beyanên siyasî yên hevbeş didin, weku wê beyana çil û pênc xalî ku nîsana 2010ê, di çaremîn civîna bilind a serokdewlet û serokên hikûmetan de hate pejirandin. (3) Ev beyan ji bilî bêçekkirin û bersînorkirina belavbûna nûkleerê, sebaret bi têkoşîna li dijî terorîzmê, hewlên NYê ji bo



GÖKHAN ASLAN: **Lêlata Hevkêşe**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

binecihkirina aştî û aramîyê, li Îran û Afganistanê ye, herwiha sebaret bi tundûtîjîya sîyasî li Guine-Bissauyê, sepandina rêkeftina Ouagadougouyê li ser Komara Guineyê û dîsa vesazkirina nizama qanûnî li Madagascarê ye.

IBSAya ku berî her tiştî sazîyeke siyasî ye, qet nekete ber tesîra guherînên di nav endamên wê de qewimîn. Ne li Hindistanê hatina ser desthelatê ya zorîneyeke nû (anku ketina Atal Bihari Vajpayeeyê rêveberê Bharatîya Janata Party – BJP, nasyonalîstên hindî – û hatina ser kar a Manmohan Singh yê ji Indian National Congressê), ne jî li Afrîkaya Başûr derbasbûna serokdewletîyê ji Thabo Mbeki bo Jacob Zuma, kombûn û rêkeftinên li ser bingehê vîzyoneke hevbeş a jeo-ekonomîyê nexistine ber xeterê. Her sê endamên IBSAyê dil dikin bi rêya peymanên ticarî-herêmî ku di xala XXIV ya GATTê de hatîye dîyarkirin, herêmeke berfireh a pîyaseya-serbest ava bikin. GATT aborîya dewletên Mercosurê heta dewleta jêr-parzemînê hindî û dewletên Yekîtîya Gumrikî ya Afrîkaya Başûrî (SACU) digihîne hev.

Armanc yek e û pir mezin e. Ticareta navbera sê dewletên endam di 2008ê de gihişte 10 milyar dolaran (di heft salan de + %156). Lê belê divê ev zêdeyî bê şîrovekirin: heman salê, bi tenê ticareta Çîn-Brezîlyayê gihişte 43 milyaran. Sebeb ne tenê ew e ku jihevdûrîya dewletan dibe binasê bilindbûna bihayan (%12 nirxê neqlîyatê di navbera Hindistan û Brezîlyayê de, %10 yê veguhastinên di navbera Afrîkaya Başûr û Hindistanê de), belkî îmaja hilberîneran li bal kiryaran zêde erênî û xweşdivî nîne: lewre ji bo brezîlîyan kelîteya malên hindî gelek caran xerab e.

### Forumên karder, jin, parlementeran...

Ji ber vê hindê ye ku di her civîneke bilind de, li rex serokdewlet û serokên hikûmetan, şandeyên girîng ên karsazan jî hene: rêbazek ji bo qanekirina teşebuskaran ku di vê avahîya siyasî de berjewendîyên hemû alîyan hene û tê heye ku hevkarî û danûstandinên mezin ên aborî jê peyda bibin. Barê giran: piranîya rêveberên şirketên sêtikê tu caran navê IBSAyê jî nebihîstine û gelek kes jî bes wek sazîyeke jeo-polîtîk lê dinêrin.

Sala 2007ê li New Delhîyê bi pejirandina planeke kar IBSAyê xwast nîşan bide ku IBSA ne tenê qadeke sembolîk e, komeke taze ya "jêr-emperyalîzm"ê ye, lê meydanek e ji bo dariştina stratejîyên kar û pêdaçûnê û sînerjîya aborî (hevahengîya prosedûrên li gumrik û benderan, daxistina bihayê miamile û hinardeyê…) û teknolojîyê (bernameyên vekolînê li ser tayê, aidsê, bîyokarbûranan, nanoteknolojîyê, deryanasîyê û hwd.). Ev proje hemû ji lêkdana wan di qada medyayê de hewlên guhartina sîmayê navneteweyî yê her yek ji van sê lehengan in.

Komên xebatê yên beşên cuda hatine danan da ku îmkan û ihtimalên hevkarîyên nû bêne vedîtin û tecrûbeyên rêveberîya serkeftî (wek rêveberîyên giştî, çandinî, ticaret û veberhênan, bac, tenduristî, zanist û teknolojî, trafîk, tûrîzm…) bêne par kirin. Her ji niha ve destûr girtine ku dwanzdeh rêkeftinên sêlayenî yên hevkarîyê bipejirînin (di warên firokesazî, bîyokarbûran, enerjîya bayî, xwendina bilind, muadilîyê de) û pênc projeyên din hê di pêvajoya guftûgoyan de ne (bi taybetî projeyên trafîka deryayî ne).

Bi vî halê xwe IBSA dişibe sazîyeke sembolîk ku tê de danûstandinên di navbera herêman de bi kêr tên û herwiha hevkarîyên siberojê bêne dariştin (çandinî, rêveberîya bi rêya Înternetê, enerjîyên vegerok, fonên hevbeş bo lêkolîn û geşepêdanê), herwiha li qada navneteweyî çandeke hevbeş a hevkarî û hevgirtinê durist bibe (foneke alîkarîya mirovî li PNUDê ji bo projeyên li Haîtî, Laos, Burundi, Cap-Vert û li Guine Bissauyê hatibû terxan kirin), lê herwiha dibe sebeb ku danûstandinên di navbera gelan de xurttir bibin. Di vê çarçoveyê de civînên mezin ên karsazan, jinan, parlamenteran, konseyên destûrî û helkeftên çandî hatine han dan.

Herçend IBSA ji her yek ji sê endamên xwe kêmtir berçav û xwedantesîr jî be û halê heyî ne di qonaxeke wisa de be ku wek aktereke navneteweyî ya girîng were hesibandin, rola wê ya sêwana hevbeş bo hejmareke mezin a teşebusan dihêle ku berjewendîyên dewletan bigihin bihêzkirina danûstandinên di navbera civakên sîvîl de. Paradîgmayeke nû ji bo hevkarîya Başûr-Başûr?

Her çend di navbera hikûmetan de munaqeşeyên li ser pêdivîya hevkarîya navneteweyî kêm bin jî, hevpeymanîya hêzên mezin û dabeşbûna sazîyên herêmî dibe sebebê nerihetbûna "biçûk" ên ku cihê wan li ser maseya danûstandinê nîne û nerihetbûna hemû ew alîyên ku li ser kêşeyên dinyayê xwedîyên boçûneke sazûmanî û global in. Lewma, Hindistan û Brezîlya, li rex IBSAyê, xwe wisa nîşan didin ku hê jî digel hemû akterên sehneya Afrîkayê û dewlet û rêkxistinên herêmî (Nepad, SADC, hwd) li dû pêşxistina pêwendîyên baş in. Civînên bilind yên Hindistan-Afrîka (New Delhi, nîsan 2008) an jî Brezîlya-Afrîka (Fortaleza, hezîran 2003; Dîyaloga li ser teqezkirina ewleyîya xurekî, gulan 2010) hemû şahidên vê siyasetê ne, her weku civînên bilind yên Afrîka-Amerîkaya Başûr (Abuja, çirîya paşîn 2006; Merida, çirîya pêşîn 2009) ku serok Lula yek ji rêkxer û serkêşên wê bû. Weku ku serok Mbeki hê sala 1996ê hêvîya xwe ya di vê bareyê de li New Delhîyê ragihandibû, ku Afrîkaya Başûr di navbera Amerîkaya Başûr û jêr-parzemînê hindî de, dibe pire û xêra vê yekê hem digihe prestîja wê ya navneteweyî û hem jî aborîya wê –bi taybetî li benderên Durban û Capê.

Heke îro IBSA dikare pêwendîyên jeo-polîtîk ên nû girêbide, behra pitir bi xêra pozîsyona stratejîk a Afrîkaya Başûr û çalakbûna serok Lula ye. Di maweyê her du dewrên desthilatdarîya xwe de, Lula pênc caran berê xwe da parzemînê reş, serdana bîst welatan kir, her ji sala 2004ê dest avêt birêkxistina guftûgoyên di navbera Mercosur, Misir û Fasê de, û 6ê tebaxa 2010ê, digel serokê Venezuelayê Hugo Chavez, bi dilêrane li Caracasê beşdarî yekemîn civîna wezîrên karûbarên derekî yên Amerîkaya Başûr û Afrîkayê bû.

Sazîyên nû yên navneteweyî wek IBSAyê ne bi xêra yek-du akteran berdewamî û xweragirîyê bi dest dixin. Bi tenê gava ku di çarçoveya cîhanî de xwedan tesîr bin û bo bendewarîyên akterên meydana aborîyê bibin bersiv, dikarin hebûna xwe berdewam bikin. Dîsa derseke din ku divê dewlet jî vê tecrûbeyê wergirin ew e ku her çi dewleteke weset an jî mezin û girîng, heke bixwaze xwe bigihîne amraz û sazîyeke navneteweyî, divê bi stratejîyên taybet û li gor şert û bendên din ên wêdeyî-herêmê, herwiha bi rêya dîplomasîyeke dulayenî ya çalak ber bi wê armanca xwe ve bimeşe.

* Lêkolîner li Institut Choiseulê.

1 Ev axaftin li ber Metal and Engineering Industries Bargaining Council (Desteya bazirganîya pîşesazîyên hesinî û endazyarî, li Johannesbûrgê li 8ê mijdara 2002ê hat kirin

2 Arjantîna, Brazîl, Paraguay, Uruguay, Venezuela.

3 Ev peyman di çileya 2010an de li Gîneyê di dema hilbijartinên serokkomarî de pêk hat

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

# Tenduristî, çandinî û projeyên hevbeş

FOLASHADÉ A. SOULÉ-KOHNDOU *

Ji sê armancên ku IBSAyê ji cerga avabûna xwe ya sala 2003yê dane ber xwe –hevkarî û rêkxistina siyasî li ser kêşeyên navneteweyî, duristkirina komên xebatê û alîkarîya bo welatên li ser rêya geşedanê– ya sêyem bêhtir rê dide nirxandineke konkret. IBSA *Facility Fund for Poverty and Hunger Alleviation* [Fona IBSAyê ji bo Kêmkirina Xizanî û Birçîtîyê], ku sala 2004ê hatiye avakirin, alîkariya darayî dide wan projeyên qeware-biçûk û qeware-navîn ku tê heye di çarçoveya herêmî û derveyî herêmî de derav û delîveyê vekin û bibin nimûne bo *"emelên baş"* (1). Armanc herweha handan û pêşxistina wan teşebusên serkêş e ku ji welatên başûrî tên û hewl didin bi welatên din ên başûrî re pêwendiyan deynin (2). Her yek ji dewletên endam bi qasî 1 milyon dolar pere dide, ku hê jî miqdareke nizm e, herweha ji çavkaniyên derekî jî, wek dewletên din, rêxistinên nehikûmî, weqifên xêran, hwd alîkarî tê.

Dezgeha taybet ji bo hevkarîya başûr-başûr li Programa Neteweyên Yekbûyî ji bo Geşepêdanê (PNYG) hatibû erkdarkirin ku fonan bi rê ve bibe û herweha pêdagirîya îdarî û kiryarî ya projeyên neqandî bike. Gelek girîng e ku ev erkê serperiştiyê ji bo dezgeheke Neteweyên Yekbûyî hatiye spartin, ne ji bo rêxistinên darayî yên wek IMFyê. Ev awayê birêvebirinê –her wekî Banka Başûr (Banco del Sur) ku Arjentîn, Bolîvya, Brezîlya, Ekvador, Paraguay û Venezûelayê bi sermîyaneke destpêkî ya 20 milyar dolar ava kir (3) – dihêle ku li saziyên Bretton Woodsê nealiqin, ku ew sazî berpirsîyarîyên xwe bi cih nayînin. Êdî welatên wek Brezîlya, Hindistan û Afrîkaya Başûr ne mecbûr in mineta IMFyê li xwe bikin bar, ji ber ku ew bi xwe dikarin xelekên alîkarîyê ava bikin.

IBSA piştgirîya darayî dide projeyên warên cihêreng: mînak bi teknîkên pêşketî yên çandiniyê li Gîne Bisawê perwerdekirina cotyaran, li Haîtiyê danîna pergaleke vezivirandina gilêşan, nûkirina du navendên tenduristiyê li Kap Verdê, avakirina avahîyeke din li navendeke tenduristiyê li Kambocyayê, bihêzkirina îmkan û dezgehên heyî ji bo têkoşîna li dijî AIDSê li Burundiyê. Ev tercîhên serfkirina çavkanîyan, gelek caran digel armancên dîplomatîk ên her sê welatên endam hevaheng û sazgar in.

Bi vî rengî, projeya avakirina saloneke werzişê ya 1000 m² li Ramalahê, li Filistînê, ku nêzîkî 1 milyon dolar butçe jê re hatiye terxankirin, projeya herî biha ye ku dezgeha navgotî fon dayê, projeya li Gîne Bisawê digihişte 500 000 dolaran, ya Haîtîyê 550 000 dolaran û ya Kap Verdê 38 000 dolaran. Her wekî Francisco Figueiredo de Souza sekreterê şaxê IBSAyê li wezareta karûbarên derve ya Brezîlyayê diyar dike, ev teşebûs digel hevkarî û rêkeftina siyasî ya sê welatên endam li ser kêşeya îsraîl-filistînê pêwendîdar e û digel vîn û dilxwazîya dewleta Brezîlyayê ye ku wek aktoreke derveyî herêmê di pêvajoya aştîyê di navbera Îsraîl û Filistînê de pişkdar û xwedangotin be (4). Kanûna 2010ê, Brezîlyayê, piştî her du welatên din ên IBSAyê, dewleta Filistînê bi resmî nas kir, lê belê, naskirineke ji wan her du welatên din wêdetir, lewre Brezîlyayê Filistîn bi sînorên wê yên sala 1967ê nas kir.

* Şagirda doktorayê di warê pêwendiyên navneteweyî de li Enstîtuya Lêkolînên Siyasî ya Parîsê û bi CERI-CNRSê ve girêdayî

1 www.ibsatrilateral.org

2 Ji avabûna xwe heta îro, fona IBSAyê di 2006ê de xelata Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Hevkarîya Başûr-Başûr û di îlona 2010ê de xelata Armancên Hezarsalîyê ji bo pêşketinê wergirtin

3 Binihêrin Damin Millet û Eric Toussaint, "Banque du Sud contre Banque mondiale" [Bankaya Başûr li dij Bankaya Cîhanî", *Le Monde Diplomatique*, hezîran, 2007

4 *Emerging Powers: IBSA and the future of South-South Cooperation [Hêzên di Rabûnê de: IBSA û Siberoja Hevkariya Başûr-Başûr],* rapora ji Woodrow Wilson Center, Waşhington, tebax, 2009 - www.wilsoncenter.org

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

# Hevkarîya ji hemû rexan ve

Ji cerga ku di civîna bilind ya Evianê de (hezîrana 2003yê) hate pêşnîyaz kirin ku endamên G8ê (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Japonya, Almanya, Fransa, Brîtanya, Îtalya, Kanada û Rûsya) "dîyalogeke berfirehtir" digel dewletên din (Çîn, Hindistan, Malezya, Cezayîr, Erebistana Suûdî, Misir, Afrîkaya Başûr, Nîjerya, Senegal, Brezîlya, Meksîka) bi rê ve bibin, ji bo nûkirina awayê birêvebirina cîhanê prosedurên şêwra di navbera dewletan her ku çûye komplekstir û fermîtir bûne. Dewletên G8ê û dewletên li ser rêya geşepêdanê, yên ku tûşî krîza aborî bûne, ji bo guftûgokirina kêşeyên dinyayê ketine dû birêkxistina sehne û platformeke munasib.

Dewletên bira yekem danûstandina xwe digel "hêzên mezin ên pêş dikevin" berfireh dikin. Sala 2007ê, pêvajoya bi navê Heiligendamm (G13) têkilîya G8ê bi G5ê re danî û G5 ji welatên Afrîkaya Başûr, Brezîlya, Çîn, Hindistan û Meksîka pêk tê; Hezîrana 2009ê, heynê civîna bilind ya Aquîlayê, G13 bi beşdariya Misirê bû G14.

Heçî dewletên bira duyem in, ew dixwazin xwe rêk bixin da ku cîhana mayî bikare rojekê bi yekdengî biaxive û bibe blokek li hember DYA, Yekîtiya Ewropayê û Japonyayê. Hewlên wan ji bo vedana rêya xwe û bihêzkirina hevkarîya Bakûr-Başûr ji mêj ve dest pê kirine: ji cerga avakirina Tevgera Bêalîyan a 1966ê, li dû konferansa Bandungê ya sala 1955ê, dîsa di sala 1964ê de pêkhatina Koma 77an, avabûna G15ê di sala 1989ê de, G20ê sala 1999ê de (digel guftûgoyên ticarî yên navneteweyî li Uruguayê)… Lê belê bi çerxên guftûgoyên di çarçoveya Rêxistina Cîhanî ya Bazirganîyê (RCB) û bi pêvajoya Dohayê (bi taybetî G33 û G90 sala 2003yê, G110 sala 2005ê) hêz û lezeke taze kete nav van hewlan.

Sala 2003ê, serneketina konferansa RCByê ya li Cancûnaya Meksîkayê –ji ber ku welatên li ser rêya geşepêdanê maseya guftûgoyê terikandibû- bû sedem ku li welatên başûrî siyaseteke kombûn û hevpeymanîyê li dar bikeve, ku awa û aliyên wê siyasetê her diguherin. Herçend çapemenî û hindek rêxistinên nehikûmî (RNH) bîr û qenaetek durist kir ku koalîsyoneke nû ya van dewletan pêk hatiye, zû bi zû aşkere bû ku G20+ (1) dê bi tenê li dor yek armancê wek hevpeymanîyeke navdewletî ya mercî bimîne –azadkirina meydana ticareta zirAî– herweha xuya bû ku li gor guftûgoyên di rojevê de koalîsyon û rêkeftinên din jî dê bihatana durist kirin. IBSA (Hindistan, Brezîlya, Afrîkaya Başûr) û BRIC (Brezîlya, Rûsya, Hindistan, Çîn) nimûne û nîşaneyên vê yekê ne.

F. D.

1 Di roja 20ê tebaxa 2003ê de, komeke 20 welatên di pêşketinê de, bi fersenda civîna wezîrî ya RCBê ya pêncemîn (Cancûn) pêk hat. Ew weke bersiva pêşniyazên ewropî û amerîkî pêşkêş bû. Blok bere bere bi 21 û 22 endaman (G21 - G22) berfireh bû. Hejmara welatên endam hertim diguhere ji ber ku hin welat ji pevajoyê vedikişînin, hinên din jî lê zêde dibin: Arjentîna, Bolîvya, Brezîlya, Çîn, Afrîkaya Başûr, Ekvador, Endonezya, Fîlîpîn, Guatemala, Hindistan, Kuba, Meksîka, Misir, Nîjerîya, Pakistan, Paraguay, Peru, Şîlî, Tanzanya, Tayland, Uruguay, Venezuela, Zîmbabwe

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn



Li 6ê çîleya dawî, Robert Gates wezîrê amerîkî yê parastinê da zanîn ku dê bandora rewşa fînansî ya xedar a neteweyê li ser ref û teçhîzatên artêşê jî çêbibe. Dîsa jî, digel 553 mîlyar dolarên ji bo 2012ê, pêşbîn, budceya leşkerî wê hîn zêde bibe -tevî rîskeke rabûna tansîyonan.

LEŞKERPARÊZÎ LI DIJÎ DESTÛRA BINGEHÎN

# Baregehên amerîkî yên bê sînor

WILLIAM PFAFF *

Serhildanên li Rojhilata Navîn, ku di meha 10an de li Tûnisê dest pê kiribûn, nîşan da ku stratejiya amerîkî ne di cih de bû. Pergala baregehan, di çarçoveya siyasetekê de hatibû avakirin, ku bi tenê ji ber gefên li dij ewlekarîya amerîkî fikaran dike û mebesta wê pergaleke navneteweyî ya li jêr serokatîyeke amerîkî ye. Di dema niha de gef wekî "dewleta eşqîya" (Îran), Çîn yan jî Rûsya ye, ku wekî ku "ji nû ve vedije" tê bi nav kirin. Ev gef li Rojhilata Navîn wekî rêxistinên tundrew ên îslamî (yên wek El Qaîde yan jî ya ku li dû wê tê), rûxandin û piştgirî dayîna serhildanên li dij hikûmetên hevgirên Amerîkayê yan jî rasterast êrişbirina bi ser Amerîka yan jî Îsraîlê de ye. Piranîya van hevgirên Amerîkayê desthilatdarîyên otorîter bûn, lê belê li Washingtonê her kes difikirî ku ev pergala xwezayî ya cîhana erebî ye û heta ku Dewletên Yekgirtî, wekî ku niha li Iraq û Afganistanê hewlê dide ku bike, lê belê ne serkevtî ye, bi xwe demokrasiyê nebe wan deran ev yek nayê guhertin.

Tevgerên gelî yên ereb en demokrasîperwer û ne olî, ku oldar û radîkalên îslamî hema hema qet tê de beşdar nebûn, wekî surprîz derketin holê. Dewletên Yekgirtî li leşkerên xwe mudaxeleyî karên navxweyî yên van welatan bikiriya, ên wekî Misir û Tûnis û heta Bahreyn jî, ku bingeheke hêzên deryayî ya amerîkî lê ye, da ku berevanîya rejîmên hevgirên xwe yên berê bike, ku ev rejîm ji aliyê Washingtonê ve ciddî nedihatin dîtin û van rejîman ji aliyê gelê amerîkî ve yan piştgirîyekê pir kêm didît yan jî tu piştgirî nedidît.

### Ji balyozan bibandortir in

Dema wê hatîye ku pirseke bingehîn were kirin. Gelo ji bo Dewletên Yekgirtî xetayeke kambax bû ku wê ji zêdeyî bi hezaran baregeh û binkeyên leşkerî û qereqolan, pergaleke cîhanî ava kir ku seranser e û jê veger tuneye? Ev pergal ji bo bihêzxistina ewlekarîya neteweyî ya amerîkî hatibû afirandin, lê belê heger vê pergalê bi tahrîkkirina şer û pevçûnan û bi avakirina neewlekarîyeke gelek mezin a neteweyî, ya ku mebesta wê pêşîlêgirtina wê bû, dijberî vê yekê kiribe?

Argumanên herî bibandor ên dijberî pergala bingehên gerdûnî, siyasî û 'amelî ne. Baregehên leşkerî yên DY bûn sedema peydabûna fikar, neyartî û sawa ji ber Dewletên Yekgirtî û wê pergalê li Afxanistan û Iraqê rê li şerên bêwate, nehewce, nekêrhatî û xwetêkbir vekir û niha weha xuya dike ku mudaxeleyên berfireh ên amerîkî vedixwînin Pakistan, Yemen û Qiloça Afrîkayê (2). Êrişên 9/11ê, li gor Osama bin Laden, ji aliyê "kufurbûna" bingehên leşkerî yên DY yên li ser xakên pîroz ên Erebistana Suûdî ve hatibûn pîj kirin. Pergala bingehên gerdûnî, weha xuya ye, ku ber bi afirandin û kûrtirkirina neewlekarîya mezin diçe û da ku xwe biheq derxe, hertim davêje wan.

Leşkerkêşîya gerdûnî ya heyî ya Dewletên Yekgirtî weha dixuye ku ne berhema planeke hişmendî ye, ne jî bi nezanî hatîye çêkirin. Ev leşkerkêşî bi qismî encama xwezayî ya burokrasîya bêkontrolmayî ye. Di dawîya Şerê Cîhanê yê Duyemîn de raya giştî daxwaz kir ku leşkerkêşîya dema şer a Amerîkayê bi lezgînî were ji hev xistin ku çavdêrîya wê encax piştî rûdana *Şerê Sar* hatibû kirin. Mudaxaleya Dewletên Yekgirtî ya bi ser Vîetnamê li Asyaya Başûrê Rojhilat hin berfirehtirbûnên bingehîn anîn, lê belê piştî têkçûna wê ya li Vîetnamê artêşa amerîkî lê hay bû ku li dij berxwedanê êdî tiştekî din dikare were kirin û zûka berê xwe da dîsa-rêkxistin û bernameyeke perwerdehîyê ji bo wê yekê ku hîna jî wekî mîsyona xwe ya sereke didît: seferberîya li Ewropayê li dij dagirkerîyeke pêkan a Sovyetan. Ev yek talîyê di Yekemîn Şerê Kendavê de rê li Blitzkrieg (3) a li dij Iraqê vekir û Amerîkayê li jêr *Doktrîna Powell* şer kir ku ev doktrîn xwedî piştgirîyeke berfireh û hêzeke qewî bû û li ser armanca xwe nîskokhatî bû û bi vekişîneke ji nişka ve bi dawî hat.

Leşkerkêşîya gerdûnî û biheqderxistina wê ya fikrî ji bo bi-xwe-ewlebûna artêşê fenomen in, ku careke din hatin bi dest xistin. Di dumahîya salên Clinton de heta şerê li Yugoslavyaya berê, Dewletên Yekgirtî xwe ji mudaxeleyên leşkerî yên derveyî welêt bi dûr xist. Pentagonê ji derfeta berfirehtirkirina rola xwe û dagîrkirina qada burokratîk û herweha ji dagîrkirina baregeha sereke ya li Balkanan, li Kosovayê sûd wergirt.

Wekî ku Dana Priest di pirtûka xwe ya bi navê *The Mission* (4) de dinivîse, berfirehtirkirina baregehên gerdûnî bêyî ku bi gelemperî bala çapemenî û raya giştî were kişandin pêk hat. Dema ku dezgehên dîplomatîk û CIA [Dezgeha Navendî ya Îstîxbaratê], ku ji wan re hindik pere dihat terxan kirin, di wan rewşên navneteweyî de, wekî neasayî dixuyan, bersivên neafirînêr û nemunasîb didan, artêşa ku bi domdarî baş dihat fînanse kirin, hertim li ber destê serok bûn. Çareserîyên leşkerî yên pêşnîyarkirî erênî, bilez û yekalî bûn û hêzên çekdar amade bûn ku fermanan bêyî ku nîqaş bikin bi cih bînin. Bi vî awayî wan xeyala hêza amerîkî û serokatîya cîhanê him ji raya netewî û him ji ya navneteweyî re ragihand.

Vê yekê, bi awayekî mantiqî, rista artêşê di siyaseta derve ya DY de bihêztir kir. Bi Serfermandarîya Navendî ya li Tampa, Florîdayê ji bo belayên li Rojhilata Navîn berpirsîyarîya leşkerî hatibû dayîn, ku wê demê ji aliyê General Anthony Zinni yê azwer û xwedîyê hêza îqnakirinê, dihat bi rê ve birin. Ev bû destpêk ku ji bo deverên din ên cîhanê pergala fermandarîyên herêmî were ava kirin, ku xwedî fermandarên ferekesî, personelên plankirinê û qabilîyeta hareketê bûn. Bi vî awayî walîyên leşkerî yên DY peyda bûn, wekî Serfermanderên ("CinCs") herêmî yên baş fînansekirî û serbixwe hêzdar, ku li herêmên destûrmendîya xwe de rasterast bi karbidestên siyasî û herweha bi yên leşkerî têkildar dibûn. Ev kes paşê di demeke kurt de ji balyozên DY zêdetir bûn xwedî bandor.

Bi hatina birêveberîya George W. Bush re, Donald Rumsfeld li hember çanda leşkerî ya DY rawestîya; biryardar bû ku "kontrola sivîl a li ser artêşê" ji burokrasîya Pentagonê rizgar bike, ku wî ev burokrasî wekî firehbûneke nepixî û bêbandorîyeke qirase didît. Wî herweha neyarên din ên navxweyî yên li dij pergala xwe ya nû jî dîtin: çavdêrîya kongresê û dadgehê ya li ser hêza birêveber [hikûmetê].

Ji alîyê DY ve sala 2001ê bi yekîneyên operasyonên taybet û hêzên asmanî yên di warê teknolojîyê de pêşketî û bi piştgirîya Hevgirtina Bakûrî, ku tajîk tê de dîyarker bûn, dagîrkirina Afxanistanê, pêşkeşkirina wî tiştî bû ku Rumsfeld wekî dahatûya seferberîyê tesewir dikir. Rumsfeld ew wêneya navdar hertim li nivîsgeha xwe hişt, ku tê de efserekî Hêzên Taybet ên DY bi bayê brûskê hespê xwe dibezîne û mumkin e ku ji bo serkeftineke li hember Talîban rê nîşan dida êrişên asmanî yên B-52 û hevkarên xwe yên herêmî. Alozîya piştî dagîrkirina Iraqê, ku li dû "şok û sawa" serkeftî ya bi destxistina Bexdayê rû da, welat û ji nû ve avakirina welêt bi giştî di destên Wezareta Berevanîyê de hat hiştin. Dawîya dawî, versîyona klasîk a çalakîyên dij-berxwedanê yên General David Petraeus, digel alîkarîya darayî ji bo eşîran da ku li dij berxwedanê şer bikin û "herikandina" yekîneyan a sala 2007ê, şert û merc hatin amadekirin ku di adara 2010ê de hilbijartinên neteweyî pêk werin. Hikûmeteke seqemgîr hîna jî nehatiye ava kirin. Bernameya Petraeus a dij-berxwedanê niha, bêyî ku serkeftineke wê ya berbiçav hebe, li Afxanistanê tê sepandin.

Pergala baregehên gerdûnî ji bo parastina berjewendîyên serwextî yên derveyî welêt ên DY û ji bo pêkanîna mudaxeleyên gerdûnî (yan jî ya rast heger were xwestin şerekî cîhanî bide dest pê kirin) hatibû damezirandin. Bi vê pergalê re armanc pêşîlêgirtina şer e, lê belê pergalê, ji destpêkê ve, rêbaz, derfet û cesaret da mudaxeleyên leşkerî yên DY yên li welatên bîyanî.

Di dawîya sala 1993ê de Samuel Huntington di kovara *Foreign Affairs* de nivîsî ku "şerê cîhanî yê ku di dorê de ye" dê nebe pevçûna dewletan lê belê ya şaristanîyan û bala raya giştî ya navneteweyî kişand.(5) Mînaka ku wî bi awayekî spekulatîf dida, ji bo desthilatdarîya gerdûnî şerek di navbera Rojava û şaristanîyên îslamî de bû. Wî herweha digot ku çînî (Şaristanîya Konfuçyûsî) dê bibin alîgir û hevgirên ereban.

Gumana wî hat peyîtandin ku xelet e –her wekî argumena wekî ya wî ya 2001ê ya Serok George W. Bush ku digot nefreta li dij azadîyên rojavayî bûye egera tundrewên (ekstremîstên) îslamî. Di rastîyê de, berzbûna tundrewî û piştgirîya zêde ji bo paşdeanîna Şerî´etê, bi şiroveya wê ya hişk a doktrînên Qur'anê, berhema krîzeke xeternak a nav Îslamê bi xwe ye. Mebestên tevgera îslamî pakkirina çalakîyên muslimanan û nehiştina bandora rojavayî ye– ne dagirkirina Rojavayê ye.

El Qaîde berhema komeke faktoran e: vejîna ramana tundrew a îslamî di sedsala 20ê de, di hewldanên avakirina "Neteweyeke Yekgirtî ya Ereb" a serkeftî de biserneketina dewletên ereban û wekî encama wê parvekirina emperyalîst a rojhilata Deryaya Spî ya di navbera Împaratorîya Brîtanya û Fransayê de û herweha parçebûna Filîstînê û avabûna Îsraîlê. Siyaseta DY ya piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Erebistana Suûdî û Îran kirin mişterîyên DY û hêsan didît ku Îslam şêwazeke paşdemayî [mîada xwe tije kirî] ya jîyanê ye û qedera wê ye ku versîyoneke nûjenîyê, ku niha li Rojavayê heye, şûna wê bigire. Ev yek xwe li ser wê ferzkirina tewş dispêre ya ku dibêje hemû şaristanî ber bi soxîneke hevpar ve diçin û Dewletên Yekgirtî û hevgirên wê di vê pêvajoyê de ên herî pêşketî ne.

Weha tê ferz kirin; ji ber ku zanist û teknolojî weha pêş ve diçin, çand û pergalên polîtîk jî weha dikin. Lê belê Romaya xav bi buhaya şaristanîya berz a yûnanî bilind bû û çandên Misir, Mezopotamya û Persî berî yên wan her duyan dihatin. Încîl bû ku têgiha dîrokê wekî pêvajoya pêşveçûnê bi nav dikir, ku ber bi encamên rizgarker ve diçe û her tiştê ku berî wê hatîye watedar dike.

Vê yekê bingeha mîllenaryanîzma (6) sekuler avêt, ku di dumahî û piştî Serdema Ronakîyê de pêş de çû. Talîyê tevgerên totalîter ên mîllenaryanên nûjen ên wekî Marksîzm-Lenînîzm û Sosyalîzma Neteweyî jî lê zêde bûn. Utopîzmayeke siyasî, ku ji kokeke wekî wê dihat, li siyaseta derve ya DY hukim kir, nemaze ji dema Woodrow Wilson û pê ve, lê belê ev yek dawîya dawî ji muhafazakarîya kalvînîst peyda dibe, ku ew jî ya Hecîyên amerîkî ye. – nihêrîna ku dibêje *Komeleya Rizgarkirî ya Xwedê* li ser dunyayê ava dibe û ev têgihek e ku îro li cem hin alîyên siyasî yên amerîkî û oldarên protestan hebûna xwe berdewam dike.

Bawerîya ku dibêje qedera Amerîkayê ye ku demokrasîyê bîne dunyayê û ew yek "karê Amerîkayê ye ku dunyayê biguherîne û herweha xeyala wê ye jî" (Wekî ku Condoleezza Rice du salan berê di *Foreign Affairs* de nivîsîbû) bi awayekî qismî ji zêdebûna neasayî ya bandora leşkerî ya li ser hikûmeta DY û ji çanda polîtîk a welêt berpirsîyar e.

Dîrokzan Andrew Bacevich niqaş dike ku qurretî (serbilindîya zêde) digel pêşketina mîlîtarîzmeke nû ya amerîkî hatiye. Di dema Şerê Sar de bîrdozîya siyasî ya amerîkî bû hestîyar û teqlîdeke basît a şêwaza Lênînîst a Marksîzmê, ku wê demê Dewletên Yekgirtî li dijî wê şer dikir. Vê bîrdozîyê weha ferz dikir ku nîyetên baş û îdealên demokratîk ên Washingtonê bi giştî bûn, lê li derveyî bloka komunîst bi awayekî gerdûnî dihatin pejirandin.

Bacevich dinivîse ku di destpêka Şerê Vîetnamê de, "Amerîkî pê îqna bûbûn ku nêzîkbûna herî baş a ewlekarî û rizgarîyê bi şûr [mumkin bû]". Ew herweha dibêje ku amerîkîyan weha bawer dikir ku "Dinyaya ku ew tê de dijîn îro ji her demê bêhtir xeternak e û divê ew hewldanên wan werin xurttir kirin" û wan ev yek "wekî peywirekê qebûl kir."(7) Wekî encama vê yekê, fikira belavkirina hêzan bi awayekî gerdûnî veguherî "çalakîyeke asayî, merceke normal, ku alternatîfên din ên maqûl jê re tunebûn." Dewletên Yekgirtî îro taybetmendîyên dewleteke klasîk a mîlitarîst, nîşan dide; xwedî civakek e, ku tê de daxwazên leşkerî û ewlekarîya navxweyî esasî ne û nihêrîna wê ya siyasî bi wan gefên mezin obsesîv e, ku hîna pêk nehatine.

Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê her ku diçe vediguhere serokekî bi niyeta baş ku aktorên bîyanî yên siyasî hêzdartir dike ku der û dora wan pir caran îspat dibin ku ne durustin û -bi qewla alîkarê berê yê serok Dick Cheney- ji xwe re "pêştirîyên dîn" peyda dikin. Bi xweşbînîyeke bêesil û bi awayekî misoger hat ragihandin ku Iraq demokrasîyek e, ku wê DY di sala 2011ê de hemû yekîneyên xwe yên bi unîforma jê vekişîne. Her ku pê diçe, di meseleya Afxanistanê de jî weha xuya dike ku vekişîn hişê rêveberîya Obama meşxul dike, lê belê di heman demê de Pentagon li Afxanistanê baregeheke "mayînde" ava dike da ku wekî navendeke amerîkî ji bo hêza stratejîk a li herêmê xizmetê bike. Lê belê Talîbanê dîyar kir ku vekişîneke bi giştî ya hêzên amerîkî û NATOyê, şertê bingehîn ê hemû lihevhatinên aştîyê ye. Ev yek aşkere ye ku wê di warê biryarên dahatû yên siyasetê birêveberîya Obama de mijareke navendî be. Guman e ku ne tenê Pentagon dê li dij vekişînê derkeve (ji ber ku nîşaneya têkçûnê ye) lê her weha muxalefeta komarperwer û populîstên nav welêt ên li dij Serok Barack Obama jî. Pergala heyî ya baregehên gerdûnî aşkere ye ku li hember hemû lihevhatinên li herêmê astenga bingehîn e.

Dewletên Yekgirtî ku niha xwedî hêzên leşkerî yên ji hemû raqîb û hevgirên xwe mezintir e, veguherîbû neteweyeke weha, ku dilê wê ji artêşên mayînde dixelîya. Danezana Mafên Mirovan a DY, ku li ser destûra sala 1787ê hatibû zêde kirin, digot "Her çend hêzên çekdar ên başbirêvebirî ji bo ewlekarîya dewleteke serbixwe hewce ne jî mafên kesan ji bo hilgirtin û bi xwe re gerandina çekan nabe ku were bin pê kirin." Lê belê heta Xala I a Beşa 8emîn a Destûrê qala artêşeke federal nehatiye kirin. Paragrafeke têkildar, bi awayekî giştî, dibêje ku Kongres xwedîya wê destûrmendîyê ye ku "artêşan mezintir bike û piştgirîyê bide wan, lê belê tu terxankirina pere ji bo wê bikaranînê nabe ku ji bo maweyke zêdeyî du salan be." Paragrafeke din ku di heman beşê de ye ji bo mobîlîzekirina hêzên çekdar ên dewletê da ku "Qanûnên Yekîtîyê bisepîne, serhildanan bitepisîne û dagîrkerîyê biqewirîne" guncan dike, lê belê destûra leşkerdayînê ji dewletên [yekîtîyê] re hatiye hiştin û divê leşker ji alîyê dewletan ve "li gorî dîsîplîna ku ji alîyê Kongresê ve hatîye danîn" werin perwerde kirin. Beşa II a Destûrê, ku sebaret bi hêza birêveber e [hikûmet], dibêje divê bi tenê Serok "bibe Serfermandarê Artêş û Sîtol [hêzên deryayî] û hêzên çekdar ên dewletan, heger ku ji bo xizmeta fî'îlî ya Dewletên Yekgirtî bang li wan hatibe kirin."

Raya giştî ya amerîkî heta naverasta sedsala bîstemîn dijberî artêşên mayînde bû. Di rûdana Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, artêşa DY ji 175 000 neferên profesyonel pêk dihat. Terhîskirina lezgîn a piştî şer ji ber rûdana Şerê Sar hat giran kirin û piştî wê jî artêşa DY heta piştî Şerê Vîetnamê wekî xizmeta mecbûrî ma. (ku li Amerîkayê di demsala aştîyê de mînakeke weha tunebû) Ji ber vê yekê xizmetên artêşa DY wekî artêşa hevwelatîyan ma, heyeta efseran him jî hêmanên xwedî bandor û hejmareke zêde ya efserên yêdek ên mobîlîze û him jî ji efserên nûhatî yên artêşa xizmeta mecbûrî pêk dihat.

### Vê artêşê neteweyek Ji xwe re qezenc kir

Encama herî girîng a pêkanîna artêşeke profesyonel, ji dêlva artêşa

hevwelatîyan, ew e ku navgîneke hêza neteweyî hat afirandin, ku êdî rasterast li hember gel berpirsîyar nîne [hesab nade gel]. Ji ber vê yekê artêşeke profesyonel heye –ku bi qasî hejmara leşkeran sivîlên bi pere lê hatine zêde kirin– ku rasterast li hember Pentagonê berpirsîyar e û xizmeta "tesîsên sanayîya leşkerî" dikin ya ku Dwight Eisenhower (8) bi dehan sal berî niha li dij bandora wan hişyarî dabû. Sanayîyên Berevanî û Ewlekarîyê îro hêmanên herî girîng ên aborîya hilberîner a DY ne û berjewendîyên wan ên hevbeş niha di wê rewşê de ye ku bandorê li Kongresê û herweha li birêveberîyên bêtecrube dikin. Bêyî ku mubalexeyeke serreçûyî hebe, mirov dikare bibêje ku Dewletên Yekgirtî îro, wekî ku berê ji bo Prûsyayê dihat gotin, dewletek e ku xwedîya wê artêşa wê bi xwe ye.

Di navbera destpêka Şerê Sar a li Ewropayê û şerê niha yê li Afxanistanê de serdemek derbas bû ku tê de Şerê Koreyê, Şerê Vîetnamê û dagirkirina Kamboçyayê; mudaxeleyên DY yên li Lubnan, Grenada, Panama, Komara Domînîk, El Salvador (nerasterast), Somalî (bi hevkarîya UN ku piştî wê sponsorîya dagîrkirina Somalî ya ji alîyê Etîopyayê kir) û du caran dagirkirina Iraqê û carekê jî dagirkirina Afxanistanê hebûn, ku ji bilî Şerê Kendavê yek jî heq nake ku wekî serkeftinekê were bi nav kirin.

Di nav sînorên xwe de Dewletên Yekgirtî li hember têkçûneke kelepûrî zexm e, dikare bidebire; lê belê heger leşkerên wê bo cihekî din hatibin şandin, ev yek nikare were gotin. Pêkan nîne ku ewlekarîya DY di siyaseta derve ya nemudaxalekar de were dîtin; hatiye dîyar kirin da ku bêyî ku baregehên leşkerî li pey xwe bihêle, vekişîneke lihevkirî ya ji Afxanistan û Iraqê pêk bîne, û di meseleyên xelkên din de dev ji siyaseta mudaxaleya leşkerî berde û bihêle ku ew çareyên pirsgirêkên xwe bi xwe peyda bikin. Guherîneke weha tûj a siyaseta îro û a nêzîk a DY, him li welêt him jî li derveyî welêt, bêyî berdelên giran ên polîtîk, ne guncan e. Dîsa jî ji bo çîna siyasetmedar û serokatîya Dewletên Yekgirtî dem hatiye ku berê neteweya xwe biguherînin.

© Mafçap 2010 a William Pfaff.
Hemû maf parastî ne. Ev gotar versîyona hinek guhertî û rojanekirî ya gotara bi navê *"Manufacturing Insecurity, How Militarism Endangers America,"[Hilberîna Neewlekarîyê, Mîlîtarîzm Amerîkayê Çawa Dixe bin Xeteran]* e ku cara pêşîn di kovara *Foreign Affairs* de hatiye weşandin. (New York, çirîya pêşîn/paşîn 2010)

* Nivîskarê pirtûka bi navê The Irony of Manifest Destiny, The Tragedy of America's Foreign Policy (Îronîya Çarenûsa Aşkere (•), Trajedîya Siyaseta Derve ya Amerîkî) ku di sala 2010ê de ji alîyê Walker Books ve li New Yorkê hatîye weşandin. Birêz Pfaff wekî din gotarnivîsê taybet ê rojnameya The International Herald Tribune û tevkarê The New York Review of Books (Rexnegirê Pirtûkan a New Yorkê) û her weha yê weşanên amerîkî û ewropî ye.

• Andrew J. Bacevich, The New American Militarism: How Americans Are Seduced by War, Oxford University Press, NewYork, 2005

1 Jêrenota Wergêr: Têgiha "Çarenûsa Aşkere" an ku Manifest Destiny bawerîya sedsala 19emîn e ya ku digot çarenûsa Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê ye ku li seranserî parzemîna Amerîkaya Bakûr (Ji Atlantîkê heta Pasîfîkê) belav bibe. Ev têgih cara pêşîn di tîrmeha 1845ê de ji alîyê John L. O'Sullivan ve di kovara *United States Magazine and Democratic Review* de hatiye bi kar anîn. Her weha di salên 1840ê de ji alîyê demokratan ve ji bo biheq nîşandana şerê li dijî Meksîkayê jî hatiye bi kar anîn

2 Jêrenota Wergêr: Qiloça Afrîkayê herêmek e li bakûrê rojhilat a Afrîkayê û ji van welatan pêk tê: Erîtrea, Cîbûtî, Etîopya û Somalî

3 Jêrenota Wergêr: Blitzkrieg: Têgiheke almanî ye ku tê wateya Şerê Birûskî anku êrişa ji nişka ve

4 The Mission (Mîsyon, Peywir) Norton, New York, 2004. The Mission. Waging War and Keeping Peace with America's Military

5 "The Clash of Civilizations?", ForeignAffairs, Tampa, été 1993

6 Jêrenota Wergêr: Millenarianism (Hezarsalgerî) Bawerîya kom an jî tevgereke olî, civakî yan siyasî ye ku dibêje di demeke nêzîk de civak dê bi awayekî berbiçav were guhertin ku paşê tu tişt dê wekî xwe nemîne û wê serdemeke nû dest pê bike. Bingeha vê bawerîyê digihîje Eskatalogyaya Mesîhîyan (zanîna li ser roja qîyametê) ya ku li benda vegera Îsa Mesîh e da ku Qralîyeta Xwedê ava bike. Li gor vê bawerîyê ev deshilatdarî dê hezar salan dom bike. Lewma navê hezarsal (mîllenyûm) lê tê kirin

7 Andrew J. Bacevich, The New American Militarism: How Americans Are Seduced by War, Oxford University Press, NewYork, 2005

8 Jêrenota Wergêr: Dwight Eisenhower, generalekî 5-stêrkî bû û paşê ji komarxwazan wekî 34emîn Serokê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê hat hilbijartin. Di navbera salên 1953-1961ê de ji bo du serdeman serokatî kiriye

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

# Perwerde, ji bo berfirehkirina bîmeya civakî hêmaneke serekî

THIERRY WEISHAUPT *

Însîyatîfa Neteweyên Yekgirtî bo bingeheke cîhanî ya bîmeya civakî [bîme: sîgorte, parastina civakî], ku nîsana 2009ê hate pesend kirin û ku çaverê ye li serkeftina "Armancên hezarsalê" tesîreke erênî bike, di warê bîmeya civakî de giringîyeke taybet dide perwerdekirina xelkan. Ji ber ku tecrubeyên heyî nîşan didin ku tesîr û karîgerîya rastî ya amraz û tedbîrên bîmeyê dimîne ser hewlên hişyarkirin û agahdarkirina gel: Bi tenê naskirina mafan têrê nake. Em dizanin, kesên ku herî zêde pêdivîya wan bi alîkarîya rêveberîyên herêmî heye, ew kes in yên ku ji herkesî kêmtir rê û derfetên wan ên agahîwergirtinê hene, hetta li welatên pêşketî jî rewş her wisa ye. Herwiha, ji bo kesên ku berdêla wê zerar û ziyanên demdirêj jî bin mecbûr in pêdivîyên acîl li pêş bigirin, dibe ku bîme wek luksekê bimîne, an jî wek mesrefekê ye ku tesîra wê ya li ser jîyana xwe ya rojane nabînin.

Li alîyê din, dibe ku ji bo xelkên îzolekirî û di nav şertên xerab de dijîn, zehmet be ku rabin herin ji bo vekirina dergehê mafê îstifadekirina ji xizmeteke wiha daxwazeke resmî bikin. Bi taybetî ji bo wan ên ku ji rewşa xwe şermê dikin ev pêngaveke gelek aloz û sext e. Dawîya dawî, alozîya hindek proseduran jî dîsa zerarê dide baş bikaranîna vî mafî û dibe sebeb ku hevgirtina neteweyî teorîk û nekarîger bimîne. Ji ber van sebeban hemûyan, pêdaçûna li ser perwerde, hişyarkirin û sadekirina prosedurê xwedan giringîyeke bingehî ye. Li welatên wek Brezîlya an jî Uruguayê, ji bo siyaseta berbelavkirina parastina civakî, budceyên taybet hatine terxan kirin. Stratejî hatine darîştin da ku agahîyên pêwîst bigihîne ber bala gel. Li Uruguayê bernameyên komputerî li ser komputeran hatine danîn û ew komputer jî bêpere xistine bin teserufa zarokan da ku zarok bi vî rengî bo malbatên xwe bibine pira veguhastina agahîyan.

Wek planeke demdirêj, ya girîng ew e ku "kultura parastina civakî" ya rasteqîne bê durist kirin, li welatên ku xwedîyên gelek tecrûbeyan in di vî warî de divê ew kultur were veguhastin û nû kirin. Li welatên mîna Fransayê, nifşên nû gelek caran piştguh dikin ka çima bingehekî hevbeş û yeksan ê bîmeya nexweşîyê, kêmendamîyê, pîrîyê, malbatê heye. Bi gotineke berfirehtir, gava mirov fikra wan reformên pir berfireh dike ku halê heyî li Ewropayê têne guftûgo kirin, ew pirs xwe dadisepîne: Divê çi û çawa bikin ku tevahîya xelkî bikare beşdarîyê di wan munaqeşeyan de bike ku pêwendîdarî çawanîya jîyana wan û parastina avrû û paşeroja wan e? Têxistina perwerdeya parastina civakî di beşên xwendinê de, ji seretayî heta xwendina bilind, pêşanîyeke giring e.

Diyar e behra pitir a welatên Amerîkaya Latîn bi vê yekê hesiyane, lewre hewlên wan ên di vî warî de nimûneyî ne. Jixwe me'naya "Beyana Guetamala"yê ew e, ku ew beyan li bal Konferansa nav welatên Amerîkayê bo ewleyîya civakî (CESS) û bi alîkarîya Yekîtîya Navneteweyî bo Ewleyîya Civakî (AISS) û Rêxistina Navneteweyî bo Ewleyîya Civakî (OISS) hate qebûl kirin. Navenda Welatên Amerîkayî bo Lêkolînên li ser Ewleyîya Civakî (CIESS), ku baregeha wê li Meksîkayê ye, hate dest nîşan kirin ku li gor nirx û prensîbên ewleyîya civakî, ji bo pêşxistina "bernameyeke tekmîl a perwerdeyê" çalakîyan bi rê ve bibe. Ji ber ku di gihandina bisporan û cîbicîkirina prosedurên îdarî de kêmasîyên berçav hebûn, beyana navbihurî daxwazê ji hemû dewletên endam dike ku, wek "hefteya ewleyîya civakî", ku her sal meha nîsanê tê bi rê ve birin, çalakîyên balkêş li dar xin.

Tora Perwerde û Hevgirtinê (1) xwe sparte tecrube û bizavên bihêz ên Amerîkaya Latîn û biryar da ku berî her tiştî bal û hêza xwe bide ser duristkirina bingeh û materyelên ji bo perwerdeya parastina civakî. Bi vî rengî, dixwaze ji bo darîştin û bikaranîna stratejîyên kêrhatî, amraz û argumanan bide ber teserufa perwerdekarên li her derê dinyayê û rêxistinên wan. Ev proje dê bi destê komeke bisporên navneteweyî bê sepandin û saziyên wek *Internationale de l'Education* [Înternasyonala Perwerdeyê], BIT, CIESS û ajansên Neteweyên Yekgirtî yên şirîkên Însîyatîfa Berfirehkirina Parastina Civakî jî tê de pişkdar in.

* Nûnerê giştî yê Réseau éducation et solidarité (Tora Perwerde û Hevgirtinê).

1 Damezirênerên torê ev in: Internationale de l'éducation (IE, ku sendîkayên ji 172 welatan bi xwe ve digire ku nûnertîya zêdetir ji 30 milyon kesan dikin), Yekîtîya Navneteweyî ya Bîmeyê Tenduristîyê (AIM, federasyonên şirket û sazîyên sîgorteyê yên 26 welatan digihîne ba hev ku hemû pêkve teqabûlî sîgorteya 170 milyon kesan dikin) û Bîmeya Giştî ya Perwerdeya Neteweyî (MGEN) ku tenduristîya zêdetir ji 3,3 milyon kesan bîme dike

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn



GÖKHAN ASLAN: **Hîçî**, Zift li ser tûwalê, 100 x 150 cm

**Rejîma Belgradê di salên 1990ê de pir zordarî li Kosovaya ku piranîya şênîyên wê alban (arnawid) in, kiribû. Lîga Demokratîk a Kosovayê (LDK) ya Îbrahim Rugova berxwedana siyasî û dûrî şidetê bi gewde dike. Li alîyê din Artêşa Rizgarîya Kosovayê (UCK) ji destpêka 1998ê û pê ve çalakîyên xwe yên gerîlayî belav dikirin.**

**Ji adarê heta hezîrana 1999ê Rêxistina Peymana Bakûrê Atlantîkê (NATO) Yugoslavya (hingê Sirbistan û Montenegro bû) bombe dikir. Hêzên sirbî li derdora 800 000 alban (arnawid) kirin der, ew jî ji sînor bihurîn û derbasî Albanya, Makedonya û Montenegroyê bûn. Behsa deh hezar kuştîyan tê kirin.**

**Sirb 10ê hezîranê ji Kosovayê vekişiyan, hêza navneteweyî ya ku Neteweyên Yekbûyî nûnerîya wê dike KFORê erk girte ser xwe, welat kete bin birêveberîya Mîsyona Navbeynkar a Neteweyên Yekbûyî (UNMIK). Xelkê ne alban (sirb û roman û hwd.) ji welat hatin derxistin, li alîyê din LDK û kevnegerîlayên UCKyê hevrikîya hev dikin – UCKyê dezgeheke siyasî ango Partîya Demokratîk a Kosovayê (PDK) damezirand û Haşîm Thaçî bû birêveberê wê.**

**17ê sibata 2008ê Kosovayê serxwebûna xwe ragihand; Sirbistan wê red dike, di qada navneteweyî de qismî tê qebûl kirin.**

### VEGERA LI SER TAWANÊN MEZIN

# "Şerê qirêj" ê UCKyê li Kosovayê

Dwanzdeh salên piştî şerê ku eyaleta sirbî ya bi piranîya albanî ber bi riya serxwebûnê ve anî, anket û şahidî pêkutîyên ku endamên Artêşa Rizgarkirina Kosovayê (UCK) kirin, diyar dikin. Qurbanên van pêkutîyan hem li nav sîvîlên sirbî, hem jî li nav reqîbên siyasî yên UCKê hene.

JEAN-ARNAULT DÉRENS *

Eskerên Hêza Parastina Aştîyê li Kosovayê (KFOR) ango mîsyona NATOyê ya li Kosovayê 27ê çirîya pêşî ya 1999ê ketin welêt. Kosova ji hezîrana heman salê ve di bin birêveberîya demî ya Neteweyên Yekbûyî de bû. Gelek mehan piştî vê yekê, mamosteyekî 50 salî **Budimir Baljošević** bi çar hevalên xwe re hewl da ji "gettoya" sirbên Orahovac/Rahovëcê (1) lê hatine kom kirin, bireve. Di hemberî serê şexs 1200 markan (600 euro) de romanekî bajêr **Agron N**. pêşniyarî wan kiribû ku wan bi maşîna xwe bibe bajarê Rožaje yê li Montenegroyê. Sedemên girîng ên N. hebûn ku buhayekî hewqasî giran diyar bike: wî li dezgeha di bin kontrola NATOyê de Mufrezeya Paraztina Kosovayê (TMK) kar dikir; erka TMKyê misogerkirina *"ji nû ve vegera nav civakê"* ya kevne gerîlayên Artêşa Rizgarîya Kosovayê (UCK) bû. N. berê biserketî çar caran sirbên Orahovacê "derxistibûn". Vî dîwarlêkerî ji bo TMKyê baregeheke nû li bajarê cîran Djakovica/Gjakovë çêdikir û tam li vê deverê pênc sirb bêyî ku şopekê jî li dûv xwe bihêlin, bê ser û şûn winda dibin.

N. yê ku ew bixwe jî tercîh dike bireve û gelek mehan li bajarê Sirbistanê Novi Pazarê "ji bo ewlekarîyê" bimîne, bûyerê weha rave dike: "*Ez sekinîm da ku bûrayê xwe bînim, ku diviyabû bi karwanê me re bida rê. Min sirb di maşînê de hiştin. Dema ez ji mala bûrayê xwe derketim, bang li min hat kirin da ku ez xwe veşêrim. Û kesên nasnameya wan nediyar sirb revandin, ji hingê ve tu xeber ji wan nehatiye.*" Birayê **Baljošević** hin caran hewl da agahîyan der barê wendakirîyan de bi dest bixe, lê bi ser neket. "*Eskerên îtalî yên KFORê hatin min bibînin, polêsên Neteweyên Yekbûyî jî, lê belê min qet tiştek nebihîst.*"

Mixabin çarenûsa van mirovên wendakirî bi rengekî trajîk banal e. Negovan Mavrić li Velika Hoćayê -warekî dorlêgirtî yê sirban ku bi tenê çend kîlometreyan dûrî Orahovac/Rahovëcê ye –qahwexaneyeke piçûk dixebitîne. Mavrić di heman demê de şaxê herêmî yê komeleya malbatên mirovên hatî wenda kirin, bi rê ve dibe. Ew lîsteya mirovên hatî kuştin yan jî wendakirin yên deverê nîşan dide: Cenazeyên nozdeh sirbên sala 1998ê û 1999ê hatî revandin, hatin dîtin, lê belê 64 kesên din, 55 sirb û neh roman, hê jî wenda ne. Yekemîn sirbê sîvîl 12ê gulana 1998ê hat kuştin, dema ku şerî di navbera polêsê sirb û gerîlayên UCKyê de ji bo kontrola herêma piçûk Orahovacê dest pê kir, hingê li wir gelek sirb diman. Revandina dawî ya sirbekî 28ê tîrmeha 2000ê rû da, ango salekê piştî ku herêma parastina navneteweyî hat saz kirin (*nivîsa di çarçoveyê de bixwîne*).

Îroj girên li derûdora Velika Hoćayê hemû rez in. Dîmenê hawîrdorê bi kimtên (zîrwe) muhteşem ên ku sînorê di navbera Kosova û Albanyayê de diyar dikin, temam dibe: Çîyayê Şar, yê Paştrîk, çîyayên Has û li bakûrtir ber bi Montenegroyê ve Prokletije, "kimtên bêyom". Berê, alban û sirb bêyî ku şerê hev bikin li şaredarîya Orahovac/Rahovëcê diman, gund jî bi ser vê şaredarîyê ve ye. Ji hezîrana 1999ê ve hejmara sirban li herêmê, li Velika Hoćayê dakete heftsed kesan û sêsed kesên din jî di getoya bajarê jorîn Orahovacê de ketin ser hev. Serjimara wan heta 1999ê nêzî 10 000an bû. Ji gundên xelkê wan tevlihev Zočiste, Opteruša yan jî Retimlijeyê sirb kirin der.

Piranîya sirbên ji Orahovacê "windabûyî" ji tîrmeha 1998ê û pê ve hatin revandin, ango dema ku UCKyê demeke kurt bajar dagîr kiribû. Komeke mezin a sirbên sîvîl ên ji gundê Retimljeyê biribûn wargeheke vê rêxistinê ya li gundê cîran Semetišteyê. Piştî çar rojan bi navbeynkarîya Komîteya Navneteweyî ya Xaça Sor, jin hatin berdan. Lê belê di nav de ciwanekî 16 salî jî, kesî êdî mêr bi saxî nedîtin. Hin ji wan di nav termên nîsana 2005ê dîtî de hatin nas kirin. Cenazeyên bîst û yek kesan avetibûn goreke komî ya li gundê Volljakë/Volujak ê nêzî Klînayê, pir pir deh kîlometreyan dûrî wir.

### Dîwarê Bêdengîyê

Jina bi navê Olgica Božanić a bi eslê xwe ji Orahovacê li Belgradê penaber e. Ew di komeleya malbatên kesên wendakirî de çalak e. Du birayên wê, ap û xalên wê, kurap û kurxalên wê bi giştî nêzî deh xizmên wê hatine winda kirin. Ew îdîa dike ku bi navbeynkarîya cîranên berê yên alban xeber ji yekî ji wan girtiye. Ev alban bixwe jî bi gunehbarîya, hevkarîya rejîma sirb kirine, gelek mehan di destê gerîlayan de girtî mane. Li gor îfadeya wan, sirbên herêma Orahovacê pêşî nêzî wargeha sereke ya UCKyê ya li herêmê, li gundê Drenovac/Drenovcë girtî bûn. Dibêjin, piştî ku şer bi dawî bû, ew veguhastine Devayê, gundekî çîyayên Hasê li ser sînorê Albanyayê. Xuya ye UCKyê ew der kiriye destê xwe û piştî ku artêşa Yugoslavyayê hezîrana 1999ê vekişiya, qereqoleke eskerî veguherandiye navendeke girtinê. Kesên ji Orahovacê yên sax filitî paşê birine Kukës a li Albanyayê û paşê Durrës a li perê deryayê. Ev şahid dibêjin, wan sirb li vir sala 2001ê li girtîgeheke UCKyê dîtine.

Bi her halî em dikarin qebûl bikin ku piranîyeke mezin a sirbên hatî revandin berîya şer bi dawî bibe, di nav sînorên Kosovayê de hatine qetil kirin. Li hemberî vê, tevî ku hîpoteza veguhastina ber bi Albanyayê ve ji zû ve hatiye bi pêş xistin jî, şopa kesên, piştî ku eskerên NATOyê dest bi wezîfeyê kirî hatin revandin, winda dibe. Payîza 1999ê serokê Komîteya Helsînkîyê yê Sandjaka Novi Pazarê –dezgeheke herêmî ya serbixwe ya Komîteya Helsînkîyê ya Sirbistanê - Šefko Alomerović demeke dirêj li ser vê mijarê lêkolîn kiribû. Rapora wî îro peyda nabe, Alomerović bi xwe sala 2003ê rehmet kir. Di hevpeyivînên pê re yên sala 2000ê de ew îdîa dike ku jê hatiye biçe serdana pênc navendên girtinê yên li nav Kosovayê. Ev avahîyên piçûk para bêhtir garaj an jî avahîyên pîşesazîyê yên li derdora bajaran in. Di van de ji deh ta pêncî kes dihatin girtin. Li gor wî, tevahîya van wargehan ji alîyê fermandarekî bi navê **Mala** –navê wî yê bi rastî **Alush Agushi** ye û nêzî Ramush Haradinaj e (2)– ve tên bi rê ve birin. Ew dibêje, malbatên kesên hatî wenda kirin hewl dane xizmên xwe "bikirin"; di vê navberê de tevî ku mîqdarên mezin ên pereyan dane navbeynkaran jî, li gor komeleyên malbatan, tu kes nehatiye azad kirin. Heta dibêjin bi niyeta berdêleke bi girtîyên alban ên li Sirbistanê –di dawîya sala 2000ê de hejmara wan weke heştsedî hatibû texmîn kirin–, hin sirb girtî dihatin hiştin.

Hê jî mirov nikare behsa tu pêguhurkan bike. Li gor hin çavkanîyan, dema ku Belgradê qanûneke efûyê derxist û albanên guman ji wan dihat kirin, endamên UCKyê ne, berdan, gelek girtîyên sirb sala 2001ê hatine kuştin. Hin navendên girtinê yên Kosovayê berîya veguhastina girtîyan ber bi Albanyayê ve weke "wargehên qonaxê" hatine bi kar anîn. Alomerović yekemîn kes e ku qala bazirganîyeke organên bedena mirovan kir. Li gor zena wî, tevnên sûc ên navneteweyî ev organên ku endamên UCKyê ew temîn dikirin, dikirîn.

Piştî van aşkerekirinên **Alomerović** tu lêpirsîn nehatin dest pê kirin. Ev aşkerekirin ji alîyê rêxistinên navneteweyî yên li Kososvoyê ve, di serî de jî ji alîyê Mîsyona Neteweyên Yekbûyî (UNMIK) ve ya ku hingê **Bernard Kouchner** ew bi rê ve dibir, hatin red kirin. **Alomerović** weke çalakgerekî navdar ê parastina mafên mirovan û muxalifê demdirêj ê rejîma Milošević behsa "dîwarekî bê dengîyê" yê bi rastî dikir, (3) li beramberî delîlan jî KFORê hebûna navendên girtinê li Kosovayê înkar dikir...

Kevne serdozgera Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ya ji bo Yugoslavyayê (ICTY) **Carla Del Ponte** jî di bibîranînên xwe de behsa vî "dîwarê bêdengîyê" dike. Ew dibêje, dema wê xwestiye lêkolînê li ser windabûna sirbên sîvîl û hîpoteza bazirganîya organên bedana mirovî bike, li vî dîwarî qelibîye (4).

Konseya Ewropayê ji bo raporekê binivîse Dick Marty wezîfedar kiribû. Çawa ku Dick Marty jî ji dema weşandina vê raporê û vir ve di gelek hevpeyvînan de îşaret pê dike, "*li Kosovayê herkesî*" bi windabûna sîvîlên sirb dizanî, herkesî herweha bi di dema şer de girtina gelek albanên guman ji wan dihat kirin "hevkarên" rejîma sirb in jî dizanî. Rojnameyeke Prîştînayê *Bota Sot* ji 1999ê û vir ve timî tinekirina fizîkî ya sempatîzanên Lîga Demokratîk a Kosovayê (LDK) - di dema şer de û piştî şer partîya **Ibrahim Rugova** – aşkere dike. Serredaktorê *Bota Sot*ê **Bajrush Morina** rewşê xulase weha îfade dike: "*Ji 1999ê û vir ve sê hezar kes li Kosovayê hatin kuştin, bi tenê şeşsed ji van kuştinan hatin ron kirin. Pir behsa tolhildana malbatî hat kirin, lê belê ya qewimî para bêhtir kuştinên siyasî bûn.*" Rojnameyê bixwe berdêla vê ya xwînê da: Du rojnamevanên wê hatin kuştin, Morina bixwe jî demeke dirêj neçar bû di parastina parêzvanên çekdar ên şirketeke taybet a ewlekarîyê de cihê xwe biguhere. Dîsa jî agahdarîyên rojnameyê weşandî timî ji ber têkilîyên di navbera *Bota Sot* û LDKyê de gumanbar hatin dîtin.

### Navêndên girtinê yan qesebxane?

Ev rojname bi rêk û pêk behsa hebûna navendên girtinê yên li Kosova û Albanyayê jî dike, li van navendan albanên bi "hevkarîyê" dihatin gunehbar kirin, dihatin girtin. 28ê sibata 2011ê doza du kevne fermandarên UCKyê **Sabit Geci** û **Riza Aljaj** li dadgeha Mitrovica dest pê kir. Her du jî bi gunehên giran ên li wargeha Cahanê tên tawanbar kirin. Ev wargeh li çîyayên bakûr ên Albanyayê bi tenê çend sedmetreyan dûrî sînorê Kosovayê ye.

Gundê çîya ê piçûk Cahan di dema şer de weke navenda lojîstîka UCKyê û baregeha pişt bereyê ya dildarên li Kosovayê şer bikin, hat bi kar anîn. Zilamê xurt ê deverê **Bedri Cahani** qebûl dike ku şênîyên Cahanê qaçaxçîtîya cixareyan a bi Kosovayê re dikirin û ew payîza 1997ê tevlî gerîla bûye; karê wî dikir jî ew bû ku şervanan bi şev di çîyê re derbas bike. UCKyê qişleyeke kevin a artêşa Albanyayê ya ku sala 1992ê hatî vala kirin, weke baregeh bi kar dianî. Avahîyên vê qişlê îro jî di ketina gund de li ser xwe ne. Ji bo ku ji gundikê Kruma mirov bigihêje Cahanê divê mirov di rêyeke xirab a çîyê re deh kîlometre rê biçe. Dever dûrî awiran e û Marty dibêje, li qişleya kevin navendeke girtinê jî hebû.



GÖKHAN ASLAN: **Kompozîsyona Razber III**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

heta bi bazirganîya narkotîkê û fuhûşê, ew piranîya çalakîyên neqanûnî kontrol dike. **Haliti** yek ji kadroyên payebilind ê LPKyê ye û çawa ku herkes pê dizane, ajanekî rêxistina îstîxbarata Albanyaya stalînîst, Sigurimiyê bû. Ew yek ji lîderên sereke yên şebekeya ku **Marty** weke "koma Drenicayê" behsa wê kirî ye. Ev kom di rastîyê de bi strukturên birêveber ên LPK û PDKya niha re weke hev e.

## Cahan: Dojeh

Z.Z. du meh û nîvan li "dojeha" Cahanê maye û ew yek ji şahidên sereke yên doza Geci û Aljaj e. Ew behsa muameleya xirab a sîstematîk û kirinên êşkencê yên giran dike. Li ser hin girtîyan hatiye ferz kirin ku bi hev re bikevin munasebeta cinsî, li yên din bi îdamên sexte êşkence hat kirin. Ew di vê navê de bawerîyê dide û dibêje "*bi îhtîmaleke mezin ez girtîyê ku herî zêde li Cahanê mayî me û min bi tenê girtîyên alban dîtin*". Z.Z. kite bi kite dibêje ku wî dîtiye lîderên herî girîng ên UCKyê di Cahanê re derbas bûne û navê serokwezîrê niha yê Kosovayê **Hashim Thaçi** di nav van de hildide.
Tevahîya mirovên di dema mehên şer ên bihara 1999ê de li Cahanê girtî bûn, weke Z.Z. kadroyên LDKyê bûn û bi awayekî giştî li bajarên Kukës û Kruma hatibûn girtin. Penaberên ku hêzên sirb ew ji Kosovayê kirî der li van her du bajaran civiyabûn. Hin ji wan di nav Hêzên Çekdar ên Komara Kosovayê (HÇKK) de bûn. HÇKK tevgera gerîla bû ku hevrikîya UCKyê dikir û ji alîyê partîzanên Ibrahim Rugova bi awayekî kêm serketî li Kosovayê hatibû damezirandin.

Marty di rapora xwe de îşaret bi berpirsiyarîya taybet a beşeke di nav UCKyê de dike. Ew navê "*koma Drenicayê*" li vê beşê dike û navên **Hashim Thaçi, Azem Syla, Xhevat Haliti, Kadri Veseli, Fatmir Limaj, Sabit Geci** û **Riza Aljaj** dijimêre. Ev kevne fermandarên gerîla bi rastî jî bi eslê xwe ji Drenicayê ne, lê belê xaleke wan a din a hevbeş heye: Hemû endamên Tevgera Gel a Kosovayê ne (LPK), komeke neqanûnî ya îlhama wê marksîzm-lenînîzma "enwerîzm" e, ango hevalbendên rejîma stalînî ya **Enwer Hoca**.

Ev tevger di nav dîasporaya albanî ya li Swîsreyê pêk hat, li Kosovayê tevneke wê ya têra xwe fireh a milîtanên bi dizî hebû. Ya ku sala 1996ê biryar da UCKyê damezrîne jî LPK bû -bi anîna cem hev a çend komên çete yên li Kosovayê, bi taybetî li herêma Drenicayê çalak. Di nav çeteyan de mirovê herî navdar "fermandarê efsanewî" Adem Jashari, yê xwe bi rastî fedayî Kosovayê kirî bû; Jashari 6ê adara 1999ê ji alîyê polêsê sirb ve hat kuştin. Kurapê wî **Gani Geci**, ew jî yek ji çeteyên destpêkê bû, bi zor ji êrişeke sala 2001ê sax filitî. Ew qet tevlî PDKya ku yekser warisê LPKyê bû, nebû. Ew ji mabata *bayraktaran* –"siwarên gund" ên împaratorîya osmanîyan– a gundê Llausha ya li navenda Drenicayê ye. Ew tim di nav refên LDKyê de çalak bû, paşê ew demeke kurt li parlemana Kosovayê, dewra bihurî bû parlemanterê partîyeke piçûk a ji LDKyê veqetyayî.

Gecî dibêje: "*Em dilsozên Ibrahim Rugova bûn, me qet nebihîstibû behsa LPKyê yan jî ya FARKê bê kirin; ji bo ku me navê UCKyê tevahîya şervanan dikir yek. Dema ku zilamên UCKyê ji Swîsreyê hatin, me ew hewandin. Pereyên wan hebûn, sîleh temîn dikirin, lê belê em zû pê hesiyan, ya ku wan dixwest bi tenê desthilatdarî bû.*" Li *ode*ya xwe ya muhteşem, odeya li gor rêûresmê xanîyê xwe yê pir mezin, yê piştî dawîhatina şer, ji nû ve hatî ava kirin, Geci kêlîyekê hizirî û paşê dewam kir: "*Bi her halî, wan qet şerê sirban nekir. Ji bo şerê li dijî sirban, wan pişta xwe bi NATOyê rast dikir. Wan bi tenê şerê albanên din kir da ku desthilatdarîya xwe ya mutleq ava bikin; piştî ku şer bi dawî hat wan ji Kosovayê birêkûpêk xerac stand.*"

## Ajanê Albanyayê û Serkêşê Mafyayê

Raporeke NATOyê ya sala 2003yê ya ku hê nû ji nav raporên veşartî hat derxistin, van îdîayan bi awayekî fireh piştrast dike. Ev rapor **Xhevat Haliti** weke "serkêşê mafyayê" yê Kosovayê bi nav dike. Li gor raporê, ji qaçaxçîtîyê

Ji bo ku ya dixwaze bi dest bixe, PDKyê pişta xwe bi dezgeheke xurt rast dikir: *Shërbimi informativ i Kosovës* (SHIK), rêxistina îstîxbaratê ya ku ji alîyê **Kadri Veseli** û **Azem Syla** ve dihat bi rê ve birin. Dawîya 2009ê, aşkerekirinên kevne ajanekî SHIKyê **Nazim Bllaca**, Kosova hejand. Bllaca bi awayekî aşkere li kuştina hevkarekî alban ê polêsê sirb mikur hat. Bllaca di hepsa malê de ye û li benda doza xwe ye. Di vê navberê de dikare ji nû ve xwe di çapemenîyê de îfade bike. Di hevpeyvîneke çileya 2011ê ya di rojnameya *Koha Ditore* de ew îdîa dike ku SHIKyê "*di nav mehên piştî avakirina herêma parastina navneteweyî de şeşsed û di nav salekê de hezar kes*" kuştine.

Li Kosovayê ziman êdî xwe azad dikin, qet nebe der barê çalakîyên şidetê yên UCKyê de yên li dijî albanên bi hevkarîyê dihatin gunehbar kirin yan jî fikra wan a siyasî ne weke yê gerîla bû. Li hemberî vê tu kes naxwaze behsa çarenûsa sirbên wendakirî bike. Z.Z. rave dike ku dema şer bi dawî hat, ew ji wargeha Cahanê veguhastine bajarê Prîzren ê li Kosovayê: "*Ez gelek rojan di kîlereke xanîyekî de hatim girtin, bi min re heft sirbên kal û romanek hebûn. Em du girtîyên alban ên ji wargeha Cahanê bûn. Gardîyanên me zor li me dikirin da ku em li sirbên kal bixin. Di dawîyê de eskerên KFORê yên elman ez azad kirim, lê belê berîya ev yek biqewime, sirb birin cihekî ku ez nas nakim.*" Me nedikarî piştrast bikin ka gelo piştî şer girtîyên sirb ên ku ji bo wan dibêjin organên wan ji bo bazirganîya organan dihatin bi kar anîn jî birine wargeha Cahanê yan na. Li hemberî vê li wargeha Cahanê navendeke êşkencê ya ji bo kesên ji UCKyê "veqetiyayî" hebû; eskerên yekîneyên taybet ên artêşa amerîkî di bihara 1999ê de bi rêk û pêk diçûn vê baregeha gerîla (5).

* Serredaktorê Courrier des Balkans (http://balkans.courriers.info). Pirtûka wî ya dawîyê hatî weşandin: *Voyage au pays des Gorani. Balkans, début du XXIe siècle(Rêwîtîyek ber bi welatê Gorani. Di destpêka sedsala 21ê de Balkan),* bi Laurent Geslin re, weşanên Cartouche, Parîs, 2010.

1 Awayê pêşî navê bi sirbî yê bajêr e, yê duyem navê bajêr ê bi albanî ye


2 Kevne fermandarê UCKyê yê li rojavayê Kosovayê, **Haradinaj** sala 2005ê serokwezîrê Kosovayê bû. Hê jî partîya xwe ya bi navê Hevgirtina ji bo Siberoja Kosovayê (AAK) bi rê ve dibe, niha li girtîgeha navneteweyî ya Scheveningenê tê girtin û li hêvîya doza xwe ya li dadgeha temyîzê ya TPIYê ye. Di dadgeha destpêkê de beraet kir, gelek şahidên alîyê gunehbar dike, hatibûn qetil kirin yan jî ji îfadedanê xwe dan paş

3 Bixwîne: Vanja Mekterovic û Vladimir Radomirovic, "Kosova: l'archipel des camps de l'UCK (Kosova: Tevna wargehên UCKyê)", *Le Courrier des Balkans*, 17ê nîsana 2000ê, http://balkans.courriers.info

4 Carla Del Ponte, *La chasse. Les criminels de guerre et moi* (Nêçîr. Sûcdarên Şer û Ez), Héloïse d'Ormesson, Parîs, 2009

5 Ev yek îfadeya bijîşkekî awûsturyayî Craig Jurisevic piştrast dike; Blood on my hands. A surgeon at war (Xwîna bi Destê Min ve. Di şer de Cerrahek), Melbourne, Wild Digo Press, 2010

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Çavkanî: Wikipedia

# Encamên texrîbkar

Rapora parlemanterê Konseya Dewletê yê Parlemana Swîsreyê Dick Marty ya li ser "*îdîayên muameleya ne mirovane ya bi insanan re û bazirganîya qaçax a organên bedena mirovî li Kosovayê*" 25ê çileya 2011ê li Meclîsa Parlemanteran a Konseya Ewropayê hat qebûl kirin.

Ew, hebûna "komeke krîmînel" ku Haşim Thaçiyê sala 2007ê bûyî serokwezîrê Kosovayê wê bi rê ve dibe, aşkere dike. Ew vê komê weke "Koma Drenicayê" bi nav dike, ango navê devera ku piranîya endamên wê jê ne. Senatorê swîsreyî dibêje, ev kom di rastîyê de ji kadroyên PDKyê pêk tê, bi tenê qismek gerîla pêk tîne û bi vî awayî îşaret bi "hizbperestîya" UCKyê dike. Dezgehên dewleta albanî, nexasim rêxistina îstîxbaratê "Shërbimi informativ i Shtetit" (SHISH) û artêşê destekeke yekser dan vê komê. Wê herweha ji destekeke "tercîhkirî" ya rêxistinên îstîxbaratê yên rojavayî yên ku di dema şerê 1999ê de li Albanyayê bûn, sûd wergirt.


Ew herweha ketiye nav gelek karên neqanûnî –çete, bazirganîya çekan û narkotîkê û hwd.– yên ku piştî bidawîbûna pirsgirêkê hatine kirin. Marty behsa raporên rêxistinên îstîxbaratê yên rojavayî dike. Ev rapor weke "*şefê cîhana neqanûnî ya Kosovayê"* îşaret bi Thaçi dikin. Marty ê ku baş agahdar e, dîsa jî kite bi kite dibêje, heke Thaçi fîgurê dewletê yê herî tê nasîn ê "Koma Drenicayê" jî be, ew illeh yê herî hêzdar nîne: Ew nemaze balê dikşîne ser rola Azem Syla û Xhewat Halili.

"Koma Drenicayê" li seranserê Albanyayê tevneke bi rastî ya girtîgehan ava kirîye: Hin wargehên nêzî sînorê Kosovayê, weke Cahan, Kukës û Bicajê bi taybetî ji bo wan kesên guman ji wan dihat kirin "xayîn û hevkarên" albanî bin, hatibû veqetandin; li van wargehan "lêpirsîn"a van kesan hat kirin. Gelek girtî bi saxî ji van wargehan filitîn. Beşeke duyem a girtîyan ku para bêhtir sirb in, di dema girtina xwe ya li Albanyayê de hatibûn qetil kirin. Axir, beşeke sêyem jî ji bo bazirganîya endamên bedena mirovî dihat bi kar anîn. Berîya ku organên wan, di serî de gurçik, werin jêkirin, girtî bi gulleyeke li serê wan dihat xistin, dihatin kuştin. Ev kar li navendeke girtinê ya li Fushë Krujë, nêzî balefirgeha navneteweyî ya Tîranê pêk dihat. Vê yekê jî veguhastin û gihandina menzîlê ya organan mumkin dikir. Dibêjin ev bi tenê çarenûsa bêyom û kujer a "*çendek*" girtîyan bû, herî zêde çend dehek. Girtîyên ku ev yek wê bibûya hemû çarenûsa wan, herî kêm di du wargehên qonax û dabeşkirinê re dihatin derbas kirin. Rapor herweha behsa pratîka "jinûvefirotina" girtîyan jî dike.

Kesek di jêkirina organan de bi roleke diyarker rabûye: Hekîmê UCKyê yê ku bû şêwirmendê tenduristîyê yê Thaçi, Dr. Shaip Muja. Navê vî doktorî di dosyayên klînîkeke taybetî ya Prîştînayê, klînîka Medicus de jî heye. Ev der, dika bazirganyeke din a organên mirovan bû ku heta sala 2008ê dewam kir. "Kesên bi dilê wan bû", dihatin gurçikên xwe bifiroşin. "Muşterîyên" van gurçikan para bêhtir li Almanya, Kanada û di serî de li Îsraîlê bûn. Klînîk, ya urologekî Prîştînayê Lutfi Dervhishi ye; Dervhishi bûrayê Sylla ye, Sylla jî apê Thaçi ye.

J. – A.D.


Wergera ji fransî: Luqman Guldivê


GÖKHAN ASLAN: **Zivrînek**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm







Îlon 1980

Neteweya qedîm a tarûmarkirî li hemberî dewletan, ketiye nav hewldaneke mezin a parastina nasnameya xwe. Lê belê xewna "Kurdistana Mezin" nebû çîmentoya têkoşînê.

BERÛDISTANA KURD

# Lawazîya berxwedaneke parçebûyî (1)

CHRIS KUTSCHERA *

Avakirina Kurdistaneke serbixwe, di 1920ê de, bi peymana Sevrê hatibû rojevê. Piştî şêst salan, gelê kurd hê jî di navbera pênc welatan de parçekirî ne: Li Tirkiyeyê (6- 8 mîlyon, li Îranê (5,5 mîlyon), li Iraqê (2,5- 3 mîlyon) û bi hejmara herî hindik jî, li Sûrîye û li Yekîtîya Komarên Sovyetên Sosyalîstê, (li yekê 500 000- 800 000 û li ya din jî 300 000) (1). Ji hingê ve kurdan ji bo parastina nasnameya xwe ya neteweyî qet navber neda têkoşînê. Lê belê, eynî mîna xaka wan, tevgera wan a neteweyî jî parçe parçe ye.

Şoreşa îslamî ya li Tehranê hêvîyên mezin afirandibûn, piştî demeke kin ew hêvî li Kurdistana Îranê di nav xwînê de fetisîn ku lê, pevçûnên çekdarî ji nû ve dest pê kirin. Lê belê bi qasî ku xuya dike, tiştekî nû li Tirkiyeyê an jî li Îraqê tuneye. Ji ber zexta ku bi awayekî sîstematîk li ronakbîran tê kirin, tevgera kurd herwiha ji rêveberên pêkhatî û jêhatî bêpar maye û êşa pirserîbûnê dikişîne. Ji bo ku îro ango di 1980yê de, encamên karûbarên tevgera kurd bi berfirehî bên nirxandin, divê pêşî tabloya şaxên wê yên dijber, li ber çavan were raxistin.

Li gel vê yekê jî, îro li devereke nêzî sînorê Îran û Iraqê ya ku pala xwe dide qûntarên çiyayên serbiberf ên ji 3 500 metreyan bilindtir, cureyekî biryargeha berxwedana tevgera kurd heye. Çend holikên nêzî rûbarekî –bêhtir dişibe şelaleyekê– ku navê wî jî tune. Lê belê, ji niha ve bi navê "Gelîyê Partîyan" ** li nav hemû kurdan hêdî hêdî tê nas kirin.

Bi rastî jî li vê herêma azadbûyî, ku bi temamî li derveyî kontrola karbidestên îranî û iraqî ye, biryargehên rêxistinên bingehîn ên tevgera îlegal a kurd hene: Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê (P.D.K.) ya **Ebdurehman Qasimlo**; Yekîtî Niştîmanî Kurdistan, ya **Celal Talabanî**; Partîya Sosyalîst ya Yekbûyî ya Kurdistana Îraqê, ya **Dr. Mahmûd Osman** û ji demeke nêz ve ye, Partîya Komunîst a Îraqê ya ku piştî pevçûna xwe ya bi rejîma Bexdayê re, wê jî biryar da dest bi şerê çekdarî bike. **Şêx Ezedîn Huseyn** jî, ku pêşengekî olî yê kurd e, li nêzî Komala (Komîteya Marksîst-Lenînîst ya Kurdistan) li Gelî bi cih bû.

"Gelîyê partîyan" di heman demê de wargehekî mezin ê antremana çekdarî ye û ev bi awayekî dibe dibistaneke şoreşê ya ku tê de mîlîtanên ciwan – yên di ser sî salî re pir kêm in– ên ku li ser perwerdeya Marks, Lenîn, Mao, Guevara û …Enwer Xoce dikevin nav gengeşeyên pir germ. Ev yek herwiha dibe sembola parçebûna tevgera neteweyî ya ji hemû deman zêdetir parvekirî, hem jî li demeke ku şoreşa Îranê, buhrana mezin a siyasî û aborî ya li Tirkiyeyê û jinûve destpêkirina têkoşîna çekdarî ya li Kurdistana Îraqê dikaribûn fersendeke nedîtî daniya ber van rêxistinên ku dixwestin Kurdistana ku bi peymana Lozanê berî nêzî şêst salan parçekirî, ji nû ve bigihînin hev.

Tevgerên kurd yên başûr û rojhilatê ku ketine nav têkoşîneke çekdarî ya pir dijwar, li gel vê yekê jî dixwazin pirsgirêka kurd di çarçoveya sînorên dewletên Iraq û Îranê de were çareser kirin û ji bilî xweserîyê tiştekî din naxwazin; her çi tevgera kurd ya li Tirkiyeyê ye, ku ji ber zilm û zoreke bêwijdan a dehan salan hê nû hêdî hêdî pişta xwe rast dike, lê hê jî nikare dest bi şerekî çekdarî bike; ji doza serxwebûnê nayê xwarê.

## Li Tirkiyeyê: Ji xewê rabûn

Ji bo şikandina pişta "terrorîzm"ê, hikûmeta tirk gulana sala bihurî, li gelek bajarên Kurdistanê orfî îdarî ango "rewşa awarte" îlan kir. Bi hezaran kes hatin bin çav kirin –zêdetirî 5 800 kesan bi tenê li Amedê û derûdora wê. Artêşa tirkan bend û rizdeyên li ser rêyan pir zêde kirin. Li ber dergehên bajaran, rêwîyan ji ser ta pê kontrol dikin û bagajên erebeyan jî serûbinî hev dikin. Bi îxbarekê artêş dor li qahwexaneyekê digire û hemû mişterîyên tê de di kontroleke hûr û kûr re derbas dike. Lê belê serokê rêxistineke kurd ya îlegal, ê zêdetirî 40 sal cezayê girtîgehê lê hatiye birîn jî, dikare li eywana qehwexaneyekê zêdetirî çar saetan bi rojnamevanekî re li ser her tiştî guftûgo bike.

Sekreterê giştî yê rêxistinekê di xanîyekî jihevketî yê gundikekî de, kêmtirî 50 metreyan nêzî eskerekî ku li cihekî bilind çav didêre ser sînor – sînorekî ku tê re bi tonan çek derbas dibin- dikare bi aramî bernameya partîya xwe vebêje û rave bike. Çend kîlometreyan dûrî bajarekî mezin ê ku li wê derê artêşa tirkan hêza xwe bi xwepêşandaneke nû nîşan dide, li gundekî, endamên komîteya navendî ya rêxistineke din jî dikarin bi hêsanî li hev kom bibin. Lewre artêş û polîs ti tiştî nabînin, nikarin bibînin.

Neteweyek bi temamî ketiye nav dijberîyê. Li Îranê û li Iraqê, kurd xwe weke hindikahî dibînin û li gel hikûmeta navendî dikevin nav têkilîyên hevnegirtî. Li Tirkiyeyê, ew xwe weke neteweyeke kolonî û dagirkirî dinirxînin û doza wan doza serxwebûnê ye. Tevî ku biryar dane ku demekê ji ya din zûtir dest bi têkoşîna çekdarî bikin, hê jî bi piranî li qonaxa pêşxistina hişmendîyê û rêxistinîyê ne -û hemû polîsên cîhanê jî nikarin pêşî li qonaxên wisa bigirin.

### Asîmîlasyona nêzî biserketinê

Siyaseta asîmîlasyonê ya hikûmeta tirk hema bêje bi ser ket. Li bajarên mezin, wê dibistanên înternat saz kiribûn û ciwanên kurd pênc salên xwe yên perwerdeya seretayî ya mecbûrî bi şevûroj li wan dibistanan derbas dikirin. Bikaranîna zimanê kurdî li wir qedexe bû û ciwanên kurd, li gel fêrbûna zimanê tirkî, diviyabû bibin welatîyên tirk ên maqûl, kemalîstên baş. Gelek caran, malbatan jî –ji ber egerên aborî– di vê kampanyaya pişaftinê de hevkarîya sûc dikir. Mamosteyekî mîlîtan ku îro di nav rêxistineke kurd de cih digire, li ser mijarê ji jiyana xwe vê serpêhatîyê vedibêje: *"Bavê min neteweperwerek bû û tevlî tevgera Şêx Seîd bûbû (2). Lê belê em deh xuşk û bira bûn; erdê bavê min pir hindik bû û wî êdî dixwest dawî li wê destengî û xizanîyê bîne. Wî dixwest ez bibim mamoste. Li Kurdistanê, wergirtina dîplomaya mamostetîyê, weke xewnekê ye, ew bi awayekî ji awayan misogerkirina serxwebûna aborî ye. Ji bo vê yekê jî, zimanê kurdî, berevajî, ti feydeya wî tunebû. De îca, eger we divê, bawer bikin, bavê min pir dixwest em li malê bi tirkî biaxivin –û her cara ku me peyveke bi kurdî bikar dianî, diviyabû me pênc çerxî bavêta qutîyeke piçûk a li malê."*

*"Piştî bi wî awayî derbaskirina pênc salan li dibistana seretayî û dîsa bi heman awayî li dibistana navîn û herî dawî jî li dibistana mamostetîyê, ez êdî bi temamî guherîbûm: We jî min bipirsiya, ez êdî tirkek bûm û kurdbûn êdî tiştekî eyb û şerm bû".* Hema hema hemû mîlîtanên sî salî heman çîrokê vedibêjin.

Mîlîtanekî din jî wê rewşê wiha rave dike: *"Li Tirkiyeyê bi hezaran kurdên ku xwe tirk dihesibînin hene û ez jî yek ji wan bûm".*

Bi giştî ber bi salên xwe yên bîstî ve, piştî cihgirtina di nav yek ji rêxistinên çepê tirk de, ciwanên kurd dibin xwedî hişmendîya nasnameya xwe. Lê belê ew bi giştî baş nikarin ji bo vê çerxa hişmendîyê îzahekê bibînin, ya ku di salên 1960î de destpê dike û li nav Partîya Demokrat a Kurdistan (P.D.K) a Tirkiyê ku têra xwe di bin tesîra general Barzanî de ye û herwiha di nav Partîya Karkeran a Tirkiyeyê (TIP) de bi pêş dikeve.

Eynî mîna li Îranê û li Iraqê, rehên tevgerê vedizelin pêleke bi temamî neteweparêz û sosyalîst. Lê belê, pir zû, Partîya Komunîst li xwe mikur tê ku ew nikare çareserîyeke tetmînkar a pirsgirêkê pêşkêş bike û piştî xebatmeşandina di nav dezgeheke xweser a TIPê de, neteweperwerên kurd DDKOyê -Ocaxên Çandî û Şoreşger ên Rojhilatê- ava dikin.

Ji 1971ê û vir ve, tevger tûj û tundrew dibe: Piştî derbeya eskerî ya 12ê adara 1971ê, mîlîtanên kurd ên li Amedê tên darizandin, bi têgehên siyasî pirsgirêkê tînin ziman û dest nîşan dikin ku destûra bingehîn kurdan weke kole, weke kesên bindest dinirxîne û bi vî awayî pergala siyasî ya welêt bi tevahî sûcbar dikin.

Piştî çend salên din, ber bi 1975ê ve, hejmareke rêxistinên neteweyî yên kurd ku hemû jî xwedî heman armancê ne -serxwebûna Kurdistanê - ava dibin. Û bi rastî jî mirov nizane ka ewçend pirserîbûna van rêxistinan xwe dispêre sedemên îdeolojîk an jî hevrikîyên şexsî.

Li rastê, tenê rêxistinek, Partîya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ya Tirkiyeyê heye û ew hê jî pir bi zexmî li başûrê Kurdistanê, bi taybetî jî nêzî sînorê Sûrîye û Îraqê, bi cih bûye. Di dema kongreya xwe ya cotmeha 1977ê de, PDK, jî serxwebûnê ji xwe re dike armanc û bi gotinên sekreterê xwe yê giştî yê nû, radigihîne ku *"ew vekirî ye ji prensîbên marksîst-lenînîst re".* Ya rastî PDKya Tirkiyeyê têra xwe muhafezekar e û ligel PDK ya Îraqê dikeve nav danûstandinên pir germ û jê re dibe alîkareke girîng; bo nimûne di ser sînorên Sûrîyê re rêyên anîna gelek çekan jê re dibîne. Piranîya mîlîtanên çepê kurd ên bakûr, tevî ku alîyên "paşverû" yên PDKyê rexne dikin, hemfikir in ku ew yekane tevger e ku bi kokdarîya xwe û bi rêxistina xwe dikare weke partî were qebûl kirin.

Li çepê, tevlîhevî heta bi qirikê ye. Tevî vê yekê jî, sê rêxistinan -Ozgurluk, DDKD û KUK – bi hêvîya pêkanîna tiştekî ku mirov dikare weke Partîya Komunîst a Kurdistana bakûr bi nav bike, di adara 1980yê de li hev kom bûn û [bi navê UDG (Hevkarîya Demokratîk a Neteweyî)] danezaneke hevpar îmze kirin.

Rêxistina Ozgurluk a bi saya ronakbîrên ku ji nû ve li dora du kovaran, "Ozgurluk Yolu (Riya Azadî)" û "Roja Welat", li hev kom dibin, bi ser xwe ve tê, doza xwe ya ji bo serxwebûna Kurdistana bakûr û federasyona li gel dewleteke demokratîk a tirk tîne ziman û diparêze. Ev rêxistina ku parçebûna Kurdistanê weke "heqîqeteke pir zelal" dinirxîne û projeya Kurdistana Mezin weke "xeyalî" dibîne û xwe nade ber, rêxistina kurd a xwedî danûstandinên herî baş e li gel çepê tirk, bi taybetî jî li gel TKPyê (Partîya Komunîst a Tirkiyeyê). Ew bi biryardarî alîgira Sovyetê û dijbera Çînê ye. Lê belê di dawîya 1978ê de parçe bû, du rêxistinên hevrik jê peyda bûn û di encama vê parçebûnê de rêxistina ku gelek lîderên wê neçar man bi tevahî bikevin nav îlegalîteyê, pir qels bû.

Her çî DDKD ye (Komeleya Çandê ya Demokratîk û Şoreşger), ku di 1974ê de ava bû, pêşîyê li Stenbol, Enqere û Îzmîrê xwedî sê rêxistinên xweser bû. Dû re, xebatên wê li Kurdistanê bixwe berbelav bûn. DDKD ya ku xwe weke "tevgera demokrat û neteweyî ya pişta xwe dide îdeolojîya marksîst" tarîf dike, ji bo ramanên xwe ragihîne û belav bike du kovaran -Jîna Nû û Tîrêj– dertîne. Ji bo wê, gelê kurd gelekî yekpare ye, lê belê piştî şerê yekemîn ê cîhanê, bi awayekî sûnî, hatiye parçe kirin. Tenê azadî û serxwebûna çar parçeyên



GÖKHAN ASLAN: **Maşînbûn**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

www.chriskutschera.org



## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Nivîsa Chris Kutchera ya bi navê Berûdistana Kurd - Li ser lawazîya berxwedaneke parçebûyî, pirsgirêka kurd li seranserê Kurdistanê ye û analîzek e li ser rêxistinên kurd yên ku piştî salên heftê derketine holê dike. Piranîya rêxistinên wê deme pal didin ser teorîyên klasik yên cîhanê û hîmê xwe li ser vê yekê ava dikin. Kuchera bal dikşîne ser tevgerên nû, xeterên nû, rêxistin û kesên di wan de rol girtine û rola wan yek bi yek dest nîşan dike.

Beş bi beş li ser pişaftina kurdan bi taybetî jî, pişaftina dijwar ya li Tirkiyeyê radiweste û bi bîr tîne ku tirkan çawa bi dibistanên înternat zarokên kurd bi navê xwendinê, asîmîle kirine. Di vî warî de hema beje bi gelemperî, bi ser jî ketine.

Kuchera dûr û dirêj li ser şerê birakujîyê radiweste û bûyerên hatine holê yek bi yek şirove dike, têkilîyên di navbera her du partîyên kurd yên mezin de radixe ber çavan. Kurd, dêvla ku bi hev re kar bikin, giranî dane têkilî û peymanên bi hikûmetên navendî û xwastine bi wan re li hev bên û ev yek bûye sedem ku di nav Kurdan de nakokî hîn bêtir kûr bibin û rêxistinên kurd ji hev dûr bikevin.

Hikûmetên navendî yên Kurdistan dagîr kirine, ev rewş baş bi kar anîne û lê qet guh jî nedane daxwazên rêxistinên kurd, peyman pircaran yek alî faşil bûye. Dema li parçeyekî pirsgirêk hebûye, serdestên wê parçeyê bi partî û hêzên parçeyên din re têkilî danîne, kurdên ba xwe cidî negirtine û bi têkilîyên parçeyên din jî nîfak xistine nav partîyên kurd, li pêş hevxebata wan bûne asteng. Bo nimûne Îranê, li gor wî bi alîkarîya hêzên Başûr, zora tevgera kurd ya li Rojhilatê Kurdistanê biriye.

Neteweyeke qedîm û têkoşêr ku hertim ji bo mafê xwe li ber xwe daye, pir caran ne ji ber xurtbûna dijmin lê ji ber lihevnekirina hêzên nav xwe winda kirîye, lê dîsa jî bêrawestan xwedî li têkoşîna xwe derketîye û hîn jî di nav şerekî dijwar de hebûna xwe diparêze.


LMd kurdî

Kurdistanê (li Îran, Iraq, Tirkiye û Sûrîyeyê) dikarin çareserîyekê bi xwe re bînin. Bi vê armancê ew afirandina rêxistineke navendî ji bo çar herêman û serlêdana têkoşîna çekdarî girîng dibîne û pêşniyar dike. Têkilîyên DDKD li gel partîyên çepê tirk (TIP, Partîya Karkeran a Tirkiyeyê; TSIP, Partîya Sosyalîst û Karkeran a Tirkiyeyê; TKP, Partîya Komunîst a Tirkiyeyê) pir qels in. Ev partîyên çepê tirk çareserîya doza kurd li derveyî çarçoveya Tirkiyeyê nanirxînin û wê dadixin asta pirsgirêkeke kêm-pêşketina herêmî, bêyî ku behsa girêdaneke bindestîya mêtingehî bike. Wekî din DDKD jî bi biryardarî alîgira Sovyetê û dijbera Çînê ye.

KUK (Rizgarîxwazên Neteweyî ya Kurdistanê), ku piştî kongreya 1977ê ji şaxekî PDKya Tirkiyeyê zêde bûye, baskê çepê yê rengmarksîst ê partîyek e ku hê jî nekariye ji bin tesîra barzanîyan rizgar bibe, temsîl dike. Alîgira serxwebûneke pêşî bi Kurdistana Bakûr sînorkirî, KUK di qonaxa destpêkê de federasyona li gel dewleteke sosyalîst datîne ber xwe. Lê belê ew bi zimanekî hişk rêxistinên heyî yên çep (TIP, TSIP, TKP) yên weke "revîzyonîst" dihatin dîtin, rexne dike û giranîyê dide ramana "çîna bi rastî jî karker a Tirkiyeyê" ya hê jî nerêxistî.

Li tenişt bigewdebûnên van rêxistinan, komeke ronakbîr a li derdora parêzer **Rûşen Aslan** (di dawîya 1979ê de hat girtin) li hev kombûyî, kovarek ku wê navê xwe bida koma wan jî, deranî: **Rizgari**. Di vê weşana duzimanî de (bi kurdî û bi tirkî), wan dixwest *"li dîroka tevgera neteweyî ya kurd vekolin û perspektîfan pêşkêş bikin"*. Hê bi derketina hejmara pêşî ve, 21ê adara 1976ê, kovar hat kom kirin û qedexe kirin. Di neh hejmarên kovarê û heşt broşurên bi awayekî îlegal weşandî de, mîlîtanên Rizgarîyê doza serxwebûna çar herêmên Kurdistanê dikin. Wekî din, endamên Rizgarîyê ku li gor xwe, ji têkçûna tevgera filistînî ya ku têkoşîna xwe bi tenê li ser axa filistînî dimeşîne, ders dertînin û ji ber vê yekê, dibêjin divê berî her tiştî tevgereke şoreşgerî li Kurdistanê were ava kirin, dûre hemû kurd di heman "enîya neteweyî" de bibin yek; û di pey re jî "bi tevlîkirina karkerên ereb, tirk û faris, divê şoreşa Rojhilata Nêz were kirin".

Tiştê ku Rizgarîyê ji tevgerên din vediqetîne, helwesta wê ya rexneyî ya beramberî Yekîtîya Komarên Sovyetên Sosyalîst (YKSS)ê ye. Yek ji rêveberên wê yê ku hê jî nehatiye girtin, dibêje: *"Li ser mafê kurdan ê diyarkirina çarenûsa xwe, ti caran Partîya Komunîst daxuyanî nedaye û YKSS qet alîkarîyê nade têkoşîna PDKya rojhilat, lê belê ew destekê dide Baasa ku kurdên başûr diperçiqîne"*. Li gel vê yekê jî, Rizgarî alîkarîyeke ku ji Yekîtîya Sovyetê were bi temamî jî red nake, *"di paşerojê de dema ku tevgera kurd bibe hêzeke siyasî, divê Yekîtîya Sovyetê weke hêzeke mezin kurdan piştguh neke"*.



### Rola gundîyan

Rêxistineke din a bi awayekî hişktir dijberî Sovyetê ye, tevgera maoîst Kawa jî (a ku navê xwe ji mîtolojîya kurd werdigire) ji bo serxwebûna Kurdistanê têdikoşe û di heman demê de têkoşîna li dijî YKSSê jî diparêze; mîlîtanên wê dest nîşan dikin ku Moskova çekan û diravan dide hin rêxistinên kurd û wan ji bo siyaseta xwe ya "berfirehbûn"ê bi kar tîne. Piştî mirina lîderê wê, Ferit Uzun ku mihendisekî ciwan ê ji Siwêregê bû û di 22yê mijdara 1978ê de ji alîyê mîlîsên eşîreke mezin a bajêr ve hate kuştin***, rêxistin jî di nav xwe de parçe bû, du rêxistinên dijberî hev jê peyda bûn [Kawa û Dengê Kawa], yek jê alîgira Çînê, ya din jî alîgira Arnawûtê.

Herî dawî em behsa PKKê (Partîya Karkerên Kurdistan) bikin, ew tevgera herî zêde dibe mijara guftûgoyan e. Ev tevger di 1976ê de ji alîyê xwendekarekî berê yê zanînên siyasî yê ji Rihayê yê bi navê xwe yê kurdî APO (Abdullah Ocalan) ve hat ava kirin û pêşî weke tevgera Apocîyan hat nas kirin û navê xwe yê niha jî di 1978ê de wergirt. PKK bi parastina şerê çekdarî yê derhal, ji hemû rêxistinên berîya xwe cuda ye û PKK dibêje, şerê çekdarî dihêle ku hişmendîya siyasî ya gundîyan şîyar bibe, ev rêbaz *"nîşanî gundîyan dide ku hêza mêtinger qels e û derketina li dijî vê hêza dagîrker mumkun e"*. Mîlîtanên PKKê berî hertiştî bi hin serkeftinên xwe ketin çavên gundîyan û pêşwazîyeke baş li wan kirin û piştgirî dan wan, lê belê hê jî mirov nikare behsa hebûna "herêmên rizgarkirî" bike.

Tevî vê yekê, piştî îlankirina orfî îdarî, rêveberên partîyê der barê berdewamkirina şerê çekdarî de bûn xwedî du nêrînên cuda. Hin ji wan dibêjin şerê çekdarî wê zextên li ser gundîyan zêdetir bike û rewşa wan xirabtir bike. Tê gotin ku di dema civîneke sala bihurî de, lîderê PKKê "Apo" bixwe ev nêrîn ecibandiye. Lê belê mîlîtanên partîyê şer ranewestandiye, bi taybetî li herêma Siwêregê, ya ku di pevçûnên pir dijwar de ji gulana 1979ê ve zêdetirî 200 kesan hatin kuştin. Dijberên PKKê, nexasim DDKD, KUK û Ozgurluk jî, van pevçûnan weke delîl nîşan didin û îdîa dikin ku hin provokatorên ku li ser hesabê servîsên saloxdarîya tirk dixebitin, çizirîne nav vê partîyê.

Bivê nevê mirov li hemberî vê pirserîbûna rêxistinên kurdî, ên ku ji bo çareserkirina nexweşîyên navbera xwe, bêdudilî çekan bi kar tînin, xemgîn dibe. Rêveberên van rêxistinan ên ku di bin tesîra zimanê xwe yê şîlo û teorîk de hesasbûyî, pirparçebûna rêxistinên kurd ên Tirkiyeyê dispêrin taybetmendîya wan a ronakbîrîyê û îdîa dikin ku *"ronakbîrên kurdên bakûr ji ronakbîrên kurd ên rojhilat û başûr zanistîtir in."* Der barê jihevhesappirsînê de jî yek ji rêveberên rêxistinên bakûr dibêje, *"ev jî nîşan dide ku rêxistina me li Tirkiyeyê baştir e; em pêşî pirsgirêkên xwe yên navxweyî çareser dikin, dûre jî wê li hemberî me bi tenê dijminê me bimîne: Kolonyalîzm û emperyalîzm."*

Herçendî ev rêxistin giş îlhama xwe ji marksîzmê distînin, her yek ji wan, di heman demê de, îdîa dike ku ew bixwe mîraswergira "rast" ya marksîzmê ye.

Ji bilî PKKê, hemû rêxistinên çep ên kurd, di eslê xwe de pişta xwe didin teorîyên klasîk ên marksîzmê. Ji bo wan, çîna karker a kurd e ya ku divê tevgera şoreşger bi rê ve bibe, lewre "hişmendîkirina gundîyekî bi zevîyên ku ew dixwaze bi dest bixe, sînorkirî ye".

Tevî vê yekê jî, çîna karker bi awayekî berbiçav li Kurdistana Tirkiyeyê tine, ji ber ku ji % 99ê pîşesazîyê li herêma tirk a vî welatî hatiye bi cih kirin: Eger proleteryayek kurd hebe jî, ew li kevîyên bajarên mezin e: Enqere, Stenbol, Îzmîr û Îzmîtê ku li wan, bi sed hezaran kurd dijîn. Herwiha, ji hemû parçeyên din ên Kurdistanê kêmtir pêşketî, Kurdistana bakûr welatekî bi bingeha xwe gundewar e: Bêyî livandina gundîyan, paşeroja tevgera kurd li vî welatî pir misoger xuya nake. Gundîyên Kurdistanê bi piranî li ser zevîyên aîdî maldarên mezin an jî axayên xwedî 10 000 donim (bi qasî 1 000 hektar) erd an jî zêdetir, nanoziko dixebitin. Ji bo rojeke xebatê, gundî bi qasî 250 lîra -têra standina 10 kîlo nan dike- distînin. Ew li xanîkokên wisa jihevketî rûdinên ku ti ferqa wan ji pangeyên sewal lê tên hewandin, tinene û piranîya wan bi tirkî nizanin: % 75ê kurdan ne dizanin bixwînin ne jî binivîsin. Ronakbîrekî kurd vê rewşê wiha tîne ziman: *"Tirk wisa bikêrnehatî ne ku nikarin çanda xwe jî fêrî me bikin"*. Û gundîyên kurd dema neçar bimînin ji bo serlêdaneke îdarî biçin bajêr, an jî dema biçin ser doktor, axa an jî serokeşîr bi wan re "wergêrekî" dişîne –ev jî rêbazekî axa û serokeşîran e ji bo ku gundîyan baştir kontrol bikin û bi xwe ve girê bidin. Li gundan, di dema hilbijartinan de, axa pir baş dizane her gundîyek dengê xwe dide kê û wêrekîyeke mezin pêwist e ji bo ku gundîyek li dijî daxwaza axa dengê xwe bi kar bîne -heye ku ji erdê xwe, karê xwe û hetta ji nanê xwe bêpar bimîne.

Sazûmana eşîrî li derbajaran hê jî weke xwe û berê ye. Li Siwêregê, bo nimûne, axayê mezin, Celal Bûcak, dikare hezar mîlîsên taybetî ji nav eşîrê techîz bike û şer bi wan bide kirin. Û mîlîtanên PKKê dikarin ji bo doza xwe -bi tevahî- bi eşîreke din re bibin hevalbend.

Pêşketina kêm a aborî û çandî ya gundewaran diyardeyeke zelal e, lê belê rêxistinên neteweyî yên kurd hê jî ji bo nirxandina vê potansîyela mezin a şoreşê ti tişt nekirine. Yek ji kadroyên berê yê PKKê vê rewşê wiha dest nîşan dike: *"Enqere ti tiştî nade me ku em karibin ji xwe re bihêlin"*.

***Berdewamîya vê nivîse dê di hejmara nîsanê de bê weşandin.***

* Rojnamevan.

** "Ev "gelîyê partîyan" yê ku nivîskar behsê dike, nêzîkî çîyayê Mamend, Xirî Nawzeng e, hingê ji ber pirbûna partî û rêxistinên li wir bicihbûyî, di nav xelkî de bi navê "Dolî Ehzab" dihat nasîn.

*** Li gor hin agahdarîyan Ferit Uzun ji alîyê PKKê ve hat kuştin.

1 Bi tevahî, 15-17 mîlyon. Gava statîstîk tunebin, ev reqem weke texmînên muhtemel ên kêmî ya rastîn, dimînin. Li Sûrîyê, kurd tenê ji % 10ê nifûsê pêk tînin û bi giranî li Cizîrê, Kurdagî ("çîyayê kurdan"), nêzî Helebê û li bajarên mezin in. Bi rêjeya xwe pir hindik in, ji ber vê yekê bi rola ku lîstine hertim li kevîyê mane; li gel vê yekê jî wan bi awayekî kevneşopî hertim kiriye ku kurdên Tirkiye, Iraq û yên Îranê ji "fedekarîya" Surîyê sûdê wergirin. Der barê kurdên Yekîtîya Sovyetê de, bala xwe bidin ser lêkolîna hêja ya Kendal Nezan a di nav berhema kollektîf, Kurd û Kurdistan de ku ji alîyê Mapero ve hat weşandin (Paris, 1978)

2 Hemû axaftnên di nav kevanan de ji hevpeyvînên me yên li gel kesên navbihurî hatine wergirtin. Ew hevpeyvîn di mijdara 1979ê û gulan û hezîrana 1980yêde pêk hatine

3 A.R. Ghassemlou, Kurdistana Îranê, 1976, 36 rûpel, weşanvan û cîyê weşandinê di berhemê de nehatine dest nîşan kirin)

Wergera ji fransî: Baran Nebar



www.arsivakurdi.org

## HÊVÎ Û TALÛKE JI BO SERÎHILDANÊN EREB

# Artêş, gel û otokrasî

SALAM KAWAKIBI Û BASSMA KODMANI *

Li Kurdistana Iraqê, wekî li deverên din ên welêt, xwepêşanderên ku bêhtir demokrasî dixwest, bi awayekî zalimane hatin perçiqandin. Li Bahreynê, milet û key di rewşeke teng de rû bi rû ne. Ji Yemenê heta Cezayîrê, ji Fasê heta Urdinê, xelk zêdebûna mafên demokratîk û edaleta civakî dixwazin. Reva serok bin Elî û îstîfaya Muberek çalakîyên li herêmê xurttir kirin, bêyî ku tevgerên li her du welatan rawestin. Li Tûnisê, tirsa kaosê û payînên civakî li cem hev cih digrin (rûpela 19ê bixwînin ). Li Misirê, karker hewl didin ku daxwazên xwe û mafê rêxistinê bidin qebûl kirin, û Birayên Misilman banga "veguhastina bi emr" dikin (rûpelên 15 û 16 bixwînin ). Li Libyayê, rola eşîran hê jî sereke ye (rûpela 17 bixwînin). Li deverên din, artêşên ku ji dehsalan ve stûnên esasî yên dewletan in, li ser makîneyên asayîşê serdest bûn û di navbera gel û otokratan de dudil in (li jêrê bixwînin).

Zêdetirî çil salan, li cîhana ereb "artêş" bi derbeyên eskerî, rewşa awarte, veşarî û çavdêrîkirinê re bûye hemwate. Ev dezgeh bi xwe jêdera pergalên siyasî an jî temînata wan a herî mezin e, lê belê pir kêm caran wê xwe li ber çavan da xuyakirin. Halbûkî wê gelek caran kirasê parêzvaniya gel û rizgarkeriya dewletê li xwe kiriye. Herçendî ji navgînên ewlekariyê pêk tê, di destwerdana wê ya dawî de, li Tûnis û Misirê, bi hêza polîsan re tevnegeriya, daxwazên xwepêşandêran weke rewa qebûl kirin, û destek neda serokê ku wê bi xwe anîbû ser desthilatiyê û li bin fermandariya wî, heta hingê hereket dikir.

Başe, çi qewimî, di pêvajoya van deh salan de, ji bo ku civak bikevin asteke ji destwerdana eskeran kêfxweş bibin, û bi vê jî nemînin, ji bo dest werdin desthilatiyê bang li eskeran bikin. Ev yek hem li Tûnisê, hem jî hema piştî demeke kin li heyama şoreşa Misirê ya ku di nava 18 rojan de dawî li rejîma Mûbarek anî, hat dîtin?

Piraniya rêveberên welatên ereb, çi yên ku jêdera wan artêş e, çi jî yên sîvîl, ji ber ku giraniya artêşê ya di avakirina netewe-dewletê de pir baş nas dikin, xetereya ku ev dezgeh dikare bi xwe re bîne jî pir zû fêm kirin. Ji ber vê yekê, van rêveberan hewl dan artêşên welatê xwe berkevî û bêtesîr bikin, bi taybetî ji bo di vê yekê de biserkevin, ji aliyê aborî ve derfet û îmkanên mezin danîn ber artêşan. Generalan jî ji vê yekê sûd wergirt. Ji xwe re navendên bazirganiyê ava kirin, li çolê bajar saz kirin, li keviyên avê ji xwe re wargeh damezirandin, û bûn xwedî mafên endamtiya klubên bijarteyan ên ku berê tenê arîstokratên Qahîreyê dikaribûn têde cih bigirin. Esker di hemû karûbarên mezin ên welêt de dibin xwedî par, şirketên mezin birêve dibin, û di kabîneyên wezîran de jî cih digirin.

Beramberî vê yekê, şefên dewletan jî rahiştin pêşvebirina pergaleke kompleks a ewlekariyê ya ku spartin sûbayan payebilind ên di çarçoveya bîrbirineke nû de dihatin perwerdekirin : mîsyona wan a parastina dewletê vediguherî parastina rejîmê. Ev şemitîna mîsyonê li herderê li ber çavan dikeve ango xwe dide xuyakirin, lê belê ew bi taybetî ji aliyê rêveberên ku jêdera wan artêş e ve, hat teşwîqkirin.

Serwîsên ewlekariyê mîsyonên saloxdariyê û serûberiya nîzamê pêk tînin; ew rojane karûbarên welatiyan kontrol dikin. Zêdekirina hejmara wan bûye rêzikeke esasî ; di çarçoveya bîrbirina ewlekariyê de, hemû, çavdêriya hevûdin dikin. Li Misirê, hejmara endamên wan wisa hat werimandin ku gihîşt nêzî sê qetê hejmara endamên artêşê. (1,4 mîlyon kes, li hemberî 500 000 eskerî). Kêm welat hene ku têde weke Cezaîrê di nava yek gewdeyê de her du beşên ewlekariyê xwe li hev digirin.

Ev ajansên ewlekariyê ku weke milên zordar ên rejîmên siyasî, tên hesibandin, di heman demê de siyasetvanan jî birêve dibin. Ew bi darê zorê dibin, navbeynkarên biîmtiyaz ên gel–karkerên di grevê de, xwepêşandarên ku xaniyan an jî mafê xwedîbûna zeviyên ku diçînin dixwazin. Ew herwiha têkiliyên navbera civatên oldar saz dikin, rêzikên sansurê yên hikûmetê an jî yên rayedarên olî didin pêkanîn, û sînorên azadiya xweîfaderkirinê desnîşan dikin.

Çizirîna wan a nav hemû dezgehan ne tiştekî nû ye, lê belê rasterast birêvebirina jiyana civakê ji aliyê serwîsên saloxdariyê (*muxabarat*) ve di deh salên dawî de hilperikî asteke bêhempa. Ev ajans ji niha û şûn ve êdî di nava rojê de jî operasyonan pêk tînin û axaftina şefên wan hestekî pir sar îfade dike: *"Li vir, hertişt ewlekarî ye,* wisa ji me re dianî ziman (1*). Berpirsiyarekî payebilind ê wezareta karûbarên hundir ê Misirê jî dibêje; *her tişt di bin berpirsiyariya me de ye, ji çivîkên li çola Sînayê heta bigihe endamên Al Qaîdeyê, yên di mizgeftên Qahîre û Îskenderiye re derbasbûne û niha li wê çolê digerin, giş."* Heta bigihe kontrolkirina mejiyan jî: li Arabistana Suûdî, di çarçova têkoşîna li dijî cîhadê, wezîrê karê hundir têgeha *"ewlekariya ronakbîrî"* bi pêş xist.

Rêveber êdî dikarin di nava aramiyê de serê xwe deynin ser balgîvê xewê : zilamên ewlekariyê bi her tiştî ve mijûl dibin – hertim zêdetir ewlekarî û kêmtir siyaset. Têgeha sekurîtokrasiyê, ya ku ji siysetzanê sûdanî Haydar Îbrahîm, hatiye wergirtin, li van rejîman (1) pir digunce. Serhildanên li welatên herêmê, yên li pey hev rû didin, bi taybetî balê dikşînin rewşa riziyayî ya dezgehên siyasî. Li piraniya van welatan dewlet di pratîkê de ji hev ketine, pelişîne û artêş ji bo rizgarkirina wan hatine vexwendin.

Karakterîstîkên pergalên ku xwe li ewlekariyê digirin ên cîhana ereb pir ne cihêreng in ji yên Amerîkaya Latîn, Ewrûpaya Rojhilat an jî Başûr ên beriya derbasbûna wan a nav çerxa demokrasiyê: rola mertalê dilîzin di navbera dewlet û civakê de, bi karîgeriya dewreya girtî ya cîhazên ku bi gewde û şaxên xwe ji hev cihêreng, lê belê bi çanda cezanedîtinê û rêbazên karîgeriya xwe eynî ne, û xwedî heman bîrbirina bêwijdan a terorê ne. Lê belê herçendî ev makîneyên şahane ên çavdêrîkirinê armanca wan a pêşî tirsandin û rêgirtina li pêşketina têkiliyên navbera welatiyan be jî, bi zêdebûn û guherîna hiyerarşiyiyê re, bi xwespartina çerxa reqabetên navbera eşîran jî, tirs di hemû qonaxan de mezintir dibe û li her derê dibe serdest.

Raperînên girseyî yên li destpêka salê ji Mexrîbê heta Maşrekê rû dan, bûn xwedî tesîra jihevxistina dewreya girtî ya ku di navê de cîhazên deshilatêyê çerxa xwe dizîvirînin. Gel, bêî ku kes jê bipê, weke îfşakarê cudahiyan û katalîzorê dijberiyan tevdigere. Ew sazûmana deshilatiyê neçarî du tercîhan dike: Êrişbirin an jî êrişnebirina ser xwepêşandêran.

Gava makîneya ku xwe pal daye ser ewlekariyê, ji hev dikeve, bêserûberî tesîrê li stûnên din ên deshilatiyê jî dikin : li partiya gerînende, li olîgarşiya karsaziyê, û helbet, li artêşê jî. Destwerdana ji aliyê gel ve dibe xwedî tesîra jihevqutkirina demûdezgehên xizmetê ji bo rejîmê dikin û xwe weke xizmetkarên dewletê nîşan didin– di serî de artêş. Dûrxisti ji wezîfeya pêkanîna nîzamê, artêş dikare rola temînata pêvajoya derbasbûnê bicih bîne. Gelek pir û tengerê hene di navbera artêşê û navgîna ewlekariyê de. Ev pir gelek caran ji aliyê şefên serwîsên saloxdariyê ve tên sazkirin, mesela li Misirê Omer Silêman , li Cezaîrê general Mûhamed Tewfîq Medîne ev yek kir. Ev kes bi vê rola xwe karûbarên herî girîng ê pergala siyasî dimeşînin.

Li vir girîng e ku desteka bi tesîr a artêşên tunisî û misirî ya di serkeftina şoreşên her du welatan de were desnîşankirin. Weke piraniya rêveberên ereb ên di qişleya eskerî ya qesra serokatiyê re derbas bûne, Zeynel Abidîn Bîn Alî jî ji hestên bi coş ên mirovên bi kakî pir ditirsiya. Ji kêliya ku hilkişiya deshilatiyê di 1987an de, artêş neçar mabû hejmara eskeran daxe û ji hin derfetên madî jî feragatê bike, û herî dawî jî hin endamên payebilind ji wezîfê dûr bixe. Bûyera neronîkirî ya qezaya helîkoptera ku di 2002yan de bûbû sedemê mirina general Abdulezîz Skîk û gelek subayên din ên payebilind, wekî din bû sedem ku di navbera qesra Carthage û saziyê (2) de ewrên bi guman bi gewde bibin. Demeke dirêj dûrmayî ji biryarên siyasî, û heta, di salên desthilatiya Bourgîbayê de jî (1957-1987), artêşê dest werneda nav jiyana aborî ya welêt û bi awayekî xwezayî tevlî nava karên qirêj ên rizandina rejîmê jî nebû.

Esker di hemû karûbarên mezin ên welêt de dibin xwedî par, şirketên mezin birêve dibin, û di kabîneyên wezîran de jî cih digirin.

Herçi artêşa misirî ye, ew ji 1952yan ve, ango ji dema şoreşa subayên azad û vir ve li ser desthilatdariyê ye. Albay Cemal Abul Nasir, ku weke xwediyê 85 lîrayên misirî, mir, wî projeyeke pir bi coş a pêşveberina civakî û aborî ya ji bo welatî xwe û hemû cîhana ereban hebû. Îdeolojiya wî ya neteweperest ji ber vê yekê coşeke wisa mezin da gel ku, tevî têkçûnên wî yên di warê gerandina siyasî û binpêkirina azadiya derbirînê de jî gel lê borî ango ew efû kir. Xelefê wî Enwer Sedat bi xwe, ku ew jî ji nava artêşê dihat û heyranekî lîberalîzma di bin xizmeta burjûwaziya xwînmij de bû, çanda rizandinê bipêş xist û artêş jî bi xwe ve girê da : bi îmzekirina peymana Kamp Davîdê ya di 1978an de, piştî ku wî ji artêşê "serfiraziya" şerê cotmeta 1973yan ê li dijî Îsraîlê (şerê Kîpûr) dizî, îmtiyazên mezin ên aborî danê da ku wê berkevî (marjînal) bike.

Di deh salên dawî de, hêrs û kîna eskeran a li hemberî Mûbarek mezinbû. Artêşê rexneyên giran lê dikir ji ber ku wî alîkarek ji bo xwe tayîn nedikir, ku ev yek ji bo paşeroja welêt xetereyek bû, û ji ber ku wî bi serhişkî hewl dida ji bo xelefiya xwe kurê xwe Cemal (3) derne pêş. Artêşê ti rewatiya xelefiya kurê wî nas nedikir ji ber ku tiştekî wisa wê rola "qralçêkeriyê" ji destê wê deraniya. Axirî, serok dibû sedema kêfnexweşkirinê ji ber ku destûr dida derdoreke teng a karsazên ku bi aramanca zêdetir dewlemendiyê bi dest bixin li dora kurê wî dibûn çeper.

Rojên beriya hilweşîna rejîmê, cudahî û nakokî xwe didin der : di vê rewşê de divê artêş dîsa berdewam destekê bide Mubarek an jî wî neçarî îstîfayê bike? Lihevkirin giraniya xwe dide ser tercîha duyem, lê belê artêş weke ku hê jî dudil e ku serok ji wezîfeya wî bêpar bihêle. Daxuyaniyên amerîkî yên bitedbîr û carna jî nakok, hemû ji bo parastina heta kêliya dawî ya aramiya pergalê bû. Bîst û çar saetên dawî, di navbera 10 û 11ê sibatê de, hişt ku artêş li hemberî xwepêşandêran pir bi bêhnfirehî tevbigere û rê ji wan re veke da ku karibin bikevin nava hin avahiyên sembolîk ên deshilatiyê (Parlement û Qesra Serokatiyê), û bi awayekî van dezgehan weke sedema bingehîn a hilweşandina rejîmê bidin xuyakirin. Bi vê yekê re artêş careke din dibû xwedî rola "qralçêker"; lê belê, vê carê, wê xwe dikir sazûmankara tevahiya nîzama siyasî û xwe dixist bin barê avakirina pergaleke demokratîk. Destwerdana wê dihat hêvîkirin, lewre weke pêwist dihat dîtin ji bo parastina pêvajoya serûbinbûna navxweyî ya dengeyên herêmî û derveyî (Îsraîl, Dewletên Yekbûyî, welatên ereb û Îran jî) yên ku wê karibana bibin sedema jiberbirina pêvajoya derbasbûnê.

Ferqa mezin di xwezaya destewerdana eskerî de veşartî ye: li Tunisê, artêş ji bo gel biparêze dest werda rewşê; wê zext li Ezedîn Bin Alî kir da ku desthilatiyê berde û here, û jixwe dosta wî, Amerîkayê jî wisa dixwest. Artêşa misirî bi xwe, li destpêka bûyeran, hewl da giraniya xwe deyne holê ji bo ku valahiya ewlekariyê ya li kolanê dagire. Di pey re jî, ew ma bêalî, gava ku mîlêsên Mûbarek êriş birin ser xwepêşandêrên li qada Tehrîr. Erê, wê gule reneşandin ser girseya gel; lê belê wê rê li gulereşandina kesên din jî negirt. Herî dawî , wê biryar da benê xwe ji rejîma li ber mirinê qut bike û pergalê biparêze.

Li Cezaîrê, li bin serokatiya Houarî Bûmedîn (1965-1978) e ku rola siyasî ya fermandariya giştî ya artêşê, bi xwenîşandana Ewlekariya eskerî (SM), xwe îfade dike. "Qralçêker", ew bi xwe ye. Di her valahiya siyasî de, Ewlekariya eskerî (SM) dest wer dide da ku bavîtiyê bike ji bo nîzama ku bi awayekî bebiçav digihîje aramiyê, helbet eger mirov têkçûna 1991ê, û encamên wê yên kambax nehesibîne. Bêguman artêş bi xwe bû ya ku Abdulezîz Bûteflîka di 1999an de hilbijart. Lê belê îşaretên pêşî yên cudatiya navbera serwîsên saloxdariyê û artêşê di 2004an de xwe didin xuyakirin, gava ku yên pêşî li dijî serfernandarê giştî yê eskerî Mûhamed Lamarî, jinûve hilbijartina Bûteflîka organîze dikin. Weke ku Mustafa Mûhamed jî dinivsîne; *"2004 xweserbûna serwîsên saloxdariyê û serdestiya wan a li hemberî artêşê (4, îfade dike)"*. Bi hatina Bûteflîka re bi temamî winda dibe hêviya rizgarkirina karûbarên siyasî yên ketine nav lepên serwîsên saloxdariyê yên ku êdî desthilatdar in. Artêş, bêî ku bibe sedema valahiyeke di nava sîstemê de, nikare xwe ji nava karûbarên siyasî vekişîne, lê belê ew bi xwe jî xwe nalivîne ji bo bicihanîna tiştekî ku karibe bibe destpêka pêvajoyeke demokratîk.

Di nimûneya Cezaîrê de, lihevgihandina navgînên eskerî û ewlekariyê, şîlobûna wan û kontrola wan a li ser siyasetvanan a bê fay zêde dike. Di vê modela "idéal" a securîtokrasiyê de, berpirsiyarên birêvebirinê, serok û hikûmet ji ber vê yekê zêde têkilî birêvebirinê nabin. Rewşa neamade ya muxelefeta sist û bêlebat jî dibe zemîn ku guherîn ancax dikare di nava sîstemê de bipêşkeve, lê belê kêm caran hatiye dîtin ku sazûmankarê nîzamê destekê bidin veguherînên ku zirarê bidin statuya wan bi xwe. Ji ber vê yekê niha hêviyeke heye ku weke aktor " gel " bi xwe bibe dînamîkeke ku rejîmê ji hev bixe, mîna ku ev yek li Tunis û Misirê îro xwe ji nû ve dide xuyakirin: ewê navgîna ewlekariyê û ya eskerî neçar bihêle ku biryarê bidin ka ewê guleyan bireşînin an jî nereşînin ser gel.

Li Libyayê jî, tevî şîlobûna pergalê, artêş pêvajoya sê dehsalên dawî hat berkevîkirin û "komîteyên şoreşger" hatin çalakkirin. Wargehên eskerî bi awayekî, surgunî çolteran hatin kirin da ku di wext de pêşî were girtin li her dilbijiyeke siyasî ya di nava gewdeya artêşê de. Rojên destpêkê yên perçiqandina xwînrij a ku fermana wê ji aliyê albay Qadafî ve hat dayîn, hin veqetîn çêbûn û zilamê wî yê xurt, general Ebû Bekir Yûnis Cebar, di bin çavdêriyê de bû. Xurtkirina sîstema ewlekariyê ya ku pala xwe dide yekîneyên taybet î dilsoz bi Qadafî re, wekî din bikaranîna eskerên kirêkirî yên afrîkî, nîşan didan ku dîktator ne tenê bi gelê xwe, her wiha bi artêşa xwe jî ewle nabin.

Piştî şoreşên li Misir û Tunisê, artêş niha hatiye pozîsyona diyarkirina şertên xwe ji bo vegereke ser deshilatiyê. Vê gavê, ti rewşeke şikbar a têkildarê dilbijiya wê ya ji bo deshilatiyê tine. Li Misirê, artêşê, weke dezgehekê, li ser biryareke kollektîf, bi palpişta serhildana gel mudexele kir, û vê yekê wê nehişta ku ew biçe wêdetirî sînorên ku wê ji xwe re destîşan kirine (5). Jixwe wê jî lez da xwe ku pêvajoyê vegerîne deshilatiyeke sîvîl.

Ev vegera li deshilatiyê muhtemelen wê bi peymaneke navbera sîvîl û eskeran pêk were, weke ku ev yek li welatên din jî wisa çêbû, û hişt ku esker karibin xwe ji êrişên bersivdanê xwe biparêzin (6). Di vê rewşê de artêşa misirî eynî weke li Cezaîrê, eger guherînek were rojevê, di encama muzakereyan de bi îhtîmaleke mezin ewê îmtiyazên aborî bi dest xwe ve bîne.

* Gerînendeyê lêkolînê li Înîsiyatîfa Arab Reform; gerînendeya îcrakar Înîsiyatîfa Arab Reform.

1* Bi rasthatina civîneke siyasî di adara 2008an de ku bi beşdariya gelek endamên ewlekariyê û civaka sîvîl ji bo guftugokirina reformên vî warî ji aliyê ARIyê ve hat organîzekirin.

1 Haydar Ibrahim, "Al amnocratiya fil sudan", berhemeke kollektîf a li ser "securîtokrasiyan" a ku bi erebî û ingilîzî wê were weşandin, Arab Reform Initiative, Amman, mijdar 2011

2 Lêpirsîneke nû wê were vekirin, li gorî rojnameya *Al-Sabah*, Tunis, 22 çile 2011

3 *Cf.* Virginie Collombier, "Egypt: the day before, the day after", Arab Reform Brief, février 2011, www.arab-reform.net

4 Mustapha Mohamed, "Dewlet, ewlekarî û reform li Cezaîrê", wê derkeve (*cf.* note 1)

5 Amr Abdelrahman, "Why fear the military?", *Al-Masri Al-Youm*, Le Caire, 17 sibat 2011, www.almasryalyoum.com/en

6 Stéphane Boisard, Armelle Anders et Geneviève Verdo, "Amerîkaya Latîn a rejîmên eskerî", *Vingtième siècle*, n° 105, Paris, çile-adar 2010, rûp. 3-14

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## Kokên karkerî yên serîhildana misirî

# Li Misirê şoreşa piştî şoreşê

Raphaël Kempf *

Grevên pirhejmar amadekarîya tevgera 25ê çileyê kir. Bi pey hilweşîyana Husnî Mubarek, karker daxwaza başkirina mercên xwe yên jîyanê û mafê xwerêxistinê dikin.

**Mihemed Ferîd Saad** çend gavan dûrî meydana Tehrîr a Qahîreyê, li ser dîreksîyona maşîna xwe ye û bi kesên li ser rê yên pêşîya wî digirin re diqehere: "*Êdî bes e, bes e! Em ê heta hetayê şahîyê nekin! Divê welat ji nû ve bê ava kirin, divê kar bê kirin!*" Bi gotina stranan û bi lêxistina amûrên ku wan, kêm zêde, ji xwe re li hev anî, van mirovên li ser rê şeveke dirêj a şahîyê li dûv xwe hişt. Vê şemîya 12ê sibatê, danê sibê zû Misir ji şeveke dirêj a sîh salan dirêj hişyar bû. Êvara berî vê rojê **Husnî Mubarek** çû *Şarm el-Şêxê* û îqtîdar jî bo Konseya Bilind a Hêzên Çekdarî hat spartin. Daxwaza sereke a xwepêşandêran hat bi cih anîn: *Reîs* çû. Wisa xuya bû ku şoreş bi dawî hatibû.

Saad xwedîyê fabrîkeyeke piçûk a zemqên pîşesazîyê ye û wê bi rê ve dibe. Yedekên malekî amerîkî hildiberîne û fabrîke li taxeke xizan a Qahîreya kevin e. Vê sibeha şoreşê, dema ku patron bi carekê kete hundirê fabrîkeya xwe, bi qasî 15 karkeran –piranîya wan jin ku hin ji wan gelekî ciwan in– li ser kar bûn. Ew bi vê şoreşê kêfxweş e. Ew pê bawer e ku ji niha û pê ve welat wê cidîtir û baştir bê bi rê ve birin û baştir bê organîze kirin, ku karkerên wî wê bêhtir berpirsiyar bin û herweha ku wê bertîlxwarin jî kêmtir be: Berê, diviyabû mirov bexşîşê [ev peyv ji bo bertîlê hatiye bi kar anîn] bide mufettişên dewletê yên ku ewlekarîya tenduristîyê û şert û mercên kar kontrol dikirin. Xuya ye ku karkerên wî jî bi ketina reîs kêfxweş in, lê belê ew herî zêde serê xwe bi mûçeyên xwe diêşînin. Mûçeyê wan niha li derdora 500 lîreyên Misirê (LM) ye, ev mîqdar bi gelekî dûrî mîqdara 1 200 LM ye ku tevgera çepgir doza wê dike.

Ev daxwaz ne beşek ji "bernameya" şoreşê bû, çawa ku nivîskarê romana *Taxi* (1) **Khaled al-Khamissi** terîf dike. "*Armanceke zelal û aşkere ya vê şoreşê hebû: Demokratîkkirina jîyana siyasî ya misirî, ji desthilatdarîyê xistina Mubarek, reforma destûra bingehîn, fesihkirina parlemanê û pêkanîna hilbijartinên bi rastî.*" Ew dîsa jî girîngîya tevgerên civakî, ango grevên karkeran ên van salên dawîyê, yên ku daxwazên wan ne siyasî, belê bêhtir civakî û aborî bûn, qebûl dike: "*Di navbera van tevgeran û şoreşa 2011ê de misêwatîyek heye.*"

11ê Sibatê roja înê, di qahwexaneyeke çend metre dûrî meydana Tehrîrê de, bîstekê piştî nimêjê û berîya ku were ragihandin Mubarek çûye, komeke piçûk a întellektuelan li ser rewşê nîqaşê dikin. Doktorê zarokan ê li derdora pêncî salan emr kiriye, yek ji endamên kevin ê têkoşîna xwendekaran û milîtanê Rêxistinên ne bi ser Hikûmetê (NGO) **Alaa Şukrullah** rojnameyê bi dengekî bilind dixwîne. Ew lîsteya fabrîke û şîrketên ketî grevê dineqîne: Karkerên riyên hesinê, yên sektora petrolê, yên wezareta çandinîyê, yên filan şîrketa avê, ya otobûsan... Ji çend rojan û vir ve, piştî ku "*banga li hevalên me yên karker ên misirî*" ya deh rêxistinên çepgir 9ê sibatê ji bo daxwaza adaleta civakî, sînorê mûçeyê herî kêm yê adil û munasib, demokrasîya li cihê kar, azadîya sendîkayî, û hwd kirî, bihîstin –yan jî nebihîstin–, karker û karmend jî tevlî nav refên tevgerê bûn. Di bangê de alîyên helbestî derdikevin pêş: "*Karkerên misirî, hûn beşek ji vê şoreşa mezin a gel in, têkoşîn û şerên we yên van salên dawîyê zemînê vê şoreşê amade kir.*"

### "Rola karkeran di şoreşê de tunebû"

Ji bo birêveberê Navenda Misirî ya ji bo Mafên Aborî û Civakî, parêzer **Xalid Elî** "*yên ku tevgera 25ê çileyê dayî dest pê kirin, karker nînin, lewra struktureke wan a ku jê were wan bi rêk bixe, nîne.*" Lê belê "*dema ku wan dest pê kir protesto bikin û ji daxwazên siyasî û wê de, rengekî aborî û civakî bidin şoreşê, yek ji qonaxên girîng ên vê şoreşê hat derbas kirin.*"

Ciwanên çîna navîn ên bi riya Facebookê bi hev re têkilî danîn û ji alîyê çapemenîyê ve weke qehremanên vê şoreşê hatin dîtin, bi vê analîzê re hemfikr nînin. Li gor **Ehmed Mahir** ê 30 salî, muhendis û koordînatorê giştî yê tevgera 6ê nîsanê "*rola karkeran di şoreşê de tunebû. Ew jê dûr bûn.*" Tevgera wî ya ku bi tenê daxwazên siyasî û demokratîk dike, di destpêkirina pêvajoyê de bi roleke tayînker rabû. Tevger ji 2009ê ve xwepêşandanekê her 25ê çile –roja cejna polêsan– li dar dixe da ku doza azadîya siyasî bike. Ya 2011ê li gor wî biryardar bû.

Erê rast e, navê tevgerê ji bangeke grevê tê, ku karkerên fabrîkeya herî mezin a welêt, a şîrketa Misir Qumaş a li Manellah el-Kubrayê li navenda Delta Nîlê, 6ê nîsana 2008ê dabû dest pê kirin (2). Hingê qahîreyîyên ciwan bi karkeran re rûniştin û biryar dan li ser Facebookê "tevgera ciwanan a 6ê nîsanê" bidin dest pê kirin. Lê belê vê rêxistinê wê bi lez û bez xwe ji daxwazên civakî dûr bixista da ku bi tevahî bi pirsgirêka demokratîkbûnê re mijûl bibe.

### Peydabûna çanda rexne û daxwazan

Van salên dawîyê têkoşîn û şerên karkeran bi roleke biryardar rabûn. Ev têkoşîn di tevahîya sektoran de mezin bû û kir ku li Misirê çandeke rexnekirin û daxwazan peyda bibe. **Xalid Elî** dest nîşan dike ku "*di 2010ê de yek roja bi tenê jî nebû ku li welêt herî kêm sê tevgerên protestokirinê çênebin.*" Li gor kevne-karker û birêveberê Navenda xizmetên ji bo sendîkayan û karkeran **Kemal Ebbas** "*van tevegeran fikra ku dibêje, grev dikarin werin kirin, bi cih kir.*"

16ê sibata bihurî, tevî danezana Konseya Bilind a Hêzên Çekdar ya di televizyonê de hatî weşandin û ji telefonên destan re hat şandin, a ku banga rawestandina tevgerên civakî dikir jî, li fabrîkeya Misir Qumaşê kar hat rawestandin. Karkeran li fabrîkeyê kon vegirtin –çawa ku li meydana Tehrîr a Qahîreyê jî kon hatibûn vedan– û li fabrîkeyê razan. Wan daxwazên xwe bi dîwaran ve kirin. Daxwaza pêşî: Jikarderxistina serokê şirketê **Gîlanî** yê ku bi bertîlxwarinê tê gunehbar kirin. Daxwazên din der barê zêdekirina mûçeyan, prîman, misogerkirina xaniyên ji karkeran re û herweha şert û mercên kar de ne. Karker pir bi newekhevîya hundir a şirketê dihesin. Weke mînak, ji ber ku hema bêje belaş, xanî li hîyerarşîya şirketê tên belavkirin, lê belê ew neçar in li navenda bajêr bi buhayê bazarê dayreyan kirê bikin, karker gazinan dikin.

**Amal** a 28 salî ya ku ev 13 sal in li fabrîkeyê kar dike, mehê bi giştî 300 LM bi dest dixe. Bi dilê wê ye, di dayreyekê de ku şirket kiriya wê bide, bimîne. Û ew weke hemû karkerên din gazinan dike, ji ber ku "*bi milîm*" mûçeyê wan tê dayîn. Ango ji dehan yekê qirûşekê yê pereyê di serdema melik Farûq de di salên pêncîyê de dihat bi kar anîn. Bordroya mûçeyê karkerekî din nîşan dide ku ew mehê 290 000 milîman ango 290 LM bi dest dixe. **Mihemed el-Metwallî Îgazî** yê 39 salî yê ku panzdeh sal in li fabrîkeyê kar dike, mehê li derdora 500 LM bi dest dixe. Ew dixwaze ku sînorê mûçeyê herî kêm, "*çawa ku Dadgeha Bilind a Destûra Bingehîn jî biryar dabû*" weke mehê 1200 LM bê diyar kirin.

Ya rastî, dadgeha qala wê hat kirin, Dadgeha Îxtîlafên Birêveberîyê ye ku ser bi Konseya Dewletê ve ye. Vê dadgehê bi biryareke 30ê adara 2010ê li ser dewletê ferz kir ku mûçeyekî herî kêm diyar bike, yê ku di wê astê de be, bike ku mirov jîyaneke bi rûmet bijîn (3). Vê biryarê kiribû ku tişta wî wextî rojnameyan jêre "şerê mûçeyan" digot, derkeve holê (4). Hikûmetê ev biryar pêk neanîbû; ango mehê 1200 LM armanceke têkoşîna civakî ya li welêt dimîne.

Ev daxwazên karkerên Manellahê nehatibûn bi cih anîn. Piştî çend rojên grevê, 19ê sibatê di navbera birêveberîya şirketê, walîyê eskerî û heyeteke karkeran de hevdîtinek pêk hat. Eskerîyê danezana pêşî ragihand ku gelekî jê re li çepikan hat xistin: Serokê şirketê ji kar hat derxistin û muhendisekî baş tê nas kirin û jê tê hez kirin **Ehmed Mahir** li şûna wî hat bi cih kirin. Heqdestê rojên grevê wê bê dayîn û li ser zêdekirina mûçeyan jî kar tê kirin. Karker **Mahirî** bi ser dixin. **Mahir**ê din, yê Tevgera ciwanên 6ê nîsanê, karker wî nas nakin. Weke li Tehrîrê, wan jî serê serokê şirketê jêkir û ji mêvanan re dibêjin, tu elaqeya çalakîya wan bi şoreşa Misir hejandî re nîne. Dîsa jî weha xuya ye, heke şoreş pêk nehata, ev grev û gelek grevên din wê çênebûna.

### Husnî Mubarek, ji me re bêje, pereyên me li ku ne

Tevî ku mirovan bawer kir ku ji desthilatdarîyê xistina Mubarek wê tevgerên civakî kêm bike jî, welêt ecele dikir li jîyana normal vegere, riyan û herweha sîstemê paqij bike. Çend rojan piştî ku şoreş bi dawî hat, gelek grevan û xwepêşandanên din ên sektoran dest pê kir. Hingê her fabrîkeyê, her wezaretê û her şirketê daxwazên xwe kirin. Di sektorên petrol, gaz û polayê de, li posteyê û li nav şofêrên ambûlansan grev û xwepêşandan pirqat bûn û armanca wan jî para bêhtir daxwaza dawîlêanîna erka serokê şirketê yan fabrîkeyê, yan jî wezîr bû. Polêsan bixwe jî li navenda Qahîreyê li pêşîya wezareta karê hundir û li bajarên mezin ên welêt xwepêşandan li dar xistin da ku doza zêdekirina mûçeyê xwe bikin. Piştî çûna Mubarek, xelkê welêt li bendê ye dewlemendîyên welêt ji nû ve bên dabeş kirin û vê yekê jî didin zanîn. Heta bi şofêrê taksîyê jî pê bawer e ku pere wê werin û yek ji sloganên li meydana Tehrîrê hatî bihîstin, dibêje: "*Husnî Mubarek, ji me re bêje, pereyên me li ku ne!*"

Bispor di rûpelên "nîqaşê" yên rojnameyan de bersivê didin wan. Ew rave dikin ku hê pir zû ye, ji nû ve dabeşkirina dewlemendîyan divê hêdî hêdî pêk bê. Du ekonomîst vê îdîayê dikin: "*Grevên karkeran... tehlûkeyek e ku gefan li aborîya misirî dike.* (5)"

Ev îqaz pir nayên bihîstin, lewma şoreşê peyv azad kir. Heta û berîya her tiştî, di sektorên ku berîya 2011ê tu grev li wan pêk nehatî, misirî êdî doza mafên xwe dikin.

Şirketa dewletê Nasr Asmîda li qada îndustrîyel a fireh a çend deh kîlometreyan dûrî Suezê, dermanên ji bo parastina çandinîyê û kuştina kêzikan hildiberîne. Şirket mezin e û xuya ye dewlemend e. Gelek xane ji bo karkeran hene, neweşxaneyek lê heye û mûçe para bêhtir ji 1200 LM dibihurin ku li deverên din doza wê tê kirin. Dîsa jî 13ê sibatê du sed xebatkar tevlî xwepêşandanekê bûn –belê hilberîn ranewestandin. Armanca daxwaza wan a yekemîn serokê şirketê Adel el-Mûzî ye. Adel el-Mûzî bi bertîlxurîyê tê gunehbar kirin û karker dixwazin bibînin ku ew tê dadgeh kirin. Wan herweha xwest fabrîkeyeke moderntir bê ava kirin.

Teknîsyen **Nabil Fehmî** weha dipeyive: "*Ji ber ajanên îstîxbarata ewlekarîya dewletê, ne mumkin bû hin tişt berîya şoreşê bihatana kirin. Êdî em dikarin xwepêşandanan li dar bixin. Îroj, azadî heye, artêş me diparêze. Berê, ne mumkin bû em bi serokê konseya birêveberîya fabrîkeyê re rûnin; îroj ev dibe. Berîya şoreşê pir kêm mirov diaxivîn; niha em dikarin biaxivin, rûnin û li ser pirsgirêkên şirketê nîqaşê bikin.*" Tiştekî kêm û seyr nîne, ku mirov bibihîse xelk behsa "azadîya xweîfadekirinê" dike û karker wisa his dikin hîyerarşîya wan serê xwe bi wan diêşîne, lê belê berê qet ew hesab jî nedikirin.

19ê sibatê parêzerên Navenda Misirî ya Mafên Aborî û Civakî daxwazek ji desthilatdarîya eskerî ya karûbarên welêt bi rê ve dibe, kir. Navendê xwest, çawa ku divê li gor Destûra Bingehîn a misirî jî diviyabû hebe, mûçeyekî herî zêde were diyar kirin da ku qelşên di navbera xizanî û dewlemendîyê de werin piçûk kirin. Li gor **Khaled al-Khamissi** "*şoreş bi dawî nehatiye, hê nû dest pê kiriye*".

* Hiqûqnas

1 Wergera ingilîzî: Khaled Al-Khamissi, *Taxi*, wergera ji erebî Jonathan Wright, Aflame Books, London, 2008

2 Bixwîne: Joël Beinin, "L'Egypte des ventres vides (Misira Zikvala), *Le Monde diplomatique*, gulan 2008

3 Dadgeha Îxtîlafên Birêveberîyê, 30ê adara 2010ê, serlêdana hejmar 21606/63

4 *Al-Masry Al-Youm*, Qahîre, 6ê nîsana 2010ê

5 *Al-Ahram*, Le Caire, 16 février 2010

Wergera ji Fransî: Luqman Guldivê

## Sê mêrên bi hêz

**22yê hezîrana 1952yê**: Efserên Azad ên di bin rêveberîya Cemal Abdul Nasir de, melik Farûqî ji desthelatê dixin.

**1956:** 26ê tîrmehê, Nasir şirketa kanala Suezê dike malê dewletê. Li ser vê yekê, Fransa, Brîtanya û Îsraîl êrişî Misirê dikin.

**Hezîrana 1967ê**: Şerê li dijî Îsraîlê.

**28ê eylûla 1970yê**: Mirina Nasir. 15ê çirîya pêşî, Enwer el-Sedat dibe xelefê wî.

**6ê çirîya pêşî ya 1973yê**: Destpêka şerê di navbera Misir, Sûriye û Îsraîlê de.

**18-19ê çileya 1977ê**: Serhildanên ji ber xelayê.

**19-11-1977**: Gera Sedat ya li Qudsê.

**17-09-1978**: Îmzekirina rêkeftinên Camp Davidê di navbera Misir û Îsraîlê de.

**26-03-1979**: Peymana aştîyê di navbera Misir û Îsraîlê de. Yekîtîya Erebî Misirê dike der.

**06-10-1981**: Sedat tê kuştin. Husnî Mubarek cihê wî digire.


**25-02-1986:** Artêş serhildana xwendekarên akademîya polîsan serkut dike.

**Kanûn, 2007:** Greva cemawerî ya memûran.

**Nîsan, 2008:** Serhildanên ji ber bûrsê û grevên karkeran.

**Çile-Sibat 2011**: Xwepêşandanên cemawerî û îstifakirina serokdewlet Mubarekî.

Wergera ji frensî: Ergîn Opengîn



# Birayên Misilman û "hatina nav nîzamê"

GILBERT ACHCAR *

Serhildana li Misirê ya ku piranîya pêşbînîyan serûbin kir, ji alîyê koalîsyona hêzan ve –partîyan, weqfan, tevnên bikarhênerên înternetê– di bin pêşengîya yên laîk û demokrat de, hat daf dan û bi rê ve birin. Rêxistinên li ser xeta îslamî û endamên wan bi nasnavên xwe yên şexsî, berî ku serhildan dest pê bike, tevlî vê tevgerê bûn, lê belê li ser zemîneke wekhev, li gel rêxistinên piçûk î marjînal û komên ji partîyên girseyî an jî pêşengên şoreşger, kesayetîyên nas ên şoreşên civakî bêhtir, nêzî muxalîfên sala 1989ê yên ewropîyên rojhilat.

Eger di serhildana tûnisî de, îzaha veşarîbûna tevgera îslamî karibe xwe bispêre hovîtîya zextûrepta ku li pêşîya qabîlîyeta xwelivandina partîya Ennahda dibû asteng, bi awayekî paradoksal nifteya helwesta bizdîyayî û melisî ya Birayên Misilman ên Misirê jî xwe dispêre statuya partîya wan a ku rejîm bi tolerans nêzî wê bûye.

Gava li pey mirina **Cemal Abdul Nasir**, di îlona 1970yê de **Enwer Sedat** hat ser deshilatê, destûr û han da rêxistina oldar da ku vegere qada gelemperîyê û weke giranîyeke dengeyî li hemberî çepê alîgirê Nasir an jî radîkal, hêza xwe mezintir bike. Birayan bi temamî xwe berda nav çerxa lîberalîzasyona aborî (*infitah*) ya ku ji alîyê gorkolerê nasirîzmê ve tê zîvirandin û ev yek bi awayekî sosyolojîk bi bandora mezin a li ser wan a endamên bûrjûwazîya nû ya Misirê, tê îzah kirin. Li gel vê yekê jî li dijî rizîn û bêexlaqîya sînornenas, ew dev ji nirxên xwe yên olî jî bernadin. Û ev herwiha dibe yek ji palpiştên wan ên bingehîn li ba tebeqeyên civakî yên burjûwazîyên piçûk, ên ku girseyên wan ên herî dilsoz in.

Rêxistina Birayên Misilman weke tevgereke siyasî ya kevinperest û olî hat ava kirin û xema wê ya sereke ew bû –û hê jî ew e– ku dezgehên siyasî û çandî yên misirî bike îslamî û nirxên şerîetê weke çavkanîya sereke ya qanûnî bide qebûl kirin. Bernameya wan bi awayê herî kurt di vê dîruşmeya wan de xwe îfade dike: *"Çareserî Îslam e"*. Lê belê wê herwiha li dijî komikên tundrew û şîdetkar, weke panjehra siyasî xizmet kir.

Li alîyê din, Sedat ji bo bi awayekî îdeolojîk rewakirina desthilata xwe li hemberî nerazîbûnên civakî û neteweperest, ti caran dev ji bikaranîna karta olî bernedabû. Xelk ji peymana aştiyê ya ku adara 1979ê (kêmtirî şeş hefteyan piştî şoreşa Îranê) bi Îsraîlê re hat mohr kirin pir nerazî bû. Ji bo telafîkirina bandora vê peymanê, tevî ku hindikahîyeke xiristîyan a têra xwe mezin li Misirê heye jî, ji bo ku nirxên şerîetê weke *"çavkaniya sereke ya her qanûnê"* tê de bide nivîsandin, Sedat destûra bingehîn guherand.

Lê belê vê tawîzê jî têrê nekir ku Birayên Misilman destekê bidin peymana di navbera Îsraîl û Misirê de.

Ji ber vê yekê hingê Sedat ji bo şikandina tesîra wan biryarê dide, derbekê li wan bixe. Di 1981ê de, çend meh berîya ku ji alîyê endamên komikeke tundrew a xeta entegrîst a îslamî ve were kuştin, ew pêleke mezin a girtinê li dijî wan dide dest pê kirin. Demeke kin piştî xwe gihandina erka serokatîyê weke xelefê Sedat, Husnî Mubarek jî birayên misilman ên girtî azad dike. Serê pêşî, serokê nû xwe dixe kirasê mirovekî alîgirê nermî û sadebûnê, ango berevajîyê stîla bi heytehol û şatafat a selefê xwe, tev digere. Ew jî, hewl dide li hemberî Birayan bi nermî tev bigere da ku gel destekê bidiyê û rejîma azadîya li bin çavan a ku Sedat bi armanca kêmkirina leza pêşketina wan, Birayên Misilman, xistibû nav, zexim û mayînde bike.

### Tirsnakîya muhafezekar a pîr û kalan, vîyana ciwanan a daxwazkirina azadîyên siyasî

Di 1991ê de gava, di pêvajoya şerê Kendavê de Misir li dijî Iraqê dikeve nav koalîsyona ku ji alîyê Dewletên Yekbûyî ve tê bi rê ve birin, têkilîyên Birayên Misilman jî li gel rejîmê ditengijin. Ev nakokî lezê dide pêkhatina werçerxeke diyarker a têkilîyên navbera, ji alîyekî ve, Waşîngton û hevalbenda wê Erebistana Suûdîyê û ji alîyê din ve jî, tevgera herêmê ya entegrîzma îslamî ya sunî ya "nerm" a ku partîyên îslamî yên girseyî yên cezayîrî, misirî û tunisî jî di nav de cih digirtin. Li dijber daxwazên meliktîya suûdî ya ku heta niha bi wan re têkilîyên xwe xurt dikirin, ev partî di protestokirina li dijî şer de digihîjin hev. Qutbûna wan a ji Riyadê dibe sedemê zêdebûna zexta ku di salên 1990ê de –bi erêkirina Dewletên Yekbûyî û yên Ewropayê– li ser wan tê meşandin.

Di navbera bizdonekîya kevingir a rêveberên xwe yên herî bi temen û zexta hin kadroyên xwe yên ciwantir ên ku dixwazin ji bo azadîyên siyasî rêbazeke çalaktir were meşandin, di van deh salên dawîyê de her du lingên Birayan ketin solekê. Tevî ku di çalakîyên protestoyî yên demokratîk û neteweyî de zêdetir cih girtin jî, hewl dan nebin hedefên tîrên birûskên rejîmê. Endamên wan bi wî awayî dikevin nava tevgertevna Kefaya "Bes e êdî", ku di dema piştgirîya Întîfadaya filistînî de derket holê, dûre di nav muxalefeta li dijî şerê 2003ê yê Iraqê de bi pêş ket, herî dawî jî bû hêzeke dijberîya li hemberî xisleta dîktatorîyal a desthilateke ku hêdî hêdî xwe vediguherîne xanedanekê.

Alîgirên siyaseteke wêrektir, bi taybetî piştî ku li Tirkiyeyê partîyeke misilman a muhafazakar Partîya Dad û Geşedanê (AKP) di 2002yê de bi rêya hilbijartinan bû desthilatdar, êdî kêmtirstir tev digerin. Ev tecrûbe weke ku îhtîmala pêkanîna modeleke ku heta niha nemumkun dihat nirxandin, teyîd dike. Di çileya 1992yê de di pêvajoya hilbijartinên Cezayîrê de desttêwerdana qebe ya ji alîyê eskeran ve, dûre di 1997ê de li Tirkiyeyê, salekê piştî bidestxistina serokatîya hikûmetê, ji alîyê artêşê ve bi rêya îstîfayeke ferzkirî, berkevîkirina **Necmettin Erbakan**, dihatin wê



GÖKHAN ASLAN: **Liv**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

> Li dawîya sibatê, Birayên Misilman biryar da ku Partîya Azadî û Edaletê ava bikin. Ev milê siyasî wê rê bide wan ku li ser siberoja welêt bibandor bibin.

wateyê ku ji bo partîyên îslamî yên ku desthilata welatên wan di bin kontrola eskeran de ye, rêya parlemanê jî tije kendûkosp in.

Tecrûbeya nû ya tirkan di vê noqteyê de sînyala xurt a guherînekê dide û Waşîngton û Yekîtîya Ewropî vê pêla nû diecibînin. Ji ber ku di 2004ê de sedema aşkerekirî ya dagîrkirina Iraqê (hebûna çekên qirkirina girseyî) pûç bû, rêveberîya Bush niha jî ji bo siyaseta xwe ya nû ya li Rojhilata Navîn "teşwîqkirina demokrasîyê" weke bahane nîşan dide. Û dengên kêfxweşbûyî bi veguherîna tetmînkar a tecrûbeya tirk, li Waşîngtonê bilindtir dibin ji bo ku rêveberîya DYAyê beramberî Birayên Misilman ên misirî jî bibe xwedî helwesteke vekirîtir. Mubarekê ku xwe li ber zexta Waşîngtonê negirt, di hilbijartinên 2005ê de pêşî li pirdengîyê vedike û zêdetir kursîyan dide partîyên muxelîf ku di nav wan de ya sereke rêxistina Birayên Misilman e. Reîs bi vî awayî hêvî dike nîşan bide ku hilbijartinên azad ên li Misirê ji kesên din bêhtir wê bi kêrî wan bixwe bên. Piştî çend mehên din, di çileya 2006ê de, serkeftina hilbijartinî ya Hamasa filistînî jî dawî li helwêsta rêveberîya Bûsh tîne; helwêsta ku dixwaze bi giştî li herêmê û bi taybetî jî li Misirê "demokrasîyê bipêş bixe".

Hatina **Barack Obama** a ser kursîyê serokatîya Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê, axaftina wî ya li Qahîrê ya 4ê hezîrana 2009ê ku tê de desteka xwe ya ji bo demokratîkkirina herêmê tîne ziman, bi awayekî ku pê weke ku hemkarê xwe yê misirî piçûk dixe, muxelefeta li dijî Mubarek sor û gur dike. Piştî çend carên dudilîyê, Birayên Misilman li bin banê komeleya neteweyî ya ji bo guherînê û bi derxistina pêş a rûçikê **Mohamed El Baradeî**, di sibata 2010ê de xwe dikin nûnerên koalîsyonekê ku bi giranî ji lîberalan pêk tê.

Li gel vê çendê jî, piştî çend mehên din, guh nadin bangên muxelefeta lîberal ên ji bo boykotkirina hilbijartinên parlamenterîyê yên mehên mijdar-kanûnê, bi hêvîya ku di encamê de ji nû ve beşeke mezin a kursîyên di destê xwe de bi dest bixin, beşdarî tûra pêşî dibin. Encam tercîheke din danayne ber wan ji bilî boykotkirina tûra duyem. Ji 88 kursîyên wan ên dewreya berê bi tenê yek dimîne.

Ev hilbijartin dibin sedemên fûrîna hêrsan li welatekî ku tê de % 44ê xelkê, bi kêmtirî 2 dolaran debara xwe ya rojane dike û burjûwazîyeke sînornenas û çavbirçî di nav kêfûsefayeke wekî ya zordar û qralên petrolê yên Kendavê de dijî. Misir bûye mîna barêleke barûdê; Agir ji Tûnisê tê. Tevn û hevkarîyên ciwanên muxelefetê, 25ê çileyê 2011ê ji bo xwepêşandanekê bang dikin. Careke din, ji tirsa ku rejîm wê xezeba xwe bibarîne ser wan, Birayên Misilman, biryarê didin tevlî xwepêşandana vê bangê nebin; ew ancax roja sêyemîn tevlî tevgerê dibin û biryarê didin ku hêza xwe ya organîzekirî tevlî nav vê xwepêşandanê bikin. Û dema vê dikin, Birayên Misilman pê re jî ji hemû deman zêdetir pesnê artêşê didin, ji ber ku baş dizanin ku ji bo sererastkirina rewşê, wê bang li vî sîsikê hişk ê rejîmê bê kirin.

### Biratî li dijî "dewleta dînî" û ji bo "dewleta sîvîl bi referanseke dînî" biryarê dide

Gava Mubarek serokê servîsa saloxdarîyê **Omer Silêman** weke alîkarê xwe tayîn dike û ew dawîyê jî banga "dîyalogê" dike, rêveberîya Birayên Misilman hevdîtinê dipejirînin. Bi zêdebûna vê tawîzê li redkirina wan a tevlîbûna nav qonaxa pêşî ya tevgera serhildanê, li ber çavên ciwanên (şebab) serkêşîya serhildanê dikin, Birayên Misilman bêîtîbar dibin. Herî dawîyê jî, gava Mubarek xwe dide alî, Birayên Misilman silav li cûntaya eskerî dikin, jê dixwazin girtîyan azad bike û dawî li rewşa awarte bîne. Û bi vî awayî ew projeya xwe ya avakirina partîyeke legal aşkere dikin.

Rêxistina olî [Birayên Misilman] bi vî awayî kete dorê ji bo destekê bide hewldana "hatina navnîzamê" (*orderly transition*) a ku Waşîngton ji destpêka serhildana misirî ve pesnê wê dide. Birayên Misilman bi vê armancê bi awayekî temînatê dide ku ew ê doza desthilatê neke, tiştê ku ew ê bixwaze wê tenê sûdwergirtina ji mafên demokratîk be. Rayedarekî wê, **Essem El-Errian**, di 9ê sibatê de ji *New York Timesê* re *"tiştê ku Birayên Misilman dixwazin"* wiha îzah dike: *"Dilê me bi tene dixwaze em di qonaxa siyasî ya derbasbûnê de bi rola serdestîyê rabin. Em ê di hilbijartinên serokatîyê yên îlonê de ti namzetan dest nîşan nekin"*. Û gotinên xwe wiha didomîne: *"Birayên Misilman sazkirina dewleteke demokratîk û sîvîl dixwazin, lê belê ne demokrasîyeke laîk û lîberal a mîna amerîkî û ewropî ku hebûna olê ya di nav jîyana giştî de yekcar red dike (1)"*.

Di dema civîneke çapemenîyê ya heman rojê de li Qahîreyê, bi zimanekî vekirîtir, ew dibêje Birayên Misilman *"li dijî dewleta olî ne"* –bi gotineke din, li dijî dewleta olî ya awayê îranî ne– ew *"dewleta sîvîl a xwedî çavkanîyên olî (2)"* dixwazin. Têgeha ku bi erebî bi kar anî – *marca'iyya* – dikare were wateya dezgeha hiqûqî-olî ya ku bikaribe teyîd bike ka qanûnên ji alîyê Parlemanê ve dengdayî bi Îslamê re diguncin an na; ango dezgeheke xwedî erka vetokirina qanûnan, eynî mîna projeya bernameya Birayên Misilman a ku di 2007ê de ji raya giştî re hatibû pêşkêş kirin, lê belê bi awayekî fermî nehatibû pejirandin. Ev projeyeke wisa xirab bû ku li gor wê divê serokatîya Misirê ji alîyê jinekê an jî kesekî ne misilman ve nehata bi rê ve birin.

Ji bo bidestxistina piştgirîya Birayan, eskeran yek ji endamên wan ên herî xuyayî, parêzer û parlementerê berê **Subhî Salih**, ku di heman demê de nivîskarê berhemeke li dijî laîkîtîyê ye, ji bo Komîteya Revîzyona Destûra Bingehîn hilbijart. Û eskeran herwiha hiqûqnasê berê yê netewegirîya ji xeta nasirî a xwedî ramana ku girîngîyê dide nasnavê îslamî yê Misirê û dixwaze qanûnên welêt bispêre şerîetê, **Tariq El Bişrî** anî ser serê komîteyê. Bi axaftina xwe ya olî ya li Qahîreyê di dema xwepêşandanên mezin ên 18ê sibatê de, serokê wan ê manewî, **Şêx Yûsif El Qardûwî**, banga dawîlêanîna li grevan kir û ji xwepêşandêran xwest ku wext bidin artêşê û ji artêşê jî daxwaz kir ku hikûmetê biguherîne.

Bi vî awayî çarçoveya "hatina nav nîzamê" ya ji alîyê eskeran ve di bin hîmaya Waşîngtonê de dihat hêvî kirin, diyar dibû: Îstîqameta ber bi demokrasîya hilbijartinî ya li bin kontrola artêşê dest pê kir, eynî mîna derbasbûna bi awayê Tirkiyeyê ya di navbera salên 1980 û 1983yê de. Guhertoyeke din a "modela tirk" li aso xuya dike: Derfeta derbasbûna ser desthilatê ya partîyeke xwedî îlhama îslamî û di rêvebirina welêt de hevkarîya wê ya li gel eskeran. Hevkarîyeke eynî wisa li Misirê bi awayekî hêsantir dikare derkeve holê, lewre artêşa Misirê, berevajîyê artêşa tirk a ku xwe li vê datîne, qet jî ne temînata laîsîteyê ye.

Ev lihevkirin tevî vê yekê wê problematîk be, qet nebe heta ku Birayên Misilman weke AKPya tirk xwe li gor şertûmercên serdemê veneguherînin û bibin sedemê berdewamîya bêbawerîya Waşîngtonê ya li hemberî wan û dijminatîya Îsraîlê ji ber helwesta wan a ji bo doza Filistînê.

Lê belê heta ku potansîyela şoreşê ya 25ê çileya 2011ê neyê fetisandin, radîkalbûna wê ya muhtemel kete bin tesîra pêla têkoşînên çînî ya ku da pey îstîfaya Mubarek, *(nivîsara Raphaël Kempf bixwînin, rûpel 15)*, dikare bibe çavkanîya tevgereke çep a ku dema Birayên Misilman pê re werin muqeyese kirin, wê weke ehwenî şer ango başê xiraban xuya bikin. Ev yek hem ji bo Waşîngtonê hem jî ji bo miştirîyên wê yên eskerî wê wisa be.

* Li Zankoya Londonê mamosteyê xebatên rojhelatî û afrîkî. Xwedîyê pirtûka Çîrokên Şer yên Îsraîl û Ereban, Sindbad -Actes Sud, Arles, 200

1 Essam El-Errian, "What the Muslim Brothers Want (Tişta ku Birayên Misilman Dixwazin), *The New York Times*, 9 sibat 2011

2 "Al-Ikhwan al-Muslimun: Narfud al-Dawla al-Diniyya li annaha dud al-Islam", *Ikhwan online*, 9 sibat 2011, www.ikhwanonline.net

Wergera ji fransî: Baran Nebar

# Li Lîbyayê rola eşîran

ALI CHIBANI *

Tevî ku li Ewropayê, xofa koçberîyeke berfireh a ji Lîbyayê di rojeva serekî de be jî, DYA bêhtir bala xwe dide encamên hişyarîya erebî ya li ser pergala herêmê. Ew ji netîceyên ji desthilatê ketina Husnî Muberek ya çi li ser meseleya îranî, çi li ser şerê îsraîlî-ereb, ditirsin. Lê rabûna rayên giştî, yên ku bi jana filistînîyan dihesin, dikarin hemû van hesaban serûbin bikin.

15ê sibata 2011ê, roja sêşemê êvarê, welatîyên bajarê Bengazîyê –duyemîn bajarê mezin ê Lîbyayê– ji bo ku doza berdana Fethî Tarbel bikin, civîyan. Ev parêzer nûnerê malbatên girtîyên sala 1996ê di şerekî li girtîgeha Abû Salim a li Trablûsê de kuştî bû. Ew bi îdîaya fermî "*ji ber ku gotegota, agir girtîye girtîgehê, belav kiriye*" hatibû girtin. Berdana wî dil û mejî aş nekirin û bangên ji bo 17ê sibatê "rojeke hêrsê" di nav xelkê de geriyan. Çawa ku li deverên din ên cîhana erebî qewimî, roja behsa wê hat kirin, bi hezaran xwepêşander daketin kolanan.

Ne girtinan, ne reşandina guleyên bi rastî, ne jî bikaranîna hêzên hewayî, dikarîbûn xelkê aram bikin. Kurê albay Muemmer Qedafî, Sayf el-Îslam 20ê sibatê derkete televîzyonê û gef li xelkê kirin: Heke kolan aram nebin, wê şerê navxweyî rû bide. Van gefan biryardarîya xwepêşanderan zêdetir kir. Zêdetir guhpênedana doza tepisandina xwepêşandanan ya ku li hêzên çekdarî dihat kirin, kir ku tevger mezin bibe. Du sedemên vê qutbûna ji refan hene: Banga "eşîran" ú hebûna eskerên kirêkirî yên biyanî di nav refên eskeran de.

Weke li tevahîya welatên Afrîkaya Bakûr, li Lîbyayê jî sîstema eşîrî di parastina çandên herêmî û şerê serxwebûnê de bi rolekî navendî rabû. Rojnamevan û mîlîtanê mafê mirovan Abd Al Moncif Al Buri (1) weha tîne bîra xwe "*lê belê di dema desthilatdarîya Idrîsê Yekem de* [1951-1969] *tu hebûna eşîran êdî nemabû. Civakê xwe bi rengê sendîka û komeleyan bi rêxistin kir da ku li hemberî qralekî, eşîrparêzîyê red dike, daxwazên xwe derbibire. Qedafî ew di cîhana siyasî de bi cih kirin.*" Dîrokzan **Pierre Vermeren** kite bi kite rave dike: "*Wî bêguman xwest wan di bin sîya xwe de bihêle da ku weke rêberê herî bilind ê lîbyayîyan hemûyan xuya bike, lê belê wî ev hem li hundirê sîstemê û hem jî li derveyî wê li ser piyan girt; tevî ku li welatên din ên Mexrebê ji holê rabûbû jî. Qedafî bixwe ji eşîreke ji Sirtê ye, ango ji navenda welêt. Ew weke endamekî eşîreke* [qeddafan] *ku qral ji textê wî xistî, dihat dîtin. Qral bi xwe jî serokê terîqeta Senûsî bû. Wî* [Qedafî] *ev sîstem timî bi kar anî, lewra ew bi kêrî wî dihat û desthilatdarîya li ser nifûseke bi zor şeş milyon e û li ser erdekî sê caran ji Fransayê mezintir belav e, hêsantir dikir.*"

Piştî darbeya eskerî ya 1ê îlona 1969ê, ya ku ew kire "Rêberê şoreşê", Qedafî hevgirtinên eşîrî yên ku diviyabû desthilatdarîya wî misoger bikin, pêk anîn. Al Buri li gotinên xwe zêde dike, "*ew ên ku herî zêde bi rejîma wî re dilsoz bûn, hilbijartin komîteya navendî; dibû ku ev kes birêveberên herî kêm jêhatî bin*". Rêber ji bo ku baştir bi rê ve bibe, eşîr parçe kirin, hin eşîr li hemberî yên din bilind kirin û pirrengîya zimanî (erebî, zimanê berberan û yên tûbûyan) bi kar anî da ku eşîrên serhildêr ceza bike, weke Tûbûyan ku li gelek welatan hene –Misir, Çad û Nîjer. Serokê Bereya Tûbûyan ji bo Silameta Lîbyayê (2) Îsa Atûbawî rewşa xwe weha aşkere dike: "*mafê zarokên me nîne, ne biçin dibistanê, ne jî bikevin hundirê nexweşxaneyê. Jinên me, ne dikarin bibin xwedîyên nasnameyeke malbatê, ne jî belgeyeke jidayikbûnê.*"

Qedafî pere dan hin eşîran ji bo ku rihettir partîyên siyasî, sendîka û her şêwazê muxalefetê bêtesîr bike da ku utopyaya xwe ya *Cemahîrîya* pêk bîne. *Cemahîrîya* awayekî demokrasîya girseyan e ku wê bê dewlet, bê hikûmet û bê partîyên siyasî bi cih bê. Wî wezîfeya tepisandina protestoyên xwendekaran ên salên 1970yê da wan. Li gor Al Buri "*sansûrkirina tevahîya rê û kanalên xweîfadekirinê rola siyasî ya eşîran xurttir kir, lewra eşîr weke navbeynkarên di navbera rayedaran û xelkî de bi kêr dihatin, xelkê wezîfeya ku gilî û gazincên wan bigihînin rayedaran dida eşîran.*"

Dawîya sibatê, dema bang li eskeran kirin destekê bidin gel, eşîran dest werda mijarê. Konseya rûspîyan a eşîra el-Zûaya ya ku erdên wê li ser xeta petrolê ya rojhilatê Lîbyayê ye, gef li rejîmê xwarin: Heke zext dewam bikin, ew ê rêya zêrê reş [petrol] ya ber bi Ewropayê ve bibirin. Yek ji eşîrên herî girîng, eşîra el-Werfela ya ku ji berê ve hevgira rejîmê ye, li alîyê xwe ji Qedafî xwest welêt biterikîne. Tûareg bixwe, bi lez û bez tevlî nav refên xwepêşanderan bûn.

Kesekî em pê re peyivîn (û xwest navê wî neyê aşkere kirin) texmîn dike ku dilsozîya bi eşîrê re kir ku esker tevlî nav refên gel bibin, lewma "*wan didît ku birayên wan û zarokên wan tên kuştin*". Ew weha pê de diçe: "*hisa endametîya neteweyekî jî. Dema ku fermandarên tabûran dîtin, eskerên kirêkirî yên biyanî, guleyan li lîbyayîyan direşînin, wan biryar da xwepêşanderan biparêzin.*"

* Rojnamevan.

1 Abd Al Moncif Al Buri, "Le tribalisme, le régionalisme et l'avenir de l'exercice politique en Libye (Eşîrparêzî, herêmparêzî û li Lîbyayê siberoja îcraeta siyasî)", li ser malpera Konferansa Neteweyî ji bo Muxalefeta Lîbyayî (Conférence nationale pour l'opposition libyenne)

2 Eşîra Tûbûyan "şênîyên Tîbestîyê" li başûrê Sahrayê ne. Hejmara wan li derdora 3 milyonan e û di navbera Çad, Nîjer, Misir û başûrê Lîbyayê de parçekirî ne. Li Lîbyayê % 18ê nufûsa welêt pêk tînin.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Kronolojîya Lîbyayê

**Sibat, 1947**:
Îtalya dest ji mafên xwe yên li ser Lîbyayê berdide.

**24-01-1951**:
Ragihandina serxwebûnê.
Idrîs El Senoussî dibe melik.

**01-12-1969**:
Efserên Azad ên Muammer Qedafîyê mîralay, desthelatê bi dest dixin û Komarê radigihînin.

**Kanûn, 1969**:
Lihevhatina li ser valakirina binkeyên amerîkayî û îngilîzan.

**01-12-1973**:
Giştîkirina British Petroleumê.

**1975**:
Vegirtina şirîda Aouzouyê, ku ji 1973yê ve leşkerê Lîbyayê dagîr kiribû û welatê Çadê doz lê dikir.

**02-03-1977**:
Ragihandina Cemahirîya Gel û Sosyalîst a Lîbyayê.

**Kanûn, 1980**:
Destpêka Desttêwerdana li Çadê.

**1984**:
Êrişa muxalefetê ya bi ser baregeha El Ezîziyeyê li Tripoliyê ku mîralay Qedafî bixwe jî lê dima.

**14/15-04-1986**:
Serokdewletê DYAyê Ronald Reagan biryarê dide kuTripoli û Benghazî bên bombe kirin.

**Kanûn, 1988**:
Êrişa li dijî Boeing 747 ya PanAmê ku di halê perwazê de li Lockerbieyê (Skotlandê) ket û 270 kesên tê de mirin. Îstixbarata lîbyayî her wekî êrişa eylûla 1989ê li dijî DC 10 ya UTAyê, hate tometbar kirin.

**Nîsan,1992 û çirîya paşî, 1993**:
Mueyyîdeyên Konseya Ewleyî yê ya Neteweyên Yekgirtî li dijî Lîbyayê.

**Nîsan, 1999**:
Hilawîstina mueyyîdeyan piştî lihevhatinekê ku tometbarên lîbyayî yen êrişa Lockerbieyê bêne mehkeme kirin. Çileya 2001ê, yek ji tometbaran cezayê ebedê girt yê din bêguneh hate dîtin.

**Eylûl, 2003**:
NY mueyyîdeyên li ser Lîbyayê vebirî, radike.

**Kanûn, 2003**:
Tripoli radigihîne ku bernameya xwe ya pêşxistina çekên komelkuj betal dike.

**Gulan, 2006**:
Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê careke din dest davêje pêwendîyên dîplomatîk digel Trîpolîyê û Lîbyayê ji lîsta wan dewletên ku piştgirîya terorîzmê dikin derdixe.

**Kanûn, 2007**:
Qeddafî bi seredanekê li Parîsê dibe mêvanê Nicolas Sarkozy. Girêdana peymanekê li ser hevkarîya ji bo hilberîna enerjîya nûkleerê bo armancên sivîl.

**Eylûl, 2008**:
Seredana Condoleezza Rice bo Trîpolîyê. Ji sala 1953yê ve yekemîn wezîra karê derve ya DYAyê ku seredana Lîbyayê dikir.

**Tebax, 2010**:
Qeddafî, di seredana xwe ya resmî de bo Romayê, ji alîyê serokê Konseyê Silvio Berlusconi ve tê pêşwazî kirin. Peytkirina hevkarîyê digel Îtalyayê li dijî koçberîya qaçax.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn




GÖKHAN ASLAN: **Paradoks**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

www.arsivakurdi.org

## DAWÎYA PERGALEKE HERÊMÎ

# Hişyarbûna erebî dê çi biguherîne?

ALAIN GRESH



Cavkanî: arsivên du Monde diplomatique; Le Monde; The Guardian; The Economist

Grev û xwepêşandanên ku gelek hefteyan ajotin, çar aliyên vî welatê mezin î misilman vegirtin. Buhrana aborî, û civakî, talankirina dewletê ji aliyê malbata serok ve, û zordestiya sînornenas ev stûna siyasî ya amerîkî ya li herêmê hilweşand. Waşîngton jî dev ji hevalbendê wê yê berê berdide. Wezîra karê derve ya amerîkî ji dîktator dixwaze îstîfa bike da ku *"rêya ber bi derbasbûna demokratîk were vekirin"*.

Em ne li Misira sibata 2011an, lê li Endonezyaya gulana 1998an in. Ya ku li ser mijarê daxuyaniyê dide jî, ne Xatûn Hillarî Clînton e, lê belê Xatûn Madleine Albright e. Suharto yê ku alîkariya Navenda Ajansa Saloxdariyê (CIA)yê di 1965an hat ser desthilatiyê, piştî qirkirina nîv mîlyon komunîst an jî yên wisa dihatin hesibandin, divê êdî ji ser dikê were xwarê. Bi hilweşîna dîwarê Berlînê (1989) û dawiya Yekîtiya Sovyetê re (1991), Endonezyayê wezîfa xwe ya xweşmêriya li eniya şerûtêkoşîna li dijî komunîzmê winda kir û li Waşîngtonê, êdî hevalbendiya tevgereke demokratîkbûnê, ya ber bi îstîqameteke ji bo berjewendiyên DYAyê were ajotin, tê tercîhkirin. Û ji niha ve serok William Clinton dixwaze îmajeke vekiritîr a Amerîkayê raxe pêşberî cîhanê. Axirî, tercîha hostane xwe dide der, û Jakarta li gel Waşîngtonê dikeve nava danûstandinên pir germ, herçendî Endonezya, weke endama Rêxisitina konfeansa îslamî OCI), xwedî helwesteke serbixwe be jî, bo nimûne, di mijara dosyaya nukleera Îranê de. Baş e, divê ji vê nimûneyê dersên çawa bên derxistin? Berî hertiştî, ti dîktatoriyeke hetahetayî çênabe, welew ew li welatê herî qelebalix ê misilman jî hikim bajo. Wekî din, guherînin navxweyî tesîrê li siyaseta derve dikin, lê belê çapa veguherînan li gorî rewşan diguhere: Misir ne Endonezya ye; Rojhilata Navîn jî ne Asyaya Başûr-Rojhilat e.

Li korîdorên wezareta karûbarê derve ya fransî û li yên gelek wezaretên din ên rojavayî, tinazkirina bi "kolana ereban" tiştekî pir ji rêzê bû. Bi rastî jî, ma pêwist bû li ber çavan were girtin ka çi difikirîn ev çend sed mîlyon kesên ku mirov ji bilî sloganên îslamî an jî dij-rojavayî tiştekî din ji wan hêvî nedikir, tevî ku lihevhatineke pir baş hebû li gel rêveberên ku dikaribûn li cem xwe nîzameke hêjayî teqdîrî saz bikin? tevî ku monark û serokên wan rêveberên me û herwiha ronakbîrên me bi mêvandariyeke şerqî pêşwazî dikirin– di navbera 1995 û 2001an de, çar sed wezîrên fransî li Fasê weke kesên taybet gelek rojên xwe derbas kirin (1)? tevî ku van zordaran fîksiyona "pêvajoyeke aştiyê" bi pêş dixistin, û li aliyekî jî mêtingeriya îsraîlî berê xwe fireh dikir?

Di nava çend heftiyan de, efsaneya li ser bêlebatiya gelên ereb û sistbûna wan a beramberî demokrasiyê, teqiya û derket holê ku ew efsane ji derewan pêk tê. Serhildanên tunisî û misirî, tevgerên ku ji Cezaîrê heta Bahreynê, ji Yemenê heta Libyayê, hemû herêmê dihejînin, û tesîra xwe didin ser Îrana ne ereb jî, ne tenê têkildarî tercîhên civakê û pêşveçûnê, lê herwiha têkildarî siyaseta tevahiya herêmê ne jî. Cara pêşî, ji salên 1970yî ve, bêî liberçavgirtina, qetnebe beşek jê, daxwazên gel û welatên ku careke din bûn sazkarên çarenûsa xwe, wê kes nikaribe analîzeke jeopolîtîk bike.

Pêşî ev tişt dikarin ji bo rewşa Misirê bên gotin. Eger hê zû be jî ji bo xêzkirina çarçoveya siyaseta wê ya derve ya ji niha û şûn ve, dîsa jî hemû çavdêr dipejirînin ku Qesra Spî hevalbendekî dilsoz, dostekî sadik winda kir. Waşîngtonê, li gel Îsraîlê, stratejiya xwe ya herêmê ji sî salan ve ye ku bi xêra Misirê birêve dibir.– Misir bi taybetî tevlî şerê li dijî Iraqê bû (1990-1991). Di van salên dawî de, Husnî Mûbarek li dijî "gefa Îranê" bû serkêşê sefera xaçperestan; di berbelavkirina îlûzyona "pêvajoyeke aştiyê" de, karî zexta li ser Otorîteya Filistînê zêde bike da ku ew muzakereyan bidomîne. Li Şarm El Şêx ew bi awayekî rêkûpêk dibû malovanê rêveberên îsraîlî yên ku bi her awayî diyar dibû ku ti daxwazeke wan a ji bo îmzekirina peymana aştiyê tine; ew herwiha bûbû beşdarê nava bloka li dijî Gazeyê û çi ji destê wê hat kir ji bo ku hemû hewldanên lihevhatinê ya navbera Hamas û El Fetîhê bi ser nekevin û hetta wisa kir ku hewldana ji bo lihevanîna her du aliyan a bi navbeynkariya welatekî din ê "nerm" ê weke Arabistana Suûdî jî biser nekeve (peymana Mekeyê, gulan 2007). Di dema serhildana vê zivistanê de, çend xwepêşandêran pankarteke bi îbranî vekiribûn weke ku bal dikişandin yekane zimanê ku Mubarek jê fêm dikir: zimanê rêveberên îsraîlî.

Konseya bilind a hêzên artêşa misirî, ya ku rewşa niha ya deshilatiya Qahîreyê kontrol bike, xwest temînatê bide Waşîngton û Tel-Avîvê ku Misir wê girêdayî hemû peymanên xwe yên navneteweyî bimîne – ev îmayek bû ji bo peymanên Camp David (1978) û peymana aştiya ya Îsraîl-Misir a di 1979an de hatibû îmzekirin. Lê belê herçendî îhtîmaleke pir qels be ku gelê misirî daxwaza vegera rewşa şer bike jî, ew van tekstan dîsa jî weke faktoreke aştî û aramiya herêmê nabîne – berevajî. Weke ku kesekî ji Konseya Têkiliyên Derve, (New York) Steven A. Cook jî dinivîse: *"di çavê hejmarek misiriyan de, van peymanan her du lingên Qahîreyê dixistin solekê, û derfet didan Îsraîl û Dewletên Yekbûyî berjewendiyên xwe yên herêmê bê zehmetî biparêzin. Bêî rîska şerekî bi Misirê re, Îsraîl karî koloniyên xwe yên Şerîa Rojava û Xazeyê bi sed hezaran îsraîliyî tije bike, û du caran Libnanê dagir bike. [di 1982 û 2006an de], Qudusê weke paytexta Dewletê îlan bike û bombeyan bibarîne ser (Îraq û Sûriyê) (2)"*.

Her cara ku derfet bi dest xist, gelê misirî piştgiriya xwe ya bi Filistîn û Libnanê re anî ziman. Di havîna 2006an de, dema ku rejîmê maceraperestiya rêxistina Hizbulahê şermezar dikir, portreyê lîderê rêxistinê Hasan Nasrallah, camekanên dikanên Qahîreyê dixemilandin. Xwepêşandêrên ku ji bo ferzkirina pirdengî û demokrasiyê têdikoşiyan, heyraniyeke wan tine ji bo Îranê, ku welatekî şiî û ne ereb e û bi awayekî dîrokî raqîbek e. Beramberî vê yekê, xwepêşandêr nirxê didin helwesta wê ya redkirina serîtewandina li ber zordariya Dewletên Yekbûyî û Îsraîlê.

Sibê, hikûmeteke zêdetir temsîlkar li Qahîreyê hem têkildarî muameleya beramberî şerîda Xazeyê hem jî girêdayî danûstandinên xwe yên li gel Îsraîlê, wê nêrîna Îranê li ber çavan bigire û bibe xwedî siyaseteke bitedbîrtir beramberî hewldanên amerîkî yên ji bo avakirina eniyeke hevpar (ne îlankirî) ya welatên ereb û Îsraîlê li dijî Tehranê.

Derfeta manevrayê ya Qahîre herwiha wê bimîne li ser rewşa wê ya aborî, ya jihevketî ji ber salên "lîberalîzasyonê".

Misir ji ber rewşa xwe ya hesas a borî, xwe spartiye ser xercên alîkariya eskerî û xurekî ya Dewletên Yekbîyî û fonên Yekîtiya Ewrûpayê. Hin kes bibîr dixin ku îhtîmal heye ku Misir bide dû siyaseteke derve ya serbixwe eynî mîna ya Tirkiyeyê; lê belê derfeta manevraya Enqerê pala xwe dide ser aboriya wê, hilberîna wê ya neteweyî ku sê qat zêdetirî ya Misirê ye (tevî ku nifûsê wan hema hema xwedî heman mezinahiyê ye).

Serûbinbûnên li Qahîreyê herwiha di serî de Arabistana Suûdî, welatên din ên ereb ên ku weke "nerme" tên zanîn, xistin nava fikaran. Qral Abdullah ji bo Mubarek bi serokê amerîkî re ket nava danûstandinan. Tirsek xwe ber dide nava van rêveberan: tirsa têkçûna amerîkî li herêmê. Kapasîteya Dewletên Yekbûyî a zeximkirina eniyeke fireh li dijî bernameya nukleer a Îranê û ferzkirina ambargoyê ne karî têkçûnên wan a li Iraqê ji ber çavan dûr bixin– eskerên wan divê beriya dawiya salê ji wir vekişin û Iraq ketiye bin tesîra pêla xwepêşandanên protestoyî ya ku hemû herêmê vedigire. –, ne xetimîna wan a li Afganistanê çareser bikin, ne jî bêqabîlitiya wan a bi destxistina ji Îsraîlê temînata rawestandina wargehên cihûyan, veşêrin.

Îstîfaya hikûmeta libnanî ya Saad Harîrî, di çileyê 2011an de, û jitextxistina Mûbarek tirsên erebên "lîberal" zêdekirin. Bi berfirehbûna tevgera ji bo demokratîbûnê, ku ji Yemenê heta Urdunê pêlan dide, ev erebên lîberal şaşûgêj bûne. Ciwanên Kendavê bi xwe jî dûr neman ji bin tesîra tiştên ku li Tunis û Misirê qewimîn. Rojnameya suûdî *Al-Watan* (16 sibat) wiha bang dikir ji bo liberçavgirtina daxwazên van ciwanên ku *"eleqeyeke mezin nîşan didin ji bo planên pêşketinê, û pêkhatina wan, leza wan a pêkhatinê, tesîrên wan û bihayê wan pevguhertina agahiyan li ser dedorên ku ji van planan kar dikin û zirar dikin"* – bi awayekî bal dikişînin ser gendeliya ku gelek projeyên di nava qraliyetê de dirizînin. Lê belê, hê beriya bûyeran jî, Arabistana suûdî hewl dida li herêmê rêyeke xwesertir bibîne û ji bo vê yekê xwe nêzî Sûriyê dikir. Wê bi awayekî erênî di çileyaê 2011an de bersiv da pêşîvekirinên wezîrê karûbarên derve yê nû yê Îranê, Alî Ekber Salehî.

Her çi rêveberiya filistînî ye, ew bi ketina Mûbarek re, bêpar dimîne ji dostekî dilsoz ê li dijî lihevhatina li gel Hamas a ku xwe dûr digirt ji siyaseta wî ya muzakereyên li gel Îsraîlê. Di nîvê meha sibatê de, di dema guftugoya li ser biryarnameyeke ku spartibû Desteya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY), têkildarî şermezarkirina çêkirina wargehên cihûyan, Obama bang li Mahmûd Abbas kir ji bo jê bixwaze ku teksê paş ve bikşîne. Tevî zextên mezin ên serokê amerîkî, Abbas daxwaza wî red kir û beramberî birayê mezin amerîkayê, bû xwedî stratejiyeke dijwar. Ev xetimîn gelo wê ciwanên Şerîaya Rojava jî – weke yên Xazeyê – han bidin ji bo daxwazên xwe yên ji bo zêdetir azadî û rûmetê bînin ziman? ji bo têkoşîna xwe di warê mafên mirovan û wekheviyê de jî bimeşînin? ji bo bi helwesteke dûrî dijwarî û şîdetê berê xwe bidin kolanan û hem li dijî rêveberên xwe hem jî li dijî dagirkeriyê dengê xwe bilind bikin? Artêşa Îsraîlê, weke ku *Jerusalem Post (3)* balê dikşîne ser, li hemberî vê îhtîmalê, bi sazkirina hêzeke bertekiya lezgîn, bi tirs xwe amade dike.

Ji hevalbendên ereb ên Waşîngtonê jî zêdetir serêşiyayî bi vê rewşê, hikûmeta Benyamîn Netenyahû dereng nema ji bo desteka xwe ya ya tam nîşanî Mubarak bide. Li gorî endamê bitesîr ê *think tank* a New America Foundation (Weqfa Nû ya Amerkî), Daniel Lévy, ev helwest ronahiyê dide ser referansa berdewam ya Tel-Avîvê a weke Îsraîl wê weke *"yekane demokasiya Rojhilata-Nêz"* bimaya : ev hevok nayê wateya tirsa mayîna bi tenê, dorpêçkirî bi dîktatoriyan, lê belê, berevajî, tê wateya xweziya mayîna "yekane" (4). Li Tel-Avîvê, hikûmetên li peyhev tên pir baş xwe li gorî rejîmên otorîter ên alîgirî rojava eyar dikin.

Vê gavê, ew ji ber van guherînên berdewam, bi nexweşiya tirsê ketine, bi zanebûn rola îslamîstan a di serhildanan de pir bi mubalexe dest nîşan dikin, wan dişibînin şoreşa îslamî ya 1979an a li Tehranê, çîrokên xwe yên ucûbe yên têkildarî " gefa îranê" zêdetir dibêjin, an jî bang li eskeran dikin, mesele wezîrê parastinê Ehûd Barak di serdana eniya bakûr de got, dibe ku esker ji bo ji nû ve Libnanê dagir bikin, werin vexwendin. (5).

### Hedefa pêşî ya xwepêşanderan Muberek bû, lê wan Filistîn ji bîr nekir

Eger "Rojava winda kir", Şam-Tehran û hevalbendên wan Hamas û Hezbollah, jî gelo bi ser ketin? Bêşikûguman ; lê belê qelsiyên wan li ber çavan in. Hamasê xwe li Xazeyê girtiye, tewanbariya muhtemel a rêveberên Hizbullahê ji aliyê Dadgeha taybet a Libnanê, rêxistina Nasrallah Nasrallah(6) qels dike. Herçendî rêveberiya Îranê şoreşa misirî silav kir, li aliyê xwe, wê dest bi pêleke mezin a şîdetê kir û bi bêwijdanî êriş birin ser xwepêşanderên ku daxwazên wan pir dişibin yên xwepêşanderên misirî.

Herçi serok Başar El Asad e, di destê wî de du koz hene : yek jê tirsa gelê sûrî ya ji buhraneke ku dikare bibe sedemê bêaramî û şerûpevçûnên olî mîna yên li Iraqê ; û helwesta wî ya biryardar beramberî Îsraîlê, ku di nava gel de pir binavûdeng e. Li gel vê yekê jî, ev welatê girêdayî bi bernameyên lîberalîzasyona aborî, nifûsa wî pir zû zêde dibe û dibe ku duçarî zehmetiyên cidî yên aborî û civakî were, û jixwe ne pêwist e em balê bikşînin hebûna daxwazên ciwanên sûrî jî yên ji bo azadiyê ku ji yên din ên ereb hinek cudatir in.

Me behsa Endonezyayê kiribû û bal kişandibû terza Waşingtonê ya li gorî hilweşîna Dîkatoriyê eyar kiribû. Ferqa sereke li gel Rojhilata-Nêz a îro têkildarî rewşa Filistînê ye, ku gelek çavdêr, bi awayekî ne mafdar, bawer dikin ku ew ji bo xwepêşanderan bûye mijareke talî. Li Qahîreyê, organîzator bi xwe bûn yên ku hemû sloganên dij-amerîkî û dij-îsraîlî qedexe kirin, ji ber ku wan biryar dabû ku li dijî yek dijminî, li dijî rejîmê konsanstre bibin ; ev daxwaz ji aliyê herkesî ve tê famkirin. Lê belê piştî daxistina Mûbarek, di pîrozbahiya pir mezin a serkeftinê a li Qahîreyê 18ê sibatê de, xwepêşanderan bi awayekî girseyî der barê rizgariya Qudusê de, dest bi qêrîna sloganan kirin.

Pêvajoya bi dehan salan, Dewletên Yekbûyî, karîn hema hema bêşertûmerc destekê bidin Îsraîlê, bêî ku berdêla wê bidin, – helbet eger windakirina populerîteya xwe ya li cem "kolana ereban" a dibû mijara tinazên wan, ne berdêlek be –, rêveberên ereb dîsa jî hevalbendiya xwe ya dilsoz pê re dewam kirin. Ew pêvajo dawî lê tê. Me hê di adara 2010an de bihîstibû ku general David Petraeus, ku hingê serokê Fermandariya navendî ya hêzên amerîkî yên li Rojhilata-Nêz bû (Centcom), wiha digot: *"Hêrsa ereban der barê pirsgirêka filistînî de karîn û kûrahiya têkiliyên me yên li gel hikûmet û gelên vê herêmê bisînor dike û rewatiya rejîmên lîberal ên li cîhana ereb jî qels dike. (7)"*

Konteksta nû ya jeopolîtîk wê zorê bide ser rêveberiyê ji bo tercîhên krîtîk bike. Lê belê ewê tişteki wisa bixwaze gelo? Ewê karibe gelo? Ji Yekîtiya ewrûpî jî pirsên wisa dikarin bên pirsîn, ango Yekîtiya Ewrûpî ku hevkariyeke wê ya bextiyar hebû li gel Bîn Alî û Mubarek û nedixwest ti masefe bixe navbera xwe û dîktatoran, bi zêdekirina peymanên li gel hikûmeta îsraîlî ya dijmina her cure aştiyê, bi pêşengiya siyaseteke neolîberal a ku bû sedema xizanî, û gendeliya girseyî ya welatên Başûrê Derya Spî, gelo wê biwêre dawiya dawî "kolana ereban" jî li ber çavan bigire?

Kolana ereban a ku, her çawa be, têde rihdirêjên paşverû û jinên bi bûrka tinin. An jî dibe ku wê pêwist e, weke ku ronakbîrê libnanî Georges Corm dawetî wê derê dike, ku civaka sîvîl a Bakûr bi mînakgirtina " kolana ereban ", *"ew jî bikeve nava hewldana bilindkirina asta reqabeta bêwijdan a olîgarşiya neolîberal a ku aboriyên ewrûpî bipaş dixe, têde bi qasî pêwist derfetên kar naafirîne û her sal hinekî din zêdetir kesên ewrûpî yên ji her neteweyî, xizantir dike. Ev veguherîna neyînî jî ji bo xatirê berjewendiên komikeke piçûk a tebeqeya "manageran" e û ev derdor bi meaşên xwe yên salane yên sînornenas her sal hinekî din zêdetir dewlemendiya neteweyî desteser dikin (8)".*

Di nava çend salan de, cîhan bû pirnavendî. Her welatê mezin, ji Brezilyayê bigirin heta bigihe Çînê, ji Hindistanê bigirin heta bigihe Afrîkaya Başûr, li cihê xwe digere, ne ji bo dijîtiya Rojava, ne ji bo xizmetkirina jê re, lê belê li teniştî wê, dixwaze berjewendiyên xwe biparêze. Bi vî awayî, Tirkiye, endamê Rêxistina peymana Atlantîka Bakûr (NATO), hevalbenda Dewletên Yekbûyî, roleke herêmî yê mezintir dilîze û li ser dosyaya nukleer a Îranê an jî li ser meseleya Filistînê dibe xwedî helwesteke serbixwe. (9). Maxrîb û Rojhilata Nêz jî hewl didin xwe bigihînin vê tevgera cîhanî. Endamê berê yê CIAyê û nivîskarê pirtûka The Futur of political islam Graham Fuller analîzeke wiha dike: *"tiştê ku gelên herêmê dixwazin, bi destxistina hêza kontrolkirina jiyana xwe û çarenûsa xwe ye. (…) Di kurtedemê de, ji bo vê yekê tedawiyeke baş pêwist e : divê Waşington lêde here û van civakan rihet bihêle, dawî bîne li vê siyaseta dirêj a ku pê muameleye zarokan li gelên Rojhilata Navîn dike.* (…) divê em êdî biqedînin van hewldanên xwe yên bênavber û obsesîf ên destwerdana jiyana siyasî ya welatên biyanî ya ku pala xwe dide awirekî *miyop ê "berjewendiyên amerîk.* (10)*"*

"Ne Rojhilat, ne jî Rojava", bi vî awayî diqîriyan xwepêşanderên îranî di 1979an de, û daxwaza xwe ya bêminetkirina hem Dewletên Yekbûyî hem jî Yekîtiya Sovyetê aşkere dikirin. "Ne bi Rojavayê re, ne li dijî wê", dikaribû bibûya slogana xwepêşanderên îro li seranserî cîhana ereb daxwaza xwe ya ji bo serxwebûnê, û serweriyê li cîhaneke ku ew weke pirserî nas dikin, tînin ziman. Ewê Rojava li gorî hewldana wî ya parastina prensîbên dad û mafê navneteweyî û pêkanîna wan a her derê cîhanê, bi taybetî li Filistînê binirxînin. Lê belê ewê êdî qebûl nekin ku hikûmeta wan têkoşînê li dijî Rojava ji bo zeximkirina dîktatoriyê bikar bînin.

1 Binêrin, Pierre Vermeren, "Bihara ereban: çima Fransayê xwe kor kir", *Libération*, 17 sibat 2011

2 Steven A. Cook, "The U.S.-Egyptian Breakup", malpera *Foreign Affairs*, 2 sibat 2011, www.foreignaffairs.com

3 Yaakov Katz, "IDF prepares over fears of Egypt-style W. Bank demos", *The Jerusalem Post*, 18 sibat 2011

4 Daniel Levy, " Israel's option after Mubarak" 13 sibat, http://english.aljazeera.net

5 *Haaretz*, Tel-Aviv, 15 sibat 2011

6 Lire "Beyrouth dans les rets du Tribunal spécial", *Le Monde diplomatique*, sibat 2011

7 Şahidiya li pêşberî Senatoya amerîkî, 16 adar 2010

8 Georges Corm, "Gava" kolana ereban "dibe modela Bakûr", 11 sibat 2011, www.lemonde.fr

9 Lire Wendy Kristianasen, "Ne Şerq ne Xerb, tercîhên wêrek ên Enqerê", *Le Monde diplomatique*, sibat 2010

10 Graham Fuller, "Revolution in Egypt", *Christian Science Monitor*, Boston, 4 février 2011

Wergera ji fransî: Baran Nebar



# Payînên civakî û tirsa kaosê li Tûnisê

AKRAM BELKAÏD *

Çend hefte bi pey ketina desthilata Zeynel Ebidîn Bîn Alî, tûnisî bi mezinîya karê mayî dihesin. Lê ew fikar in ku têkçûna hêzên emrê û manevrayên parêzvanên dîktatorê hilweşîyayî dê serkeftina wan ji destê wan bigrin.

*"Axirê êdî em azad in, lê hê tu tiştî rengê xwe baş zelal nekiriye. Hê jî xetera wê hindê li dora serê Tûnisê digere ku bikeve nav destên hûtên xwe yên berê".* Ev rojnamegerê ciwan, rûniştî li terasa qehwexaneyeke biçûk a banlîyoya bakûrî ya paytextî, bi van gotinên kurt, li têr behsa halet-î ruhiyeta hevwelatîyên xwe dike. Li nav malbatan û li ser organên medyaya lokal, babetên wek ketina rejîmê, fermana destgîrkirina Ben Ali û xizmên wî, hema bêje bi temamî hilweşîyana Partîya Kombûna Destûrî ya Demokratîk (RCD), partîya desthelata berê û herwiha soza hilbijartinên azad û şefaf, bênavber têne guftûgo kirin. Lê belê nerihetî û nediyarî hê jî li kar e. Heta wê dereceyê ku piştrastî û rihetîya encama wê şoreşê têk bibe ku êdî behra pitir a cîhana erebî didine dû û ji bo welatên xwe doza heman netîceyê dikin.

### Otorîtarîzmeke nû ji rîska dabeşbûnên bi xwîn baştir e

Wêdeyî zehmetîyên rojane, pirsa herî mezin nebûna asayîşê ye. Hêzên nizamî ku heta duhî jî li her feleke û çaryanên bajar û gundan hazir bûn, heçko bûne hilm û winda bûne. Nebûna wan a li meydanê yekî diheyirîne û dibe binasê bêîstiqrarîyê. Kiryarên nemedenî her ku diçe zêdetir lêdihên, di demekê de ku agahîyên tirsnak belav dibin ku mîlîsên kevne-RCDyê dê li ser mirov û malên xelkî tundûtîjî û terorê bibarînine. Şewitandina çendîn avahîyên xwendingehan û kuştina keşeyekî polonî ku li xwendingeheke taybet a taxa Manoubayê, li rojavayê navenda Tûnisê, dixebitî, cidiyeta gotegotan piştrast kir û ihtimala wê yekê zêdetir kir ku aligirên rejîma berê dê li ser êrişên xwe yên ji bo tolhildanê berdewam bin. Kitêbfiroşekî tûnisî bi van gotinan nerihetîya xwe derdibire: *"Muşterîyên rejîma berê dixwazin ku em bi poşmanî bêrîya dewleta polîsan û ya asayîşê bikin! Heman stratejîya erdê şewitî [Stratejîya xerabkirin û rûxandina berbelav e da ku jêder û avahî û binesazî neyên bi kar anîn] ye ku ji cerga ketina Ben Ali didine ber xwe".* Bi ya wî, rewşeke wisa dibe ku veguhastina desthelatê bo demokrasîyeke rêkûpêk averê bike, lewre tê heye çînên navîncî ji bo teqezkirina aramîyê berê xwe bidin artêşê. General Amarê serfermandarê giştî gelek qedirgiran bûye, ji dema ku leşkerê wî red kir êrişî xwepêşanderan bike û nehişt milîsên Ben Ali welatî têxine nav gurîyên agir û pêlên xwînê. Navbihurî çendîn caran dubare kir ku sazîya wî dê rêzê li hilbijartin û rizamendîya xelkî bigire û dest danayne ser desthelatê. Lê belê, pareke girîng a xelkê Tûnisê hazir nînin bibînin ku welatê wan jî mîna Cezayîra cîran bibe sehneya dubendîyên xwînî, ku wan dubendîyan Cezayîr ter û bera kiribûn û bi tenê piştî vegera cûreke otorîterîyê dawî li wan hatibû.

### Gelo çar sed hezar xebatkarên wezareta karên hindûr wê biqulibin ?

Kes pê nizane ka çima hêzên polîsan meydanê bi cî dihêlin. Diyar e hindek ji ber tirsa êrişên milîsan ditirsin û li ber çavan namînin. Beşek jî ji ber nebûna te'lîmatên rêkûpêk ji alîyê hikûmeta muweqet, ne li ser wezîfeya xwe ne. Helbet, çendîn komên çekdar jî wek hêzên parastina serokdewletî, hatine bêçek kirin an jî belav kirin. Lê belê, hêzên parastinê ewqas bo cîhana derve vegirtî bûn ku hejmareke milîsên paramîlîter nehatine dest nîşan kirin. Di encamê de, hejmareke şexsiyetên siyasî û sendîkayî zextê li hikûmeta muweqet dikin ku nizama asayîşê dîsa bi rêk bixe û armanceke pêşîneyî bide ber xwe: Nehêle ku beşek ji 400.000 mirovên ku wezareta navxweyî berî bi çendekê kar dabûyê –bêyî ku nîşanên heyî hisêb bike– berê xwe biguhorin û bikevine nav terefdarên Ben Ali.

Di aqlê hemûyan de nimûneya Iraqê heye: Sala 2003yê, belavbûna artêşê û Partîya Be'esê bi hezaran mirov xistibûne nav destên têkoşeran. Hindek alî dengê xwe ji bo efûyeke qismî bilind dikin, lê belê gelek berpirsên siyasî yên Tûnisî, ji wan **Moncef Marzouki** û **Rached Ghanouchiyê** islamî, bi fer dizanin ku Ben Ali û jina wî Leyla Trabelsi bêne girtin û li Tûnisê bêne mehkeme kirin, ji ber ku raya giştî wan her duyan wek gefa herî mezin ya li hember binecihbûna aramî û serûbera paşerojê dizanin.

Xema duyê li nav Tûnisîyan yeke jeopolîtîk e û der barê her du cîranên serekî de ye. "Qeddafî dê çi bike?" Rêberê Cemahiriyeyê serê pêşî piştgirî da Ben Ali, paşê got ku rêzê li tercîha xelkî digire. Tûnisî fêrî biryarên bêwext û nişkî yên cîranê xwe bûne, ji ber ku berê jî carekê bi biryareke ji nişka ve bi hezaran karkerên muhacir ji welat derxistibûn, lewma ditirsin ku Qedafî hewla bêserûberkirina rewşa welatê wan bide. Li Tûnisê, agahîya –piştrastnekirî– ku Xanim Trabelsi li Lîbyayê bi cî bûye da ku binkeyeke jinûve vegirtinê ava bike, bûbû sebebê nerihetîya gelek kesan. Lê belê, ji 14ê reşemeyê ve, bêserûberî û aloziyên li Lîbyayê rewş bi temamî guhart.

Cîrana din, pirsên din. Bêdengîya karbidestên cezayîrî bala herkesî kêşa. Heta ketina Ben Ali, organên medyayê yên resmî an jî nêzîkî desthelatê hewl dan berfirehîya serhildanê her kêm û tengtir nîşan bidin û gelek caran her qet behs jê nekirin. Hem hikûmeta Ehmed Ouyahia û hem serokdewlet Abdulezîz Bouteflika bi tenê bi çend têbînîyên kurt yên ne jidil diyar kirin ku qebûl dikin rejîm hatiye guhartin. Hikûmet herweha qet pê xweş nebû ku piştî îstifaya serokê Misirê Husnî Mubarekî 11ê reşemeyê, di xwepêşandanên kêfxweşîyê de li ser meydana Bourguibayê li Tûnisê, alayên Cezayîrê dihatin hildan. Wêdeyî vê bêdengîya nedostane, Tûnisî bi fikar ji xwe dipirsin ka gelo reaksîyona rejîma Cezayîrê dê çi be gava hat û muxalifên wê li ser televîzyonên wek *Nesma TV* an *Hannibal TVyê* bîr û boçûnên xwe bi azadane derbirîn.

### Kirêgirtîyên şirketên ewropî dibin hedefa grevan

Ji şert û pirsên ewleyî û herêmî zêdetir, hejmareke karbidestên tûnisî wisa dihizirin ku pirsa mezin di rista civakî de ye. Her roja ku derbas dibe, bêsihhetî û lawazîya aborîyê radixe ber çavan. Herçend gelek caran amaje pê hatibe kirin ku Tûnis yek ji wan çend dewletên erebî ye ku neketiye ber tesîra krîza avahî û xanîberan (bi xêra polîtîkaya qirardar a temînkirina xanîyan), her hingê xuya bû ku êdî parek ji xelkî pir bi zehmetî ji xwe re banekî peyda dike. Ji nîvê sibatê û vir de, kanalên televîzyonê balê dikêşin ser zêdebûna avakirina xanîberan li ser erdên neçandî an jî li ser wan erdên ku diyar e aîdî wan karbidestên kevin ên reviyayî an jî destgîrkirî bûne. Mesele hind mezin lêhat ku wezareta karûbarên navxweyî îqazek da wan "îşxalkerên neheq" û bang li xelkî kir ku riayetê li mafê xwedantîyê bikin. Bi ya karbidestekî Banka Navendî, pêdivî bi navbera 110.000 xanîberan heye bo xelkî da ku bikaribin bersiva daxwaz û pêdivîya heyî bidin; ku di nav vê hejmarê de komeke mezin a wan hevwelatîyên ciwan nehatiye temsîl kirin, ku ji ber bêkarîyê mecbûr in li mala dayik û bavên xwe bijîn.

Meaş û şertên karkirinê jî dîsa dibin sebebê nerihetî û tevgerê. Di navbera 1 û 15ê sibatê de, ne kêmî sedan dubendîyên civakî rû dan, ku tê de şirketên qaşo parastî û veder ji kêşeyan ên wek Tunis Air jî hebûn. Li her derê daxwaz û dawakarî xwe dispêre heman sêyeyê: Çûn an jî derkirina rêvebirîyên ku digel rejîma berê zêde hevaheng bûn, zêdekirina meaşan û başkirina şertên karkirinê. Rayedar car bo carê banga sebr û berpirsiyarîyê li xelkî dikin, lê di heman demê de qebûl dikin ku yek ji meseleyên pêşîn e ku divê di vê heyama derbasbûnê de bê zelal kirin.

Di vê bareyê de, hikûmet heçko li ser zevîyeke mayînkirî bi rê ve diçe: Serhildana civakî bi rengekî rasterast tevahîya modêla aborî dixe jêr pirsiyaran. Lewre, tevger û çalakvanîya heyî dijayetîya xwe ya beramber wan şirketan jî derdibire ku bi temamî li ser îxracatê kar dikin. Karkerên tekstîlê ku meaşeke bîst caran ji yên li Ewropayê kêmtir werdigirin û herweha karkerên montaja otomobîlan, parçeyên elektronîk û heta xebatkarên sektora trafîka hewayî, biryar dane ku dengê xwe bilind bikin û bidin bihîstin da ku derhal meaşên wan bêne zêde kirin. Rewşa li pişkên mudaxeleyên acîl û li şirketên nûner ên rêvebirina karûbarên şirketên ewropayî, bi taybetî li bank û şirketên venêrîn û hisêbdarîyê jî heman rewş e.

*"Heta niha, şirketên bi temamî îxracatkar li ser zemînekî bêqanûn kar dikirin, ku mafên medenî û yên karkeran pir hatibûne kêm û sivik kirin û sendîkayan nedikarî mudaxeleyê lê bikin"* dibêjin li Yekîtîya Giştî ya Tûnisî ji bo Mafên Kar (UGTT). Bi ya çapemenîyê, polîsê rejîma Ben Ali nedihişt bi tu awayî karker di vê sektora girîng de doza mafên xwe bikin. Lewma, sendîkaya navendî dixwaze ku qanûnên der barê van şirketan û deverên *duty-free* de careke din bêne amade kirin.

Daxwazên civakî wisa ne ku UGTT her ji niha ve bûye yek ji aktorên serekî ya vê heyama derbasbûnê. Hikûmeta muweqet bêyî şêwra digel sendîkaya navendî tu biryareke mezin wernagire; hetta lîsta walî û sefîrên nû jê re hate pêşkêş kirin. Beramberî wê, Yekîtîya Tûnisî ji bo endûstrî, bazirganî û sineetê (UTICA) nema bihêz e: Civata patronan bi piranî digel rejîma berê hevaheng û rêkeftî bû; rejîmê jî dengê sendîkayan qut kiribû û keda wan dixwar. Lewma, dibe ku ketina Ben Ali bibe sebebê şkestina îmaja Tûnisê wek welatê ku li başûrê Behra Spî di warê mafên medenî û yên karkeran de xwedîyê şertên herî nerm e û di encamê de êdî nema şirketên derekî cezb bike.

* Rojnamevan

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

# Dema ku Fransayê piştgirî dida zordarîya li Tûnisê girseyê Michèle Alliot-Marie bi xwe re bir

LAURENT BONELLI û ELWIS POTIER *

11ê çileya 2011ê, nerazîbûna xelkê gihiştibû bajarê Tûnisê û wezîra karên derve ya fransî, **Michèle Alliot-Marie**, li ser dika Meclîsa neteweyî ev pêşniyaz derbirî: bi saya serê *"jêhatîbûna li cîhanê navdar a hêzên ewlehîyê [yên fransî]"* çareserkirina pirsgirêkê. Vê hevokê li çar hêlên dinyayê deng veda û heta li ***Quai d'Orsay*** jî [avahîya wezareta karên derve ya fransî], bûye sedema rexneyên berfireh. Bê guman, di kêlîyekê de ku hikûmeta tûnisî li xwe mikûr hat ku ji destpêka pevçûnan ve polîsê wê 21 sivîl kuştin (li gor sendîkayan, ev hejmar gihîşt 50 kesan (1), pêşniyazkirina hevkarîyeke xurtkirî, çewtîyeke siyasî ye. Lê belê, wezîr jidil bû: di navbera kanûna 2010ê û çileya 2011ê de, çar kargoyên materyalên ewlekarîyê; kinc, alavên xweparastinê û gaza çavsoj, bi destûra hikûmeta fransî jiTûnisê re hatin bi rê kirin.

Ev danûstandin di çarçoveya rêûresmeke dûvdirêj a hevkarîya polîsî de pêk tên, ku îroj li Birêveberîya Hevkarîya Navneteweyî (DCI) ya wezareta karên hundir tê meşandin -ev bixwe encama lihevkirina Beşa Hevkarîya Teknîkî û Navneteweyî ya Polîs (SCTIP) û birêveberîya alîkar a Hevkarîya Navneteweyî ya Cendirmeyê Neteweyî ye. Du sed û pencî "cîgirên parastina hindûr" (polîs û cendirme) li 93 balyozxaneyan cih digirin û li 153 welatên cihê dixebitin. Ji bilî roleke navberkarîya li nav servîsên fransî û hevpîşeyên wan ên biyanî, ew tevlî perwerdekirina polîsên xwecihî dibin û *"di warê materyalên ewlekarîyê de, pêşxistina pîşesazîya fransî (2)"* jî digirin ser milê xwe. Jixwe, para mezin a vê bazarê di destê fîrmaya fransî ya îxracatê ya wezareta karê hundir (SOFREMI) de ye. Sala 2003ê, li cîhanê, Afrîkayê % 23yê hejmara kiryarên "teknîkî" yên Fransayê pêk dianî. Li Afrîkaya Bakûr û Rojhilata Navîn jî, ev rêje % 15,79 bû. Ji 1526 kiryarên hevkarîyê, % 15,14 di warê "ewlekarîya giştî" de bûn. (3)

Ji ber dîroka xwe ya şoreşger û protestoxwaz Fransa di vî warî de xwedî tecrubeyeke berfireh e. Artêş tradîsyonel ji bo kontrolkirina "hestên gelî" bi kar dihat. Lê belê, bikaranîna leşkerên giraneçek û bêtecrube (qet nebe ji bo karên bi vî rengî), tim bi ziyana xwepêşandêran bi dawî dihat, ku di hin hal û rewşên siyasî de, hikûmet jî dixistin rengavîyeke giran. Bi vî rengî, piştî ku komarxwaz di dawiya sedsala 19ê de bûn desthilatdar û mafên civîn, xweîfadekirin û avakirina komeleyan hatin zêdekirin, êdî zehmet bû ku dewlet weke berê şideteke kor bi kar bîne (weke mînak di dema tepisandina „rojên hezîranê" yên sala 1848ê de).

Sedemeke ji vê jî xurttir ew e, artêş êdî ne artêşeke profesyonel bû û rîskên rasteqîn hebûn ku hin lîwayên vê artêşa askerîyê dê serê xwe hildaya, weke sala 1907ê, li Narbonne û Béziersê qewimîbû, piştgirîya xwepêşanderan bikira.

Cendirmeyên seyar, hêzeke ku bi taybetî ji bo ewlekarîyê sazkirî û perwerdekirî bû, wisa sala 1921ê ava bû; herweha, 1944ê, liqên komarparêz ên ewlehîyê (CRS), ji nav polîsê neteweyî derêxistî, lê zêde bûn. Bi pêşxistina van jîrîyan re, dabeşkirineke zelal a muxelîfan li reqîb û dijminan derdikeve holê. Divê yên pêşî li cihekî bên vegirtin, kontrolkirin, heta vederkirin jî; her çi yên dawîyê ne, divê ew bên tune kirin (4). Ev bersivên cuda bi awayekî diyar li gor sînorê hundir / derve pêk tên.

Dîsa jî, şerên kolonyal - nemaze li Cezayîrê - wê zor bidana xeta di navbera kiryarên polîsî û leşkerî de, bi taybetî dema operasyonên ku wan ê *li nava* yan jî *li dijî* "girseyê" bi rê ve bibirana.

Ji ber vê yekê, artêş wê "dij-subversîyonê" teorîze bike, ku dê ji hêla dîktatorîyên latînî-amerîkî (nemaze li Arjantînê) ve pir bihatana bi kar anîn û îro jî, di stratejîya amerîkî ya li Afganîstanê de xwe dide der. Le belê hilweşîna dîwarê Berlînê, derfet da artêşê ku doktrînên xwe nû bike. Her ku diçû, ew tevlî operasyonên derve yên navberdanînê yan aştîyê dibû û bêhtir bi xelkê sîvîl re rû bi rû dima; lewre jî wê bersiva xwe bixwe ya li hemberî "tevgerên girseyî" pêş bixista ku sala 2001ê bi navê "kontrolkirina girseyan" (5) bû qanûn. Mantiqa wê jî ev e: "Yê ku pir dikare, hindik jî dikare". Senaryoya herî zêde behsa wê tê kirin a xwepêşandaneke aştîyane ye, ku kesên çekdar dikevin nav xwepêşandanê û gulleyan li leşkeran direşînin. Lewre, divê teçhîzata artêşê destûrê bidiyê ku yekser ji rewşekê derbasî ya din bibe (6). Ev têgih bi temamî li dijî têgiha ewlekarîyê ye, ku bi xwe "zêdebûneke gav bi gav a şidetê ye". Ji bo ewlekarîyê, li gor rewşa heyî û pêşketina wê, biryara bikaranîna materyalên cihêreng, tê girtin, ji kumzirxê sade heta bi erebeyên bizirx û her cure alavên xweparastinê jî di nav de.

Tevî hin tiştên ku zû hatin nivîsandin, li ser erdê Fransayê, ev şêwaza kiryarê bi temamî serdest e. Li welatên din rewşên cihê xuya dibin: Her du têgih, li gor deverên bandordarîya artêşê yan polîs û dîroka têkilîyên Fransa û van dewletan, belav dibin. Di mijdara 2004ê de, dema ku artêşa fransî li Peravên Kelbefîlê li ser girseyê gule reşandin, wê bi awayekî xedar nîşan da, ka li wir çareya bijarte kîjan e. Li Tûnisê, weha xuya ye ku **Alliot-Marie** bêhtir li ewlekarîyê difikirî.

Berevajîya boçûna dabeşkirineke ahengdar a peywirên hêzên ewlekarîyê (hundir/derve, polîs/artêş), evên hanê bi rastî, di paşxaneke kêmkirina budce û personelan de, reqîbên hev in. Sala 1999ê, li Kosovayê alozîya pevçûnên di navbera cendirme û leşkerên artêşa bejayî de - heta hin leşkeran li kolonelekî cendirmeyan jî xistibû (7) -girîngîya berpirsiyarîya xwepêşandanan ji bo van sazîyan baş xuya dike. Her çi pevçûnên 2005ê yên li banlîyoyên fransî derketin, wan hem her du CRS û cendirmeyên seyar kirin bisporên navneteweyî yên ewlekarîyê, hem jî -bi awayekî demkî bibe jî –ew ji siyaseta hikûmetê xilas kirin; hikûmetê plan dikir ku hejmara wan pir kêm bike.

Dîsa jî, mantiqên dijber ên kontrola girseyan û ewlekarîyê digihîjin hev û ew bi tenê weha dikarin bi ser kevin. Jixwe, kontrolkirina tevgerên girseyî yên ku istîqrara rejîman dixin xeterê, ji bo pir rayedaran endîşeyeke domdar e. Ew hê jî ji bêhişîya li tevgerên gelî tê bar kirin, -vê hişmendîyê bi pirtûka **Gustave Le Bon** a bi navê *Psychologie des foules [Psîkolojîya girseyan]* (1895) dest pê kir -ditirsin. Ji ber vê tirsê, xwepêşandêr weke hevkarên kaos û bêîstîqrarîyê tên hesibandin. Heta li gor gotinên karîkatural ên fîlozofê muhafezekar **Hippolyte Taine** (1828-1893) mîna "cinawirên xwînmij" jî. Lê xwedêgiravî ev bêhişî, bi tenê ji ber hişmendîyeke dewletê, ya ku dixwaze nîzama civakî ya heyî biparêze, derdikeve holê. Boçûna li ser girseyê jixwe, alîyê siyasî yê muhafezekar ê gelî ne. Li Tûnis û Misirê jî, ev gel li hember desthilatên otorîter û bertîlxur çalak bû -Alliot-Marie jî, bi comerdî piştgirîya xwe pêşkêşî van desthilatan kir.

* Psîkocivaknas, Navenda Lêkolînên li ser Şer û Pevçûnan

1 *Le Monde*, Parîs, 16 çîle 2011

2 Meclîsa neteweyî, "Rapora Agahdarîyê ya li ser Toreya Dîplomatîk û Peywira Balyozan", hjm. 3620, sibata 2002ê ji hêla Yves Tavernier ve pêşkêşkirî

3 Wezareta Karên Hundir ev reqem li Meclîsa Neteweyî pêşkêş kirin (*Rojnameya fermî* ya 19ê cotmeha 2004ê)

4 Jixwe, mînakên dijber jî hene, weke xwepêşandana 17ê cotmeha 1961ê li Parîsê. Wê rojê, hêzên polîs bûbûn sedema mirina bi dehan xwepêşandêrên cezayîrî yên aştîxwaz

5 Ji *Pirtûka Destana Demkî ya Bikaranîna Hêzên Bejî ji bo Kontrola Girseyan* (TTA 950) ya 8ê tebaxa 2001ê

6 Bnr: Philippe Leymarie, "Artêş Çawa Xwe ji bo Şerê li Bajaran Amade Dikin", *Le Monde diplomatique*, adar 2009

7 Bnr: *Le Canard enchaîné*, Parîs, 1ê adara 2000ê

Wergera ji fransî: Simko Destan



GÖKHAN ASLAN: **Çirîska Sor**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

## Pêleke din a şoreşger

**23yê hezîrana 1952yê:**
Li Misirê, Efserên Azad ên di bin rêveberîya Cemal Abdul Nasir de, li Qahireyê desthelatê bi dest dixin.

**1ê çirîya paşî ya 1954ê:**
Li Cezayîrê, destpêka şoreşa cezayîrî.

**Nîsana 1955ê:**
Konferansa Bandoengê dibe helkefta pêkhatina Bêalîyan.

**Adara 1956ê:**
Li Urdinê, fişara neteweperwer dike ku generalê îngilîz Glubb Paşa yê artêşê bi rê ve dibe, bê verê kirin. Fas û Tûnis ber bi serxwebûnê ve diçin.

**26ê tîrmehê:**
Li Misirê, Nasir şirketa kanala Suezê dike malê dewletê; *çirîya pêşî-çirîya paşî*: Êrişên tund ên bersivdayînê ji alîyê Îsraîl, Fransa û Brîtanyayê ve.

**1958:**
Reşeme. Avakirina Komara Erebî ya Yekbûyî yekîtîya Misir û Sûriyeyê.
14ê tîrmehê: Ketina monarşîya Îraqê; dûre mudaxeleyên "tedbîrî" ji Brîtanyayê li Ûrdinê, û ji DYAyê li Beyrûdê.

**Çirîya pêşî ya 1959ê:**
Yekemîn kongreya Fetahê ku li Kuwêtê hate ava kirin.

**Eylûla 1962yê:**
Xistina Emîrî li Yemena Bakûrî.

**Adara 1963yê:**
Partîya Be'es li Şamê bi kûdetayê desthelatê bi dest dixe.

**1964:**
13-17ê çileyê: Yekemîn civîna bilind a serokdewletên ereb li Qahireyê.

**29ê gulanê:**
Avakirina Rêxistina Azadîya Filistînê.

**1ê çileya 1965ê.**
Yekemîn çalakîya leşkerî ya Fetahê li dijî Îsraîlê.

**Hezîrana 1967ê:**
Têkçûna Ereban li hember Îsraîlê.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

www.arsivakurd.org

## Êrişa li dijî bernameya nukleerî ya Îranî

# Sîber-êriş li dijî Tehranê

PHILIPPE RIVIÉRE

Çend roj berê muzakereyên Stenbolê yên li ser bernameya nukleer a îranî, li çileya 2011ê, îdiayên dengvedêr di çapemenîyê de cih girtin: Vîrusa komputerî Stuxnet, ku tûşî Îranê bûbû, li Îsraîlê bi alîkarîya DYAyê hatibûye çêkirin. Gelo vê êrişa ku binesazîyên pîşesazîyê ji xwe re dikirin hedef, heyameke nû ya sîberşerî bi me nîşan dide?

### Vîruseke komputerê ya weke çekê şerî?

*Çernobîleke nû!"* Di destpêka 2011ê de, **M. Dmitry Rogozin**, balyozê rûs ê li Rêxistina Peymana Bakûrê Atlantikê (NATO), bi daxwaza destpêkirina lêpirsîneke der barê *Stuxnetê*, vîrusa komputerê ku van mehên dawîn miseletî ser tesîsên nukleer ên îranî bûye, bû sedema sansasyonê. Ew dibêje ku, ev vîrus, di santrala hilberînê ya vejenê ya li Buşehrê de, ku li başûrê Îranê hatiye ava kirin, dikare bibe sedemê teqîneke termonukleer. Bisporê ewlehîyê yê alman û xwedîyê lêkolîneke pêşîn a birêkûpêk a vê vîrusê **Ralph Langner**, di meha îlonê de dibêje ev faraziyeyeke"*vîrtuel [û] bitemamî bêbingeh*" e."*Berîya her tiştî, Stuxnet, Buşehr ji xwe re nekiriye armanc"*. Lê bi rastî zirar li Natanzayê bûye, ku lê heft hezar santrîfujên ûranyûmê dewlemend dikin hene."*Ya duyem, heta di rewşeke wiha de jî, vîrus nikare bi sîsteman re bikeve reaksîyonê, ew dewreyeke avê ye ku 'bi radyoaktîvîteyê re di têkilîyê de ye'. Tiştê ku kenê guran jî pê tê, ew e ku rûs bixwe vê yekê baş dizanin(1)"*. Lewra, di vî warî de Rûsya hevkareke serekî ya Tehranê ye. Bûyera Stuxnetê, çîroka sabotajeke teknolojîya bilind, romanek e ku kiryar zû ji çarçoveya kodên komputerê derdikeve û ber bi lîstikên mirêkî yên ragihandinê û dîplomasîyê ve dibeze.

Xwiya ye hin rastîyan cihê xwe girtiye. Diyar e êdî gumana kesî tuneye ku wextê çêkerên vê vîrûsê hebûye. (koda jêdera wê, li dora 15 000 rêzan e, ku li gor hin texmînan bi kêmanî deh"sal-endazyari"ya xebatê) û zanyarîyên tûj (ji bo ku kurmik karibe xwe bigihêniyê, dê ji çar valahîyên nebelavkirî yên sîstema bikaranînê ya Windowsê îstifade bike) jê re divên. **Langner** dibêje,*"analîza kodên wê bi awayekî vekirî diyar dike ku armanca Stuxnetê ya mesajekê bişîne yan têgehekê nîşan bide tuneye. Ya pêdivî, bibiryardarîyeke biawayê leşkerî hilweşandina armancan e"*. Gelo tesîsên nukleer ên Îranê dikevin ber armanca wê? Gotareke kite bi kite ya *New York Times,* a 15ê çileya paşîn a 2011ê vê yekê piştrast dike û derdixe holê ku vîrus hatiye ceribandin û li ser bingeha ji nû ve derhênaneke bi mezinahîya tora santrîfujên Natanzê hatiye pêşxistin. Li gor rojnameya amerîkî, ev yek di navenda kompleksên atomî ên Dimona, li çola Neguevê de, ku dilê bernameya nukler a leşkerî ya îsraîlî ye, weke operasyoneke mezin pêk hatiye. Lêkolîn xwe dispêre gelek şahidîyên fermî yên amerîkî û îsraîlî –ku hemî jî nayên zanîn û îsbata wan ne mimkun e. Encam:"*Pêşbirka neqanûnî ya çêkirina Stuxnetê, projeyeke hevbeş a amerîkî û îsraîlîyan e, ku bi alîkarîya haydar an nehaydar a alman û îngilîzan jî pêk hatiye(2)"*.

Almanên navbihurî yên fîrmaya *Siemens*ê, karkerên ku li kargeheke sîstemên kontrolê yên komputeran ji bo sanaîyê (bi navê SCADA) çêdikirin, bixwe bûn. Stuxnet"kurmikekî komputerê" ye, ku şopa wî ya cara pêşîn digihê heta 2009ê û ku li seranserê cîhanê bi dehan hezar makîne xirap kirine. Li gor lêkolîneke çêkerê dijvîrusan ***Kaspersky***, li Moskovayê, ev kurm li gelek welatan, bi taybetî jî li Hindistanê, bi 8565 makîneyên xirapbûyî (di îlona 2010ê de) welatê herî zirardîtî belav bûye, piştî wê Endonezya tê (5148), Îran jî bi 3062 weqayên dîtî di rêza sêyem de ye(3). Li gor hin senaryoyan, Stuxnet divê bi wasîteya mifteya USB a vegirtî ya yek ji maldayê xwe yê rûs di wextê xwe de ketibe malpera *Natanz*. Ji ber ku, wê nîşanên cihê yên armanca xwe (şopa kontrolkerê xwe yê her car) nas dikirin, vîruse diviya rêze êrişin weke filmê *Hollywoodê* pêk banîya. Bi diyarkirina herikîna daneyên rewşa wan normalxwiya, li ser ekranên ewlehîyê yên operatoran re, wê diviya gelek caran gurana rêguhastina santrifujan zêde bikira, rotor banîya sînorê qetîyana fizîkî û bi vî awayî bibûya sedema rêjeyeke nexwezayî ya arizayan.

### Kuştina fîzîknasan

Herçend dewleta îsraîlî li vê vîrusê xwedî dernakeve, Telavîv mandelê lê nade û hin zabit jî bi serê zimanan bahsa wê dikin. Tevî vê jî, bûyera Stuxnetê di nav kiryarên sabotajê yên berfireh ên li dijî bernameya nukleer ya îranî de cihê xwe digire, ku serekê kevin ê Mossadê, **M. Meir Dagan**, berî niha ne bi gelekî kêfxweşîya xwe diyar kir ku dibîne dê ev bername"*gellek salan bajo û heta berîya 2015ê dê kapasîteya nukleerî ya îranîyan tunebe"* (4). Li gor raporeke Enstîtuya Aşîtîyê ya Amerîkî (5), Tehran birastî divê pêrgî"*gelek astengên mezin bibe, ku bêtir wext bide dîplomasîyê û acîlîyeta lêdaneke leşkerî kêm bike"*. Û birêzkirina:"*Astengên her diçe zêde dibin li hember bidestxistina parçeyê bivê nevê hewce li bazara navneteweyî; alozîyên bikaranîna jimareyeke mezin a santrîfujan; û wiha xwiya ye ku, kiryarên nehînî yên buroyên îstixbaratên biyanî ne"*. Di nav rêbazên bikarhatî de:"*Êrişên sîberî, sabotajên materyalî, bi nihênî ketina nav tora tedarikkirinê û kuştina bisporên nukleerê"* jî hene. Tarîxên bûyerên dawîn: Bi teqandina tirimbêla wî re mirina fizîsyen **Mecîd Şehriyarî** di 29ê çirîya paşîn a 2010ê de, dema tirimbêl teqîya ew jî tê de bûye. Lê, ji bo raportorên wek **David Albright** û **Andrea Stricker**,"*alozîyên herî mezin xwiya ye ji ber Stuxnetê bûne, ku ji 2009ê ve dest pe kiriye û bandora xwe li ser santrifujên Natanzê dike"*. Piştî ku ev bûyer weke çîrokekê got, serok **Mahmûd Ahmedî Necad** di encamê de, di dawîya 2010ê de îtiraf kir, ku kurmik bûye sedemê "*hin probleman",* lê ew êdî"*çareser bûne"*.

### Korsanîya komputerî werzişeke lêxistinê ye

Di gotareke kovara taybet a *Nuclear Intelligence Weekly* de, **M. Scott Ritter**, serokê kevin ê çavdêrên Neteweyên Yekbûyî yên bêçekkirina Iraqê (1991-1998), di şiroveyên xwe de behsa hin cudayîyên balkêş dike:"*Karbidestên amerîkî û îsraîlî bi awayekî aşkere dibêjin ku Stuxnetê, niha, rê li ber bernameya dewlemendkirina ûranyûmê ya îranî girtiye. (…) Lê dîsa jî, nirxandineke ku vê dawîyê ji alîyê Federasyona Zanyarên Amerîkanî ve, li ser bingeha daneyên ekîbên çavdêrên Neteweyên Yekbûyî [li ser malpera Natanz] hatiye kirin, dest nîşan dike ku tevî êrişa Stuxnetê jî, Îranê çalakîyên xwe yên dewlemendkirina ûranyûmê, di 2010ê de, berfirehtir û bibandortir kirine (7)"*.

Li gor Ritter, ev nêrînên cuda, bi tansîyona li dora"*beza bilez"* hikum dike, dikare bê şirove kirin, ku Tehran û grupa"P5+1 (8)" bi vê yekê rabûne."*Nirxandinên li ser bingeha rastîyê, ji bo xatirê spekulasyonên senaryoyên muhtemel ên "rêvekirinê" di ser guh re hatin avêtin.* Bi saya dubarekirinê ya nêzîkî bîst salan e, ku Tehran dike bombeya nukleer bi dest bixe, dîplomat"*qîma xwe bi tercîhên siyasî yên ku qîmet didin van hîpotezan tînin",* ku Ritter wê bi"*mezinkirinê"* gunehbar dike. Bi vî awayî jî, ew sînorên xwe yên minaqeşekirinê teng dikin. Derengmayina ku xwedêgiravî ji ber tevgera sabotajê ye riyeke bifêde vedike ji bo berdewamîya minaqeşeyan bêyî ku derfet ji dest biçe.

Ji xeynî lihevnekirina diyar a di navbera van her du cîranan de –li alîyekî bombeya îsraîlî ya ku"sira herî xirab veşartî" ya dinyayê ye (9), li alîyê din jî bernameya nukleer a îranî ya ku hîn dûr e bi encam bibe–, operasyonên sabotajê yên di dema aştîyê de ne bêyî riskên bersivdanê yan jî pijkirina şerî ne. Paradoksal e, gava ku mirov dibîne welatên di warê komputerê de herî pêşketî û ji serî ve dibe ku herî zêde zirar li wan bibe, kiryarên wiha, meşrû dikin. Lê belê, korsanîya komputerê xwe amadekirina ji bo şerî ye û em dizanin ku di vî warî de bergirîya herî mezin êrişkarî ye. Li Washingtonê, ku hîn bîranîna hakkirina malika mesajan a *Google* (îhtimaleke mezin) ji alî çînîyan ve teze ye, ji bo wê jî Serok, li hemberî "*êrişên hakkirinê yên ji derve bên"* weke riya dawîn a bergirîyê, doza bişkokekê dike ku pê karibe hemî înternetê qut bike. Estonyaya ku bedelê "êrişeke hakkirinê" ya kirdarê wê nediyar (lê herkes difikire ku ji alî Rûsyayê ve hatiye kirin) di 2007ê de da, ji bo wê jî ew ji wê demê bi vir de, ji bo bergirîya xwe ya înternetê, mazûvanîya navenda birêkûpêk a NATOyê dike.



GÖKHAN ASLAN: **Berepê**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

1 "The Virtual Chernobyl (Çernobîla Ferazî)", 1ê sibata 2011ê, www.langner.com

2 William J. Broad, John Markoff û David E. Sanger,"Israeli Test on Worm Called Crucial in Iran Nuclear Delay (*Ceribandina Îsraîlî ya Kurmikê Ferazî, di Derengketina Bernameya Nukleer a Îranî de bi Roleke Diyar Rabû*)", *The New York Times,* 16ê çileya paşîn a 2011ê

3 Jeffrey Carr,"Reality Check: Is Stuxnet's Iran Connection The New Iraqi WMD? (*Kontrola Rastîyê: Gelo Girêdana Stuxnetê ya bi Îranê ve WMDya [çeka qirkirina girseyan] Nû ya Iraqî ye?)"*, Firewall, *Forbes,* 28ê îlona 2010ê

4 Yossi Melman,"Outgoing Mossad chief: Iran won't have nuclear capability before 2015 (*Kevneşefê Mossadê: Jêhatîbûna Nukleer a Îranê wê Berîya 2015ê çênebe*)", *Haaretz,* 7ê çileya paşîn a 2011ê

5 "Iran's Nuclear Setbacks: A key for U.S. Diplomacy (*Şkestinên Nukleer ên Îranê: Ji bo Dîplomasîya DYAyê Mifteyek e)",* 18ê çileya paşîn a 2011ê, United States Institute of Peace, www.usip.org

6 Di 1945ê de ji alî gelek zanyarên beşdarî berhênana bombeya atomê bûne ve hatiye damezirandin, ku FAS pê bûye xwedî îtibareke pir mezin

7 Scott Ritter,"In Perspective: The Stuxnet Effect (*Di Perspektîfê de: Bandora Stuxnetê*)", *Nuclear Intelligence Weekly*, New York, 31ê çileya paşîn 20011ê

8 Her pênc endamên daîmî yên Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî – Amerîka, Brîtanya, Fransa, Rûsya û Çîn–, + Almanya

9 Li gor sernivîsa berhema Avner Cohen, *The Worst-Kept Secret: Israel's Bargain with the Bomb* (*Sirra Herî Hirab Hatî Veşartin: Bazara Îsralî ya bi Bombe*), Columbia University Press, New York, 2010

Wergera ji fransî:
Yaqûb Karademîr

## Astengên nû di lêkolîna warê zanistên civakî de

# Êdî lêkolîner newêrin li tiştekî bikolin

Howard S. Becker *



**Ji bo lêkolîna zanyarîyên civakî çiqas azadî heye? Ji xwe, zextên siyasî, hiqûqî an aborî li ser lêkolîneran tên kirin. Lê belê yekrengîya akademî û tirsa berpirsên zanîngehî ku ew ê pergala heyî, hindik be jî, nerihet bikin, dirûvên sansûrê yên hîn xeter in.**

Civaknasa tirk **Pinar Selek** cirma xebatên xwe yên rexneyî yên li ser zarokên kolanan, transseksuelan, xizmeta leşkerî an jî pirsgirêka kurdan wê pir biha bidaya. Bi sûcdarîya ku wê di 1998ê de li Çarşîya Misirî ya Stenbolê "êrişeke bibombe" pêk anîye, êşkence lê hatibû kirin û du sal û nîvan di hepsê de hatibû girtin; di 9ê sibata 2011ê de ew ji alîyê mehkemeyê ve cara sêyemîn bêsûc hat dîtin. Wekî di celseyên 2006 û 2008ê de, hakiman qebûl kir ku teqîna tesadûfî ya kûpikeke gazê bûye sedema felaketê û îtirafên ku Selek wek berpirs nîşan didin, di bin êşkenceyan de hatine bi dest xistin. Şikir ji Xwedê re ku tu talûkeyên bi vî rengî ji bo hempîşeyên wê yên rojavayî nînin; yên ku ji bo azadîya wê bi berfirehî seferber bûbûn. Lê belê ev nayê wê maneyê ku ew dikarin her tiştê dixwazin bêyî ku bihayê wî bidin, pêk bînin. Bêguman sansurên hê xiniztir tên azadîya wan bi sînor dikin.

Bifikirin ku –bi çavkanîya bûyerên rastîn– lêkolînên we dest nîşan dikin ku şagirdên dibistanekê hînî tiştekî nabin. Hê girantir: Ew dest nîşan dikin ku şixulîna vê sazîyê bi rastî jî rê li ber şagirdan digire ku ew hînî qet tiştekî nebin û rêxistina wê ji ya dibistanê wêdetir gelek dişibe rêxistina girtîgehekê. Dema hûn ê hewl bidin gotara xwe bidin weşandin, îhtimaleke pir mezin kovara zanîngehî ya herî rêzdar a warê we wê bibêje ku gotar bersivê nade pêwistîyên wan ên metodolojîk: Lazim bû we peywendîyeke îstatîstîkî ya hê saxlemtir danîbûya, an jî mînakeke hê temsîlî bi kar anîbûya. Li gel vê yekê, baş bala xwe bidinê, dema ku gotarên xwedî encamên kêm gengeşe mijara gotinê ne, heman kovar rexneyeke bi vî rengî qet nayne ziman. Nîyazkirina kêmasîya saxlembûnê ya bi bahaneya pêkanîna krîterên zanistî, li vê derê tê wateya maskekirina sansurê. Esas, hûn tên ceza kirin ji ber ku we tiştek aşkere kiriye, tiştekî ku mirov û sazîyên ku di warê perwerdeyê de hêzê di destê xwe de digirin, naxwazin wî tiştî bibihîzin, an jî naxwazin haya gel jê çêbibe.

### Eger lêkolîna te ne bi dilê rêvebirîyê be

Helbet di her warê lêkolînê de bi dehan kovar hene û gotareke ku ji alîyê yekê ji wan ve hatî red kirin hê şensê wê heye ku li cihekî din bê weşandin. Lê belê awayên din ên cezakirinê xwedî encamên hê girantir in. Li ser vê yekê, mimkun e piştre hûn ji bo projeyên xwe di peydekirina alîkarîyên diravî de rastî zehmetîyên hê mezintir bên. Ev ê ji bo we bibe dersek ka serînetewandina li ber rêveberîyên ku warê we bi rê ve dibin, çi ye. Hûn ê di peydakirina cih an jî mirovan de rastî gelek pirsgirêkan werin, cih û mirovên ku amade ne bersiva pirsên we bidin, amade ne bihêlin hûn çavderîya wan bikin, an jî belgeyên ku we pêdivî pê heye bidin we. Berevajî vê yekê, lêkolînerên hê biendaze, ku xebatên wan bi qasî ku rastî cezakirinan werin rêveberîyan aciz nakin, wê karibin bi rehetî lêkolînên xwe bimeşînin.

Ev rêbazên kontrolê, ji ber ku têra xwe berbiçav in, ji alîyê civata zanistî ve gelek tên tawanbar kirin û pir zêde jî nikarin bên bi kar anîn. Lê awayên din ên sansurê, ku pir xiniztir (sinsî) û herwiha pir bitalûketir in, xwe li pişt navnasên saf an jî rûmetgiran vedişêrin.

Ji nav wan ya herî xirab bêguman "parastina kobayên mirov" e. Ev têgeh ji warê lêkolîna bijîşkî tê. Di vî warî de derketîye holê ku divê mirov ji xirabbikaranîna bijîşkên ne pir jêhatî an jî yên ku ji encamên mirovî û civakî yên ceribandinên xwe re xemsarîyê nîşan didin, bên parastin. Dema ku komek lêkolînvan bixwaze tesdîq bike ka gelo nexweşîya pençeşêrê dikare wekî nexweşîyeke têger (dirmî/perokî) tevbigere, çima hucreyên pençeşêrê li mirovên saxlem neyên enjekte kirin û neyê nihêrtin ka wê çi biqewime? Helbet, kobayên têkildar dema ku bizanibin ka rastîya meseleyê çi ye, ew ê qebûl nekin ku ceribandinên wiha li ser wan pêk werin. Lê belê, tevî her tiştî, ew dilxwaz bin an jî na, pêdivîya zanistê bi fedakirina wan heye û lêkolînvan dikarin biryarê bidin ku rastîyê ji wan veşêrin.

### Hikûmetê şert avêtine ber zanîngehan

Mînakeke wisa sosret mirovan dihejîne; lê gelek mînakên heyî ne ewqasî dûrî me ne. Li Bakûrê Amerîkayê, ji bo rê li ber xirabbikaranîna wiha û skandalan bigirin, sazîyên hikûmetî yên têkildar şert li ber zanîngeh û navendên lêkolînê (ku ew li wir tev girêdayî hev in) danîn, lê ev şert ne ewqasî jî mecbûrî ne: Êdî divê hemû lêkolînên zanistî yên li ser kobayên mirov ji alîyê komîteya ji profesor û endamên rêveberîyê ve bên teswîb kirin. Detayên vê pêvajoyê û rêbaza qethî ya krîterên nirxandinê ji teqdîra her sazîyê re hatibûn hiştin.

Ji van qedirgiranên pêşîn cinawirek derket holê: *Human Subjects Review Board* (Komîteya Nirxandina Lêkolînên li ser Kobayên Mirov). Di nav hemû sazîyên akademîk de komîteyeke wiha nîne û hemû komîte jî ne xwedî heman hêzê ne. Gelek caran, koma profesoran bi terza ku ew li ber xebatên lêkolînê nabe asteng, dezgîn û serkarî girtin dest xwe. Lê di gelek bûyeran de, ev komîte bûn belayekî wisa mezin ku zanyar û hikûmetên amerîkî û kanadayî nikaribû ewqas texmîn bikira.

Di nav van komîteyan de, pêvajoya nirxandinê teşe û giranîyeke wisa girt ku, eger ew li her derê bihata bi kar anîn, wê dê bi awayekî pratîk hemû lêkolînên warê zanistên mirovî nemimkun bikira û bi taybetî jî zanistên ku çavdêrîya binyadên civakî dikin, wek mirovnasî (antropolojî), civaknasî (sosyolojî) an jî zanista polîtîk. Her lêkolînerê ku çavdêrîya mirovan dike, çavdêrîya mirovên ku di awayên xwe yên jîyanê an jî yên xebatê de vediguherin, mecbûr e bi awayekî teorîk, piştî ku ji her şexsê têkildar re rîskên mimkun ên vê çavdêrîyê îzah bike, jê destûreke nivîskî bigire. Di salên 1950yê de, min sê salan li ser jîyana xwendekarên bijîşkîyê lêkolîn kirin. Eger berê mecbûrîyetên wiha hebûna, piştî îzahkirina min a ka *ez kî me û ez çi dikim*, lazim bû min "rizaya wan a aşkere" bigirta, eynî mîna rizaya her nexweş an jî xebatkarê nexweşxaneyê – ya bi sedan kesan–. Aşkere ye ku lêkolîn û berhema ku jê derketîye, wê tu caran pêk nehatibûya (1).

Eger ev qaîde bi hişkahî û bêalîgirî bihatana tetbîq kirin, piranîya xebatên warê zanistên civakî yên îro pêkhatî nikaribû pêk werin. Wê çaxê bi awayekî zelal derdikeve holê ku ev qaîde wiha nayên tetbîq kirin. Hin lêkolîner ji nêz ve tên venihêrtin. Ew mecbûr in gelek belgeyan dagirin, her çalakîya xwe kite bi kite bidin zanîn û sond bixwin ku ew ê îtaetî qaîdeyan bikin, îtaetên ku bi rastî jî nemimkun e bên rîayet kirin. Lê yên din ne mecbûr in xwe bi qaîdeyên wiha aciz bikin. Bi tenê li ser rêzgirtina kobayên lêkolînê çend sozên giştî ji wan tên xwestin û piştre ew çi bixwazin dikarin pêk bînin. Wekî dihate payîn, dereceya azadîyê bihişkî girêdayî sewîyeya hîyerarşîk e, ya ku di sazîyê de her yek lê bi cih bûye. Xwendekar û xwendekarên doktorayê tengezar dibin û gelek roj, heta hefteyên xwe didin amadekirina dosyeyên xwe, lê profesorên ku dikarin gelek lêkolînên xwe biweşînin û alîkarîyên aborî yên lêkolînê werbigirin, ne mecbûr in xwe bi prosedureke wiha tengezar bikin. Ew ne mecbûr in komîteyekê qanî bikin, komîteyeke ku, di halê herî baş de, ji hemtayên wan û gelek caran ji lêkolînerên kêm ronak pêkhatî. Ji ber ku wan îsbat kiriye ku ew dikarin awayê xebatên ku sazî ji wan dipê, pêk bînin.

### Pêdivîyên rastîn ên sazîyên akademîk

Îca ferqên wiha yên muameleyan nîşan didin ka pêdivîyên rastîn ên sazîyên akademîk çi ne: Ji bo baş xebitîna xwe piştgirîya diravî ya lêkolînê ku jîyanî ye bi dest bixin; xwe ji skandalan dûr bixin; skandalên ku dikarin biteqin dema ku zirarê bidin saxîtîya bedenî an jî moralî ya kesê ku wek kobayê lêkolînê hatîye bikaranîn; nebin dijberên kesekî an jî sazîyekê da ku dijminatîya wan çênebe; di der barê xwe û rêveberên xwe de îmajeke baş bidin.

Divê hatibe ferq kirin ku ev pêwistî tenê dikarin bi awayekî pir nerasterast kobayên lêkolînê biparêzin. Zanîngeh gelek ditirsin ku navên wan di nûçeyên televizyonê de derbas bibe; ji ber sedema ku psîkologekî/e wan lêkolînên xwe ji bo neqandina xwendekarên ku tên bandor kirin bi kar anîbe, da ku wan qanî bike ku pê re bikevin têkilîyên cinsî an jî şûna wan gotarên wan binivîsin. Ziravê zanîngehan diqete ku kesek wan bide mehkemeyan û bibêje ku aşkerekirina hin xebatan bal kişandîye ser wî, bi radeya ku jîyana wî xera dike, wî dixe rewşeke pêkenokî an jî mafê giramgirtina jîyana wî ya taybet bin pê dike. Ev talûke li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê her tim heye, civaka ku pir zêde serî li mehkemeyan dide. Lê belê li cihên din jî wisa ye. Tehdîda dozvekirinekê wexta ku weşanek agahîyekê belav dike û bi wê zirarê dide rêzdarîya kesekî an jî sazîyekê, gelek tê bi kar anîn. Wek mînak, analîza baş a dizîyan a bi awayekî zanistî, dizîyên ku ji alîyê xebatkar û rêveberên civakekê ve hatine kirin, dikare were tawanbar kirin ku tecawizî jîyana taybet a mirovên sûcdarkirî û bi taybetî jî ya berpirsên wê yên bilind hatiye kirin.

Ev pêwistîyên mecbûrî her ku diçe xebata lêkolîneran zehmettir dikin, lê herwiha tesîrên wan ên pir kûrtir hene. Esas ev pêwistî alîkarîya pêkanîna kultureke akademîk ku li wir mecbûrîyet û sînorên pêwist ên lêkolînê wek tiştekî normal tên dîtin, dikin. Bi taybetî jî ji alîyê lêkolînerên ciwan ve, yên ku nikarin li hember mecbûrîyeta adaptekirina xebatên xwe yên li gor pêdivîyên sazîyan serî hildin û di dawîyê de van pêwistîyan wekî girêdayî hemû xebatên lêkolînê dibînin. Bi vî rengî, ji bo xwendekarên doktorayê yên amerîkî yên warê civaknasîyê, derketina ber komîsyoneke nirxandina lêkolînan tiştekî adetî yê zanîngehê ye û ev tenê astengeke pêvek e li ser riya wan, lê belê komîsyonên wiha rê li ber wan digirin û nahêlin ew pêsehîyên xwe bişopînin.

Eger nifşê nû yê lêkolîneran astengên heyî bipejirîne, wê çaxê siberoja zanistên civakî gelek tarî ye. Ku derfeta lêgerîna ramanan ji destê wan bê girtin, ramanên ku sazîya akademîk dikare ecêb û biguman binirxîne, ku neyê hiştin ku ew di nûkirinê de xeletîyan bikin, wê çaxê ew ê di warê têkilîyên gel de bibin bisporên ji rêzê. Bisazîkirina qaîdeyên etîk dikare ji bo rêveberên zanîngehan û yên navendên lêkolînê wek fikreke bêqusûr xuya bike, lê ev ji bo zanîna ku ev sazî ji parastin û bipêşxistina wê berpirs in, talûkeyeke rasteqîn e.

*Civaknas. Berhema dawî ya weşandî: "*Comment parler de la société" (Çawa Behsa Civakê Were Kirin)*, La Découverte, Parîs, 2009

1 Howard S. Becker, Blanche Geer, Everett C. Hughes û Anselm Strauss, *Boys in White: Student Culture in Medical School (Xortên Spîpoş: Çanda Xwendekarîyê ya di Fakulteya Bijîşkîyê de)*, University of Chicago Press, 1961

Wergera ji fransî: Aynur Bozkurt



Gökhan Aslan: **Kompozîsyona Razber IV**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 150 cm

www.arsivakurdi.org


# KULTUR-POLÎTÎK

KEJO BAJÂR

# PAHNOZ: Ferhad Pîrbal

Berî hertiştî heger hûn rahêjin pirtûka Çolistanê ya bi zaravayê soranî û dest bi xwendina wê bikin, hûn ê behêtî bimînin. Carekê Çolistan ezber û biçûkxistinên çi yên ji alî kurdan bixwe û çi jî yên alîyê serdestên wan ve hatine ava kirin, tarûmar dike. Wexta em çîrokên di pirtûka Çolistanê de dixwînin, weke genesîsa wêjeyê em dikarin pişteke baş ji xwe re çêkin û xwe pê serbilind bikin. Wê hingê em dikarin bibêjin ku bavê xelkê ne jî bavê me çêtir e û çîroka xelkê jî ne ji ya me çêtir e.

Nexşeya çîrokên di wê pirtûkê de weke nexşeya kurdan bixwe ye. Hema çi bigire hemû çîrokên wî nexşeya welatekî derdixîne. Penaberî, çewisandin, bêwelatîbûyîn, êşa bindestîyê, rev, dinyanedîtina kurdên surgunê, şîzofrenî û îronî lejantên xwe datînin ser nexşeya wê pirtûkê. Lê Ferhad Pîrbal tiştên ku der heqên van têgehan de me ji xwe re ava kirine, yek bi yek xera dike û ji me re rengîntirîn lensên xwendinê çêdike. Hingê ev termên ku li jor tên behs kirin, heya bi çîrokên Ferhad Pîrbal neyên mîna kirin, wê baş neyên fahmkirin jî.



Di çîroka Perawêzên (ku tê mahneya kaxizên avêtî) Ewropayê de lehengê çîrokê Kurdo kurdekî li Ewropayê ye û ji ber tenêtîye bêzar e. Rojekê lehengê me Kurdo di rojnameyekê di rûpelê Hevnasînê de rastî îlanekê tê û di îlanê de çav bi van tiştan dikeve: **"Qîzeke xweşik û ciwan, porzer û çavşîn, di bin resmê xwe de nivîsandibû ku xelka bajarê Sikaginê ye, li taxa Tostgopê, li cadeya Byrondbyê, li xanîyê jimarê 7 de dijî û dixwaze zilamekî rojhilatî yê xwîngerm û ciwan binase**… '' Kurdo serî li vê îlanê dide, bersiv tê û ji Kopenhagê ber bi bajarê Sikaginê ve bi rê dikeve. Kurdo bi rêwîtîya xwe bi trênê dike û di trênê de rastî jineke ewropî ya 65 salî tê. Ew deftera xwe ya bîranînan derdixe da ku tiştekî binivîse; ev tişt bala pîrejinê dikşîne û pê re dikeve dîyalogê. Ji ber ku pîrejin wênesaz e pirsa kaligrafên Kurdo dinivîse, dike. Bi her pirsekê re hûrgilîyên jiyana lehengan derdikevin meydanê. Ev pirs tên heya ser navan ku pîrejin dibêje navê min Bergyty ye.(3). Di vir de Ferhad Pîrbal numreyekê datîne ber vî navî û vê hejmarê weke têbinîyekê li jêra rûpelî dixîne. Çîrok bi têbinîyên numarasyona bi awayekî îtalîk di nav rûpelan de dimeşe. Ev têbînî heya dawîya çîrokê digihêjin hejmara 9 ê. Yek ji wan ev e:

*(3) Kurdo bi bihîstina navê Bergytyê hinekî bêdeng ma, piştre beyî ku bala xwe bide ser pîrejinê got:*

*-Navekî xweş e.*

*Xuya ye pîrejin jî bi van hestên Kurdo kêfxweş bû, got:*

*-Rûmeta te heye.*

*Pîrejin hinekî bêdeng ma, di nav hest û şerma xwe de mat bû, li pencerereyê temaşe kir:*

**LENS 1:** Ev numarasyonên ku wexta çîrok didome weke têbineyekê li jêra rûpelê tên dayîn, hestên ku mirov nikarin carekê ji hev re bibêjin, deşîfre dikin. Mirov bi van têbinîyên hatine dayin bêtir nêzî lehengan dibe. Ev têbînîyên îtalîk di nav çîrokê de wezîfeya psîkanalîzê dikin. Bi gotineke din bi van têbinîyan, rûyê lehengan, xwendevanan bêtir nêzîkî dengê xwe yê hundirîn dikin. Ferhad Pîrbal di vir de pozisyona vebêjerîya xwe diguherîne û xwe dike dilqê psîkanalîstekî xwedî dîwan. Ew tiştên ku di civatê de nayê gotin, yan bi tenê di civaka hevaltîya gelekî nêz de tê gotin, nivîskar stêrkan li wan derhişan û binhişan zêde dike. Çawa wexta em pirtûkekê dixwînin û peyvên em bi mahneya wan nizanibin derdikevin pêşberî me û wergêr stêrkekê li ser wê peyvê dixîne û mahneya wê ji me re li jêra rûpelê aşkere dike, çîroknûs Ferhad Pîrbal jî stêrkan li çîrokên xwe zêde dike û bi vî awayî tebeqeyên xwendinê li ber me firehtir dike.

Çîroka me ya normal didome. Kî çiyê wan hebe ji hev re dibêjin. Bergyt behsa tenêtîya ewropîyan dike. **'' Ez rismên tenêtîyê çêdikim. Danîmarka ev e: Tenêtî. Tenêtî. Tenêtî."** Wexta mijar dibe tenêtî, Kurdo behsa Kierkegraad dike. (Ku nizanim hemû lehengên diasporaya çima wisa zane ne) lê Bergyt xwezîya xwe bi civaka rojhilatî tîne û dibêje li wir tenêtî tuneye.

**LENS 2:** Di vir de cudahîya çîrokan, şaristanîyan jî derdikeve holê. Ewropayîyan ferdîtîya xwe pêk anîne. Xwe ji kevneşopîtîyê, ji dêrê, ji cimaetan, ji mîtolojîyê xelas kirine û şaristanîyek rasyonalîst ava kirine. Lê encama vê serpêhatîya şaristanîyê tenêbûn e û xwekuştin e. Jixwe di çîrokê de rêjeya xwekuştinên welatê Danimarka û Swêde jî tê dayîn. Ji alîyê din ve civakên rojhilatî nebûne ferdî. Takekesîya wan hê pêk nehatiye. Hê ji xwe re weke eşîran dijîn û tu derdên wan ên bi vî rengî tunene. Subjebûn û objebûn ne di rojeva wan de ye û ew bextewartir in. Erê di xwendina çîrokê re, di heman demê de em, di dîyalogên lehenga pîrejin û Kurdoyê kurd de du şaristanîyan jî didin ber hev.

Trên dimeşe û çîrok didome. Trên li Skaginê disekine û çîrok didome. Pîrejin û Kurdo bi hev re ji trênê peya dibin. Pîrejin dixwaze rêberîya Kurdoyê penaber ê 27 salî bike û navnîşana ku wê heriyê hêdî hêdî pêş wî bike. Lê dawîya dawî ew navnîşana ku wê Kurdo heriyê, mala pîrejinê bixwe dertê. Ew keçika çavşîn û porzer ku îlana xwe dabû enîşka hevnaskirinê, Bergytîya 65 salî bixwe ye. Tu nabêjî wêneyê ciwanîya xwe di rojnameyê de weşandiye. Kurdo bilêta xwe ya vegerê diçirîne û ji xwe re sedemên psîkolojîk ava dike: **''Ma çi xem e? Gelek hevalên min, Meqlît, Jîlwan, Evdile û Saman …hemû bi pîrejinên pêncî û şêst salî re dijîn, bila ez jî wisa bikim. Nêzîkî du salan e li Kopenhagê, di nav tenêtî û bêkesîyê de pijiyam. Bergyt, jineke mîhreban û rewşenbîr e," Qet nebe ji bo ziman"…**

**LENS 3:** Ev çîrok bi mirov dide xuya kirin ku hemû kurdên ku diçin surgunîyê bi keçikên çavşîn û porzer re ranazên. Ev çîrok bi mirov dide xuya kirin ku Ewropa ne kerxaneya kurdan e. Kurd li Ewropayê di warên têkilîyan de perawez (kaxizên avêtî) in û li gel xwendina Kierkegraad jî, kurd dostikîya pîrejinên Ewropayê dikin. Ev çîrok, termên ku dîasporayê di bîra me de çêkirine, xera dike.

**ÇÎROKA Duyem: ŞÎZOFRENÎ (1)**

***Bextiyar, li ber efserê ku yekemîn berpirsîyarê lêkolînên Dosyaya Bextiyar bû, xav û sist mîna dîlekî rawestiyabû.***

***Efser berê xwe da tercumanê Bextiyar û got:***

***-Il faudrais que il aile al Hospital psycytrique.***

***Tercuman xortekî kurd ê Lubnanî bû, ev axaftin bi xem ji bextiyar re tercume kir, got:***

***-Keko, tiştê ez dizanim wê te heya demekê bişînin Şêtxaneyê.***

*Heger tu bixwazî Bextiyar binasî, li enîşka jimare (11) binêre.*

*Heger tu bixwazî bizanibî bê çi bi serê Bextiyar hat, li enîşka jimare (5) binêre.*

Çîroka bi navê şîzofrenî bi vî awayî dest pê dike. Le ev bixwe ne destpêk e. Çîroknûs te bi ber bi enîşkên din ve dibe û tu piço piço agahdarîyên der heqê Bextiyar de ji wan enîşkan hîn dibî. Her ku xwendevan ji malikekê derbasî malikeke din dibe, xwe di ser çend rûpelan re gav dike û dest bi xwendina çîrokê dike. Agahdarîyên ku ji malikan tên berhev kirin ev in. Bextiyar kurdekî Iraqê ye, di 21 salîya xwe de koçî Fransayê kiriye û ev sê sal in li ordîgeheke penaberan dimîne û hevalekî wî yê kurd her van ristên Nalî jê re dixwîne: **"Dirûnî li dar el Şarezûr û birde/ Kê firmêsk girim îla ew ser de."** Bextiyar li welatê xwe jî çûye dibistanê û dixwaze li penaberîyê jî endazyarîyê bixwîne, lê bi dest wî nakeve. Bextiyar birçî dimîne, diçe çopan dide hev, lê wek hevalên xwe yên filistînî, srîlankî naçe ji mexezeyan cilan nadize û nafiroşe. Bextiyar ji tenêtîyê, ji bendemayîna destûra rûniştinê, ji nêza bi şev derdikeve, çi camên avahîyan bi ber wî bikevin dişkîne û ji hikumeta Fransa û ji partîyên Kurdistanê re dijûnan dide. Lewma em hîn di malika ewil ya çîrokê de Bextiyar li ber derîyê nexweşxaneya psîkîyatrîyê dibînin.

**LENS 4:** Ev tiştên ku li jor tên qal kirin weke çîrok hemû evê dide xuya kirin. Lê ne wisa ye. Her ku diçî malikekê tu rastî tiştine din têyî. Ev çîrok ku ji 8 rûpelan pêk tê bêdawî ye. Her carê nivîskar du malikan dide ber te û tu diçî wir, her tu diçî wir te dişîne du malikên din jî. Xwendina vê çîrokê bixwe te dike şizofren. Ji ber ku tu dikevî nav labîrentekê û êdî nema dikarî ji nav derkevî. Ev eyn weke tevgera kulîlka lûleperê (nîlufer) ye. Weke tê zanîn tevgerên kulîlka nîluferê di dirûvên ferîbotan de diçe serîyê din, rêwîyên xwe datîne û vedigere serîyê din. Karê wê ji sibehê heya êvarê ev e. Ma jixwe şizofrenî jî ne tiştekî bi vî rengî ye? Tu riyên derketinê ji mirov re tune ye. Ferhad Pîrbal bi vê çîrokê şizofrenîya nîluferên avê ji me re nivîsandiye.

**LENS 5:** Ev çîrok bi mirov dide hîs kirin ku haya çîroknûs baş ji wêjeya dinyayê heye. Romana **''Seksek''** a Julio Cortazar bi heman şeweyê hatiye nivîsandin. Cortazar feyza xwe ji lîstika zarokan girtiye. Ewa ku bi kurmancî jê re dibêjin **''xêzk''** û bi tirkî jê re dibêjin **''seksek.''** Ew lîstik tê zanîn. Zarok pêşîyê kevirên xwe diavêjin malika ewilî û bi pozê sola xwe bêyî kevir li ser çixêzkan bisekine, kevir bi nigekî xwe dahf dide. Lê divê lingê din jî li hewayê be. Wexta malik giş diqedin zarok çavên xwe digirin û dest bi ''gupî û pahnozê'' dikin. Ev lîstik bi çi awayî be jî bi dawî dibe. Lê Ferhad Pîrbal û Julıo Cortazar bi tevina wê lîstikê dilîzin û çixêzkên di bîra xwendevanan de diyarkirî şolî dikin ku xwendevan di nav tekstên wan de rêya xwe nebînin.

Ferhad Pîrbal bi jêbirkê xêzekê ku em pê dizanin paqij dike**.**

**Navê pirtûkê**: Çolistan

**Nivîskar**: Ferhad Pîrbal

**Weşanxane**: Avesta

**Ji soranî bo kurmancî**: Şikriya Salih, Firat Kelehkî

**Çeşin**: Çîrok

**Buha**: 8 TL

**ISBN** 975-8637-14-2

ÎLAN

## Wergêrên ji zimanên biyanî ji bo wergerandina zimanê kurdî

IKMG (Independent Kurdish Media Group), ji bo weşanxaneyeke nû ku ji gelek beşan ava dibe, ji hemû zimanên cîhanê li wergêran ji bo beşên wêje (roman, helbest, çîrok, lîstikên şano ûwd.), lêkolînên zanistî (civak, felsefe, polîtîka, psîkolojî ûwd.), yên perwerde (dibistan, zarok, dê û bav, lîstik) ûwd digere.

Di destpêkê de hewcedarî bi wergerên îngilîzî, fransî, almanî, spanî (zaravên Latîn Amerîkî), rûsî, îtalî, çînî, japonî, portekîzî, erebî, tirkî, farisî, norwecî, swêdî, danîmarkî, fînî, polonî, îbranî ûwd heye. Herweha ji bo zaraveyên kurdî di nav xwe de.


Kesên ku elaqe nîşan didin, dikarin bi nivîskî tevî CV(Kurtejiyan), dîplome, sertîfîka û bi minakên hin xebatên xwe serî li me bidin.

IKMG INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP

**Navnîşan**
IKMG GmbH
Carnotstr. 4
10587 Berlin - Germany
**Fax:** 0049-30-330 990 429
**Email:** info@ikmg.org

# *Newroz pîroz be!*

# *Helepçe nayê jibîrkirin*





Arîf Sevînç: **Helepçe**, boyaxa rûnî li ser tûwalê

Arîf Sevînç: **Newroz**, boyaxa rûnî li ser tûwalê

# Naverok

## ADAR 2011


Sibê jî dora Îranê ye?
**Serge Halimi**
▶ R. 1

Wikileaks, DYA û Kurd
**Prof. Dr. Ferhad Îbrahîm**
▶ R. 1

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Li Kurdistanê Setrenca Nabuccoyê
**Perwer Yaş**
▶ R. 4

Meksîkayê weha dev ji serxwebûna xwe berda
**Jean-François Boyer**
▶ R. 5

Peymana demokratîk li nav hêzên başûr
**François Danglin**
▶ R. 6

Hevkarîya ji hemû rexan ve
**François Danglin**
▶ R. 7

Tenduristî, çandinî û projeyên hevbeş
**Folashadé A. Soulé-Kohndou**
▶ R. 7

Baregehên amerîkî yên bê sînor
**William Pfaff**
▶ R. 8

Perwerde, ji bo berfirehkirina bîmeya civakî hêmaneke serekî
**Thierry Weishaupt**
▶ R. 9

"Şerê qirêj" ê UCKyê li Kosovayê
**Jean-Arnault Dérens**
▶ R. 10

Lawazîya berxwedaneke parçebûyî
**Chris Kutschera**
▶ R. 12

Artêş, gel û otokrasî
**Salam Kawakibi & Bassma Kodmani**
▶ R. 14

Li Misirê şoreşa piştî şoreşê
**Raphaël Kempf**
▶ R. 15

Birayên Misilman û "hatina nav nîzamê"
**Gilbert Achcar**
▶ R. 16

Li Lîbyayê rola eşîran
**Ali Chibani**
▶ R. 17

Hişyarbûna erebî dê çi biguherîne?
**Alain Gresh**
▶ R. 18

Payînên civakî û tirsa kaosê li Tûnisê
**Akram Belkaïd**
▶ R. 19

Dema ku Fransayê piştgirî dida zordarîya li Tûnisê girseyê Michèle Alliot-Marie bi xwe re bir
**Laurent Bonelli & Elwis Potier**
▶ R. 20

Sîber-êriş li dijî Tehranê
**Philippe Riviére**
▶ R. 21

Êdî lêkolîner newêrin li tiştekî bikolin
**Howard S. Becker**
▶ R. 22

Kultur - Polîtîk
**Kejo Bajar**
▶ R. 23



## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB